



Kurdiyat



e-ISSN 2717-8315

Yıl/Sal/Year: 2024 Sayı/Hejmar/Issue: 10

e-Ağ/Web: <https://dergipark.org.tr/tr/pub/kurdiyat>



KURDIYAT

Periodical Journal for Kurdish Studies

Year/Sal/Yıl: 2024 Issue/Hejmar/Sayı: 10
e-ISSN: 2717-8315

Publication Date | Tarîxa Weşanê | Yayın Tarihi

December 2024 · Kanûna Pêşîn 2024 · Aralık 2024

Period | Peryod | Periyod

Biannually, June and December
Salê du hejmar, Hezîran û Kanûna Pêşîn
Yılda iki sayı, Haziran ve Aralık

Scope | Vegirî | Kapsam

Kurdish Language, Culture, Literature, History and Art
Ziman, Çand, Wêje, Dîrok û Hunera Kurdî
Kürt Dili, Kûltürü, Edebiyatı, Tarihi ve Sanatı

Language Publication | Zimanê Weşanê | Yayın Dili

Kurdî · English · فارسی · عربي · Türkçe

Articles should include a title, abstract (250-450 words), keywords (at least 5 concepts) in at least two languages, especially Kurdish and English, and should be prepared in accordance with APA 6 citation system.

Gotar divê sernavê, kurteyê (250-450 peyv) û peyvên sereke (herî kêr 5 têgeh) bihewîne ku ew kêrî bi du zimanan bê nivîsîn, bi taybetî jî kurdî û inglîzî, herwiha gotar divê li gorî sîstema jêderan a APA 6ê bê amadekirin.

Makaleler Kürtçe ve İngilizce başta olmak üzere en az iki dilde başlık, özet (250-450 kelime), anahtar kelimeler (en az 5 kavram) içerir ve APA 6 atf sistemine uygun olarak hazırlanır.

Executive Office | Rêvebirî | Yönetim Yeri ve Adresi

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi

Yaşayan Diller Enstitüsü, 65080, Zeve Kampüsü, Tuşba/Van

e-mail: kurdiyat@yyu.edu.tr | web: <https://dergipark.org.tr/tr/pub/Kurdiyat>

Tlf: 04322251452 | Fax: 04322251228



Data Platform | Veri Platformları

ASOS, SOBIAD, OpenAIRE, Google Scholar, Idealonline, İSAM, ResearchGate.

Kurdiyat is licensed under a Creative Commons Attribution-NonCommercial 4.0 International Licence.

Kurdiyat di bin lîsansa Creative Commons Attribution-NonCommercial 4.0 International License de derbasdar e.

Kurdiyat Creative Commons Atf-GayriTicari 4.0 Uluslararası Lisansı ile lisanslanmıştır.



VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

Owner | Xwedî | Sahibi

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Rektörü | Rector of Van Yuzuncu Yil University
Prof. Dr. Hamdullah ŞEVLİ

Managing Editor | Editorê Berpirs | Sorumlu Yazı İşleri Müdürü

Prof. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
ORCID: 0000-0002-6887-6223 | atimurtas@yyu.edu.tr

Editor-in-Chief | Edîtor | Editör

Doç. Dr. Yakup AYKAÇ, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
ORCID: 0000-0002-2602-484X | yakupaykac@yyu.edu.tr

Editorial Board | Lijneya Weşanê | Yayın Kurulu

Prof. Dr. Mehmet Salih GECİT | Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi, Türkiye
ORCID: 0000-0001-7212-2291 | msgecit@agri.edu.tr

Prof. Dr. Abdullah KIRAN | Muş Alparslan Üniversitesi, Türkiye
ORCID: 0000-0001-9136-7665 | a.kiran@alparslan.edu.tr

Prof. Dr. Mehmet Nesim DORU | Ankara Sosyal Bilimler Üniversitesi, Türkiye
ORCID: 0000-0002-3519-7654 | mehmetnesim.doru@asbu.edu.tr

Prof. Dr. Atik AYDIN | Ankara Sosyal Bilimler Üniversitesi
ORCID: 0000-0001-5995-945X | atik.aydin@asbu.edu.tr

Prof. Dr. Kemal KAYA | Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye
ORCID: 0000-0002-8797-5980 | kemalkaya@yyu.edu.tr

Doç. Dr. Abdulhalim OFLAZ, Iğdır Üniversitesi, Türkiye
ORCID: 0000-0002-9921-5444 | abdulhalim.oflaz@igdir.edu.tr

Dr. Hewa Salam KHALID | Indiana University, USA
ORCID: 0000-0003-4513-6596 | hewasalam@gmail.com

Dr. Nevzat AĞÇAKAYA | Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye
ORCID: 0000-0002-4606-9279 | nagcky@yyu.edu.tr

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü'nün bilimsel bir yayım organı olan Kurdiyat, uluslararası hakemli bir dergi olup yılda iki sayı (Haziran- Aralık) olarak yayımlanır. Dergide Kürt dili, kültürü, edebiyatı, tarihi ve sanatı alanlarında akademik nitelik taşıyan ve Türkçe, Kürtçe, İngilizce, Arapça ve Farsça dillerinde yazılan bilimsel çalışmalara yer verilir. Kurdiyat'da yayımlanan makalelerin içeriğinden yazarları sorumludur.

**Field Editor (Language and Grammar)
Editorê Biwarî (Ziman û Rêziman)**

Doç. Dr. Zafer AÇAR, Bingöl Üniversitesi
ORCID: 0000-0001-5323-9531
zacar@bingol.edu.tr

**Field Editor (Modern Literature)
Editorê Biwarî (Edebiyata Klasik)**

Doç. Dr. İlyas SUVAĞCI, Hakkari Üniversitesi
ORCID: 0000-0001-6409-1229
ilyassuvagci@hakkari.edu.tr

**Field Editor (Classical Literature)
Editorê Biwarî (Edebiyata Klasik)**

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
ORCID: 0000-0002-6315-6075
nesimsonmez@yyu.edu.tr

**Field Editor (Cultural Studies)
Editorê Biwarî (Xebatên Çandî)**

Doç. Dr. Haşim ÖZDAŞ, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
ORCID: 0000-0002-4621-435X
hozdas@yyu.edu.tr

**Field Editor (Folklore and Folk Literature)
Editorê Biwarî (Folklor û Edebiyata Gelêrî)**

Doç. Dr. Kenan SUBAŞI, Mardin Artuklu Üniversitesi
ORCID: 0000-0001-7744-1646
kenansubasi@artuklu.edu.tr

**Book Review Editors
Editorên Nirxandina Pirtûkan**

Dr. Öğr. Üye. Abdulsemet AYDOĞDU, Van Yüzüncü Yıl
ORCID: 0000-0002-0312-4928
saydeniz@yyu.edu.tr

**English Language Editors
Editorên Zimanî (İngilîzî)**

Dr. Öğr. Üye. Nevzat AĞÇAKAYA, Van Yüzüncü Yıl Üni.
ORCID: 0000-0002-4606-9279
nagcky@yyu.edu.tr

**Kurdish Language Editors (Kurmanji)
Editorên Zimanî (Kurmancî)**

Dr. Mehmet Nur YAVUZER, MEB, Van
ORCID: 0000-0002-5648-5743
mehmetroniyavuzer@gmail.com

Dr. Mehmet YILDIRIMÇAKAR, Van Valiliği, Van
ORCID: 0000-0003-3565-1156
mehmetyildirimcakar@gmail.com

**Kurdish Language Editors (Zazaki)
Editorên Zimanî (Kirdkî)**

Dr. Buşra GÖKALP, Bingöl Üniversitesi
ORCID: 0000-0001-7374-2388
bgokalp@bingol.edu.tr

**Kurdish Language Editors (Sorani)
Editorên Zimanî (Sorani)**

Dr. Faez Aziz ALI, Araştırmacı-Yazar
ORCID: 0000-0003-3459-4225
faezazizali@yahoo.com

Öğr. Gör. Mazhar Ebrahimi, University of Kurdistan, Iran
ORCID: 0009-0006-1566-0572
mazharebrahimi@gmail.com

**Turkish Language Editors
Editorên Zimanî (Tükçe)**

Dr. Öğr. Üye. Bilal DEMİR, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
ORCID: 0000-0002-2913-7946
bilaldemir@yyu.edu.tr

**Persian Language Editors
Editorên Zimanî (Farisî)**

Öğr. Gör. Mazhar Ebrahimi, University of Kurdistan, Iran
ORCID: 0009-0006-1566-0572
mazharebrahimi@gmail.com

Dr. Mehmet Nur YAVUZER, MEB, Van
ORCID: 0000-0002-5648-5743
mehmetroniyavuzer@gmail.com

Kurdiyat, which is a scientific publication of Van Yüzüncü Yıl University, Institute of Living Languages, is an international refereed journal and is published twice a year (June - December). The journal includes scholarly works in the fields of Kurdish language, culture, literature, history and art written in Kurdish, Turkish, English, Arabic and Persian. The authors are responsible for the content of the articles published in Kurdiyat.

Arabic Language Editors
Editorên Zimani (Erebi)

Dr. Faez Aziz ALI, Araştırmacı, KRG-Iraq
ORCID: 0000-0003-3459-4225
faezazizali@yahoo.com

Writing Editors
Editorên Rastnivîsê

Dr. Mehmet Nur YAVUZER, MEB, Van
ORCID: 0000-0002-5648-5743
mehmetroniyavuzer@gmail.com

Dr. Mehmet YILDIRIMÇAKAR, Van Valiliği, Van
ORCID: 0000-0003-3565-1156
mehmetyildirimcakar@gmail.com

Website Editor
Editorê Malpera Kovarê

Doç. Dr. Yakup AYKAÇ, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
ORCID: 0000-0002-2602-484X

yakupaykac@yyu.edu.tr

Social Media Editor
Editorê Tora Civaki

Mazhar ÇİFTÇİ, Doktora, Bingöl Üniversitesi
ORCID: 0000-0001-8315-9049
mezherekale@gmail.com

Layout Editor
Editorê Mizanpajê

Öğr. Gör. Erdal YILDIZ | Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
ORCID: 0000-0001-5285-3492 | erdal yıldiz@yyu.edu.tr

Sekretariat
Sekreteri

Öğr. Gör. Hacı YILMAZ, Van YYÜ
ORCID: 0000-0003-4034-8565
haciyilmaz@yyu.edu.tr

Advisory Board | Lijneya Şêwrê

Prof. Dr. Hasan ÇİÇEK
Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye
ORCID: 0000-0001-5914-8323
hcicek@yyu.edu.tr

Prof. Dr. Mahmut DÜNDAR
Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye
ORCID: 0000-0003-1856-6494
mahmutlardan@hotmail.com

Prof. Dr. Hayreddin KIZIL
Dicle Üniversitesi, Türkiye
ORCID: 0000-0001-9165-3274
hkhayreddin@gmail.com

MEQALAT

Research Articles | Gotarên Lêkolînê | Araştırma Makaleleri

- 1- DAHÛRANDINA WERGERA KURDÎ YA HEFT HAİKÛYÊN JACK KEROUAC LI DOR MODELA ANALÎZA TEKSTÊ YA WERGER-NAVEND A CHRISTIANE NORDÊ**
Analysis of Kurdish Translation of Seven Haikus by Jack Kerouac within The Framework of Christiane Nord's Translation-Oriented Text Analysis Model
Jack Kerouac'ın Kürtçe Yedi Haiku Çevirisinin Christiane Nord'un Çeviri-Odaklı Metin Analizi Modeli Çerçevesinde İncelenmesi
Sami ÇELİKTAŞ & M. Zahir ERTEKİN **7-24**
-
- 2- ZAZACA HALK ANLATILARINDA DEV MİTİ**
The Giant Myth in Zazaki Folklore
Vatişanê Şarî yê Zazayan de Mîtê Dewî
Buşra GÖKALP & Hasan ÇİFTÇİ **25-40**
-
- 3- MECÎDÊ HEMGULÎ: JIYAN, DENG BÊJÎ Û BERNIVÎSANDINA DESTANA MIHEMED EMÎN (LEYLA Û MECRÛN)**
Mecid Hemgulî: Life, Dengbêjî and Writing of the Epic of Mihemed Emîn (Leyla and Mecerûn)
Mecid Hemgulî: Hayatî, Dengbêjîgi ve Mihemed Emîn (Leyla ile Mecerûn) Destanının Yazıya Aktarılması
Sevim HATUN SÜRÛCÛ **41-65**
-
- 4- ŞERÊ GAMÊŞVANÊ DI WESÎQEYÊN DÎROKÎ Û KILAMÊN DENG BÊJAN DA**
The Battle of Gameshvan in the Historical Documents and the Songs of the Dengbêjs
Tarihi Vesika ve Dengbêj Kılamlarında Gameşvan Çatışması
Önder BEYTER **67-87**
-
- 5- MARK SYKES'İN ESERLERİNDE KÛRT ALGISI**
Têgihîştina Kurdan di Berhemê Mark Sykes da
Perception of Kurds in Mark Sykes's Works
Kenan BOZKURT **89-119**
-

6- VEKOLÎNEK LI SER CUREYÊN BÊJEYÊN METINÊN DI PIRTÛKA DERSA KURMANCÎ YA POLA HEŞTEM DA

A Review on The Word Types in The Texts in The Eighth Grade Kurmancî Textbook

Sekizinci Sınıf Kurmancî Ders Kitabındaki Metinlerde Yer Alan Kelime Türleri Üzerine Bir İnceleme

Bayram GÖKHAN & Kenan BULUT

121-142

7- XEWNEKE POLÎTİK: ÇÎROKA CEMÎL SAÎB DI XEW DE

A Political Story: Cemil Saib's Le Xewma (In Sleep)

Politik Bir Öykü: Cemil Saib'in Di Xew De (Uykuda) Adlı Öyküsü

Sinan ÇAKAR

143-155

KITABIYAT

Book Review | Nirxandina Pirtûkê | Kitap Değerlendirmesi

8- ÎNGİLİZ SEYYAHLARIN GÖZÜYLE ONDOKUZUNCU YÜZYILDA KÜRTLER

Aram RODER

157-164



DAHÛRANDINA WERGERA KURDÎ YA HEFT HAÏKÛYÊN JACK KEROUAC LI DOR MODELA ANALÎZA TEKSTÊ YA WERGER-NAVEND A CHRISTIANE NORDÊ*

Sami ÇELİKTAŞ & M. Zahir ERTEKİN

Analysis of Kurdish Translation of Seven Haikus by Jack Kerouac within The
Framework of Christiane Nord's Translation-Oriented Text Analysis Model

Jack Kerouac'ın Kürtçe Yedi Haiku Çevirisinin Christiane Nord'un Çeviri-Odaklı Metin
Analizi Modeli Çerçevesinde İncelenmesi

Sami ÇELİKTAŞ

ORCID: 0009-0005-3190-7179 | samiceliktas030@gmail.com
Dr., PhD Graduate, Department of Kurdish Language and Culture,
Bingöl University, Türkiye.

M. Zahir ERTEKİN

ORCID: 0000-0003-3519-9892 | zahirertekin@hotmail.com
Prof. Dr., Department of Kurdish Language and Literature, Mardin
Artuklu University, Türkiye.

Citation/Jêgir/Atif:

Çeliktaş, S. & Ertekin, M. Z. (2024). Dahûrandina wergera kurdî ya heft haikûyên Jack Kerouac li dor modela analîza tekstê ya werger-
navend a Christiane Nordê. Kurdiyat (10), 7-24. DOI: 10.55118/
kurdiyat.1489912

Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:

Research Article/Gotara Vekolinê/Araştırma Makalesi

Received/Dema Hatînê/Geliş Tarihi: 25.05.2024

Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 25.09.2024

Publication Date/Dema Weşandinê/Yayın Tarihi: 30.12.2024

Peer-Review/Hekemti/Hakemlik:

Double anonymized-Two External/Cot Nenas-Du ji derve/ Çift Tarafî
Kör Hakemlik-İki hakem

Plagiarism Checks/Kontrola Întihalê/Benzerlik Kontrolü:

This article has been scanned by iThenticate plagiarism website./
Ev gotar di malpera întihalê ya iThenticate ra hatiye derbaskirin./ Bu
makale iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır.

Ethical Statement/Beyana Etik/Etik Beyanı:

It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited./ Hatîye beyankirin ku di pêkanin û nivîsina vê xebatê de hemû rêzikên zanistî û etik hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têkûz hatine referanskirin./ Bu çalışmaya yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.

Conflicts of Interest/Nakokiyên Berjewendiyên/Çıkar Çatışması:

There is no conflict of interest between the author and any parties in the article./ Di gotarê de li navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendiyê tune ye./ Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.

Grant Support/Alîkariya Darayî/Maddî Destek:

The authors acknowledge that they received no external funding in support of this research./ Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê vekolinê ti fonên derveyî wernegirtine./ Yazarlar, bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.

Copyright & License/Mafê Telifê & Destûr/Telif Hakkı & Lisanslama:

Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0./ Nivîskar li jêr lisansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin./ Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

* Ev gotar, ji beşeke teza doktorayê ya bi navê "Wergera Edebi di Kurdi de: Dahûrandineke li dor Modela Wergerê ya Christiane Nordê" hatiye amadekirin.

Kurte

Cureya haikûyê nerîteke helbestê ya edebiyata Japonî ye û ji hêla teşe û naverokê ve xwedî taybetiyên xwemalî ye. Nimûneyên vê cureya helbestê ji sedsala 19an û pê de li nav edebiyatên cîhanê jî diyar bû. Nimûneyên wergerê yên haikûyan, ji hêla hejmarê ve kêm be jî, li wan salên dawî di edebiyata Kurdî de jî xuya dibin. Haikûyên Amerîkî ji hêla teşe û naverokê ve ji nerîta haikûya Japonî cuda dibin. Di vê pêwendiyê de taybetî û şêwaza wergerên Kurdî yên haikûyan û têkiliya wan a bi haikûyên resen, dibe mijareke lêkolînê. Di vê xebatê de, li dor modela Christiane Nordê ya bi navê *analîza tekstê ya werger-navend* me wergerên Kurdî yên heft haikûyên Jack Kerouac nirxandin. Me bala xwe da ser tercîh û pêşekiyên wergêr, da ku em karibin rêbaza wergêr şirove bikin. Di çarçoveya modela Nordê de jî me hokarên navmetnî û dermetnî li ber çav girtin, da ku em fonksiyon û hevtayîya edebî ya teksta jêder û teksta armanc bi şikleki berawirdî binirxînin. Bi dahûrandina wan wergeran, me armanc kir ku em têkiliya haikûyên resen û yên wergerandî ronî bikin, di çarçoveya şêwaz û cureya haikûyê de hevtayîya edebî ya haikûyên jêder û yên armanc destnîşan bikin û wergera wan haikûyan rexne bikin.

Peyvên Sereke: Wergera edebî, Wergera helbestê, Haikû, Jack Kerouac, Christiane Nord, Analîza werger-navend.

Abstract

Haiku is a type of Japanese poetry and is unique in terms of form and content. From the 19th century onwards, this genre has appeared in international literature as well. In recent years, examples of haiku translations have appeared in Kurdish literature, although they are few in number. American haiku differs in form and content from the Japanese style of haiku. In this relationship, the peculiarities and the style of the Kurdish translations of haiku and their relationship to the original haiku have become a subject of research. In this article, based on Christiane Nord's model, called translation-oriented text analysis, we discuss the Kurdish translations of Jack Kerouac's seven haikus. We focus on the translator's preferences and priorities in order to interpret the translator's style of translation. Within the framework of Nord's model, we consider intratextual and extratextual factors to evaluate the translations and the literary equivalence of the source and target texts. This study aims to clarify the relationship between the original haikus and the translated haikus. This is achieved by demonstrating the resemblance between the source haikus and the target haikus in terms of style and type. Additionally, the study critiques the translations.

Keywords: Literary translation, Poetry translation, Haiku, Jack Kerouac, Christiane Nord, Translation-oriented analysis.

Özet

Haiku tür olarak Japon edebiyatının dünya edebiyatına sunduğu biçim ve içerik bakımından benzersiz bir şiir türüdür. Bu şiir türü 19. yüzyıldan itibaren diğer ulusal edebiyatlarda da ortaya çıkmaya başladı. Kürt edebiyatında son yıllarda her ne kadar sayıca az da olsa haiku tercümelemlerinin örnekleri ile karşılaşmaktayız. Amerikan haiku örnekleri ise biçimsel özellikleri ve içerikleri bakımından Japon haiku tarzından farklıdır. Bu bağlam içerisinde haiku'nun Kürtçe çevirilerinin özellikleri, üslubu ve kaynak haiku eserleri ile ilişkisi araştırmaya değer bir konu haline gelmiştir. Bu çalışmamızda Christiane Nord'un *çeviri odaklı metin analizi* adı verilen modelinden yola çıkarak Jack Kerouac'ın yedi haiku eserinin Kürtçe çevirileri ele alınmıştır. Çevirmenin çeviri tarzını yorumlayabilmek için çevirmenin tercihleri ve öncelikleri üzerinde durulmuştur. Nord'un modeli çerçevesinde metin içi ve metin dışı faktörleri dikkate alarak kaynak ve erek metinlerin edebi eşdeğerliğini değerlendirdik. Bu çalışmamıza konu olan haiku çevirilerin analizi yoluyla kaynak haiku ile erek haiku arasındaki ilişkiyi, kaynak haiku ile erek haiku arasındaki benzerliği haiku'nun üslup ve türü bağlamında açıklığa kavuşturmayı amaçladık. Ayrıca çevirilere dair eleştirilerimizi de ortaya koyduk.

Anahtar Sözcükler: Edebiyat çevirisi, Şiir çevirisi, Haiku, Jack Kerouac, Christiane Nord, Çeviri odaklı metin analizi.

Destpêk

Werger hem wekî bikereke veguhestinê ya navbera ziman û edebiyatan hem jî wekî parçeyêke navxweyî ya edebiyatê, xwedî cih û fonksiyoneke giring e. Cihê wergerê, fonksiyon û bandora wê ya di nav edebiyata Kurdî de mijareke hêjayê lêkolînê ye. Ji bo diyarkirina cihê wergerê û rengvedana wê ya di nav edebiyata Kurdî de, ji bilî xebatên lêkolînê, pêwîstî bi analîza berhemên werger jî heye. Analîza wergeran jî bivê nevwê xwe dispêre teorî, model an jî têgihên wergerê yên xwedî pênaseyêke hevpar. Bi rêya analîzên wergeran, ku li gor model û teoriyên wergerê pêk tên, derfetên nirxandinê yên gelemperî û yên spesîfîk bi dest dikevin. Ev xebat bi modela Nordê, li ser çend nimûneyên wergera cureya haîkûyê radiweste.

Wergera helbestê di nav wergera cureyên edebî de xwedî ciheke berbiçav e û bûye mijara niqaşên cihêreng. Zimanzan û wergernasan derbarê gengaziya wergera helbestê de angaşên cihê pêşkêş kirine. Yek ji hokarên ku helbestê ji cureyên din cuda dike xasyeta vê ya zimanî ye ku di vê xasyeta zimanî de rûxsar û naverok bi awayekî taybet bi hev ve girêdayî ne. Berevajî cureyên din, ziman di helbestê de bêtir metaforîk e. Ji bilî naveroka pir-wateyî û pir-qetmanî, forma estetîk jî di helbestê de taybetiyeke bineciher e ku gelek caran tercihên wergêran sînordar dike. Ji ber dijwarî û arîşeyên wergera helbestê gelek hewldanên teorîk û pratîk çê bûne ji bo hêsankirin û guncavkirina wergera vê cureyê. Pêgirên teoriyên wergerê yên ciyawaz li gor pêşekiyên xwe hin teorî û bi wan re jî peywendîdar hin stratejî û taktîkên wergera helbestê pêşkêş kirine.

Haîkû wekî cureyêke helbestê aîdî nerîta edebiyata Japonî ye. Wekî cure xwedî şêwazeke taybet a form û naverokî ye. Di sedsala 20an û pê de nimûneyên haîkûyê di edebiyata gelên din de jî tê dîtin ku yek ji wan jî edebiyata Amerîkî ye. Nimûneyên haîkûyê li wan deh salên dawî di edebiyata Kurdî de jî xuya bûn û çend nimûneyên wergerê yên ku wergêr Sidîq Gorican ji zimanê Îngilîzî wergerandine di kovarên edebî yên wekî Bar Helbest û LEWergerê de hatin weşandin. Di vê gotarê de em ê wergera heft haîkûyên haîkûnûsê Amerîkî Jack Kerouac bikin keresteyên dahûrandinê. Di beşa yekem de em bi dorê li ser wergera edebî, wergera cureyên edebî û wergera helbestê rawestiyên. Di beşa duyem de me cih da teoriya C. Nordê û nêrînên wê yên bingehîn rave kirin. Di beşa sêyem de me li dor teoriya navborî ya C. Nordê analîza nimûneyên haîkûyan kirin. Ji bo dahûrandinê me wergera Kurdî ya heft haîkûyan bijart ku ji hêla wergêr Sidîq Gorican ve hatine çêkirin.

1. Wergera Cureya Helbestê di Nav Wergera Edebî de

Pênasekirina wergera edebî bi şêwaza wergerandinê û li gor cureya teksta wergerandî di ser nimûneyêke wergerê re tê kirin. Baker (2001: 127) wergera edebî wekî berhema wergêrên edebî, pênase dike û xwedî vê angaşê ye ku divê ravekirina wergera edebî ji vê pênaseyê dest pê bike. Toury (1995: 175) wergera edebî (literary translation) wiha disenifîne: a) wergera berhemekê ya ku teksta jêder wekî berhemeke edebî hatiye qebûlkirin û b) wekî şêwazeke wergerê ku, teksta jêder bi çî cureyê be jî, di encamê de teksta armanc wekî teksteke edebî tê qebûlkirin. Li gor Ghazala (2015: 135) wergera edebî şêweyêke taybet a wergerê ye ku bi tenê ji wergera cure û jêr-cureyên edebî re têkildar e û hemî xasyetên edebîti û şêwaza afirîner a berhema resen li ber çav digire. Riffaterre (1992: 204-206) diyar dike ku bingeha cudabûnê ya wergera edebî ya ji wergera

giştî ew e ku bikaranîna zimên a di edebiyatê de ji bikaranîna gelemperî cihêtir e.

Nêrînên Walter Benjamin (1992: 71-76) rêya gelek niqaş û nirxandinan vekiriye derbarê wergera berhemên edebî de. Li gor Benjamin werger xasyeteke teşeyî ye û ji bo ku mirov wergerê wekî teşe fêhm bike divê mirov bala xwe bide ser berhema resen. Wekî pirsên sereke divê mirov wan bipirse: ‘gelo ew berhem a wergerandinê ye? û ‘ji ber çî sedemê wergera wê pêwîst dike? Li gor Devy (1999: 183) werger wekî berhemên resen nayên dîtin, ji ber vê yekê estetîka wergerên edebî jî tê paşguhkirin. Lê belê, her ku berhema edebî nivîseke aşopî ye û sêwirîna nivîskar dihewîne, bi heman awayî wergera wê berhemê jî divê wan xasyetan li ber çav bigire. Li gor House (2018:15) di berhemên edebî de teşeya zimanî (linguistic form) bi awayekî rasthatinî xuya nabe, an ku xwedî armancake estetîk e, lewma jî di wergerandina wan berhemên de teşeya berhemê divê faktoreke esasî ya wergerê be.

Landers (2001: 118-131) derbarê taybetiyên wergera edebî de balê dikişîne ser sê xalan ku di wergera edebî de dibin sedemê hin kêşeyan. Yek ji wan wergera tekstên kevn e ku wergêr di zimanê armanc de ji bijartina peyv û gotinan bigire heya kêşeyên bi anakronîzm û arkaîzmê re têkildar, neçar dibe ku gelek tiştan çareser bike. Xala duyem ku ew qal dike hebûna jêrtekst (subtext) an e di berhemên edebî de. Jêrtekst wateya sergirtî ya berhemên edebî didin kifşê, lewma jî giring e ku wergêr jêrtekstê, an ku wateya sergirtî ya berhemê, li ber çav bigire dema ku berhemê bi zimanê armanc ji nû ve diafirîne. Landers (2001: 130-131) behsa wergera nerasterast (indirect translation) jî dike ku ji ber hin şert û mercên taybet û ji hin neçariyan derdikeve holê.

Di lêkolînên wergera edebî de *cureya edebî* (genre) û *cureya tekstê* (text type) du têgehên giring in. Her ku qesta bi wergera cureya edebî wergera cureyên wekî helbest, çîrok, roman û yê din e, cureya tekstê berhemên ku ne edebî ne jî digire nav xwe. Ev her du têgeh di heman demê de ji bo kifşekirina tîpolojîya teksta wergerê jî kartêker in, lewre wergernas hem di pênasekirina kêşeyên wergerê de hem jî di pêvajoya wergerandinê de ji bo bijartina stratejiyên guncav girîngiyê didin tîpolojîyê. Di nav teoriyên fonksiyonel de, bi taybetî di nêrînên K Reiss, H. J. Vermeer û C. Nordê de têgeha cureya tekstê xwedî ciheke navendî ye. Reiss û Vermeer (2014 [1984]) li gor fonksiyonên wan, tekstan dabeş dikin û sê tîpolojîyên sereke destnîşan dikin: *tekstên agahîdêr* (informative), *tekstên derbirînî* (expressive) û *tekstên kartêker* (operative). Ew tekstên edebî dixin bin sernavê tekstên derbirînî ku berhemên bi vê cureyê xwedî hêmanên estetîk in û bi armanca bandoreke estetîk hatine nivîsandin. Li gor Nordê (1997: 27-31) armanca nivîsîna tekstekê, xwînerên armanckirî yê wê tekstê û armanca wergerandina wê, tev ji nêzik ve bi cureya tekstê re têkildar in. Dema ku mirov di vê çarçoveyê de li ser cureya tekstê bifikire, cureya tekstê hem xasyeteke têkildarî niyeta nivîskar û berhemê ye, hem bandorê li ser xwînerê çê dibe û hem jî helwesta aktorên wergerê kifşe dibe.

Reynolds (2011: 62) derbarê cureyan de diyar dibe ku ew azmûneke hevpar a xwendinê ji girseyên berfireh ên xwîneran re dabîn dikin û vê yekê jî bi qalib û gotinên hevpar pêk tînin. Armanca û fonksiyona tekstekê cureya tekstê diyar dibe û lewma jî Munday (2001: 75) wan her du faktoran ji bo wergêr wekî taybetiyên herî giring dibîne ku divê di pêvajoya wergerandinê de li ber çav bigire. Ji hêla wergerê ve, giringiya cureya edebî ya tekstekê ya esasî ev e ku bê ka

bandoreke çawa li ser tercîh û stratejiyên wergerandinê dike û keşeyên çawa yê berbiçav derdixe holê. Keşeyeke sereke ya têkildarî cureya tekstê jî ew e ku carinan berginda cureyeke edebiyata jêder di edebiyata armanc de peyda nabe. Li gor Woodstein (2022: 6-9) wergêr ne bi tenê nivîskar û teksta wî/ê radiguhezîne lê di heman demê de cureyeke edebî jî radiguhezîne û ji bo vê yekê jî divê wergêr hem di çanda jêder de û hem jî di çanda armanc de ji cureyan beled be da ku stratejiyên guncav ên wergerandinê bikare bibijêre. Her çî qas sînoren diyar ên ku cureyên edebî ji hev cuda dikin hebin jî, hin caran nivîskar wan sînoren an jî xasyetên cureyî bin pê dikin, lewre wergêr divê bala xwe bide ser dibetiyên bi vî rengî jî.

Wergera helbestê di dîroka wergernasiyê de bûye mijara niqaşên cihêreng û zêdetir jî li ser pêkanî û nepêkaniya wergera helbestê gengeşî çê bûne. Angaştên ku nepêkaniya wergera helbestê derdixistin pêş di nav demê de lawaz bûn, lê belê kesên ku pêkanbûna wergera helbestê red dikirin dîsa jî xwedî îdiayên xurt bûn. Angaştên sereke her wekî Shi (2012: 3) destnîşan dike ew e ku helbest bi destkariyê bedewiya xwe winda dike, lewre werger jî cureyeke destkariyê ye. Di pratîkê de ew angaşt nebû astengî ji bo wergera helbestê, lê bû sedemek giring ku wergera helbestê ji wergera cureyên din cudatir bê dîtin. Di warê niqaşên têkildarî nepêkaniya wergera helbestê de nêrînên S. Bassnett hêjayî qalkirinê ne. Bassnett (1998: 57-58) balê dikişîne ser nêrînên neyînî yê derbarê pêkaniya wergera helbestê ku di nav wan de gotina navdar a Robert Frost heye her ku dibêje ‘helbest ew tişt e ku di proseya wergerê de winda dibe’. Bassnett wan fikrên ku helbestê wekî ‘tiştêkî ku dest lê bikeve dê xirab bibe’ û helbestvan jî wekî ‘kesekî xwedî xasyetên bijarte’ dibînin rexne dike. Li gor Bassnett (1998: 58), baweriya ku helbestê wekî tiştêk ‘nayê wergerandin’ qebûl dike ji wê pîrozî û hêjabûna pirolekirî ya statuya helbestvan a di serdema romantîk de tê. Helbestvan wê demê xwedî gelek rol û qîmetên din ên bilind bûn û gotina wan jî dibû tiştêkî giran û neguherbar.

Wechsler (1998: 19) balê dikişîne ser rewşa berhemên têkûz ên edebî ku sînoren zimanan nas nakin û dibêje ku berhemeke hêja piştî wergereke normal jî dîsa şewq dide, lê eger ew berhem helbest be, hingê dibe ku piştî wergerandinê bi qasî berê wekî berhemeke gewre şewq nede. Ev nêrîn rewşa hesas a helbestê ya li hember wergerê nîşan dide. Estetîka helbestê di pêvajoya wergerandinê de bêtir tûşî xeterên xirabûnê tê li gor berhemên peşankî. Ev yek jî ji ber xasyeta zimanê helbestê tê. Li gor şayesandina Baker (2001: 171) helbest di nav cureyên edebî de ya herî yekgirtî, tîr û bilind e. Di vê cureya nivîsa edebî de ziman bi şiklekî nerastrast tê bikaranîn, û şikl û naverok bi awayekî ku ji hev neqetin bi hev re pêwendîdar in.

Baker (2001: 171) di çareserkirina kêşeyên wergera helbestê de du helwestên sereke dest nîşan dike. Ji wan helwesta pragmatîk ranêzikiya wergêran nîşan dide û zêdetir têkildarî karên pratîkî yê wergerê ye. Helwesta teorîk jî girêdayî modelên teorîk in ku piranî ji hêla zimanzanan hatine pêşxistin. Têkildarî çareseriyên pratîkî Babler peywira sereke ya wergêrê helbestê wiha dest nîşan dike: “Ji aliyekê ve wergêr divê ji helbesta bi zimanê jêder helbesteke nû bi zimanê armanc bifirîne, û ji aliyê din ve jî hindî ku ji dest hat divê wate, deng û musîqaya helbesta resen biparêze” (1970: 194). Her çî qas destnîşankirina peywirê bi vî awayî karekî hêsan xuya bike jî, pêvajoya pêkanîne ewqas hêsan nîn e. Lewre Babler (1970: 194-195), ê ku ev peywir destnîşankiriye, diyar dike ku di pêkanîna vê peywirê de dê gelek guherîn çêbin. Di encamê de jî wergêr dê ji ber hin

tercîh û pêşekiyên xwe hin taybetiyên berhema resen jî bike qurbanî. Lewre pêwîst e ku wergêr divê hem rexnegirê edebî be, hem bi têra xwe zimanzan be û hem jî bi têrê şair be da ku berdêl û qurbanîkirinên wî/wê jî kêmtir bin.

Derbarê helwesta di pêvajoya wergerandinê de û ji bo çareseriya kêşeyên wergerê Landers (2001: 98) hin pêşniyazan dike û dibêje ku beriya ku wergêr dest bi wergera helbestê bike, pêwîst e ku hin biryaran bide û hin tiştan derbarê deqa jêder kifşe bike. Berî her tiştî divê biryarê bide ka gelo ew ê wergereke bi serwa bike yan jî na, kîjan qalibên metrîk li gor reseniya helbestê ye û heviyên xwînerên armanc çî ne? Biryar her çî be jî, li dawiyê divê helbesteke hêjayî xwendinê derkeve holê. Dijwarî û xasyetên wergera helbestê her çî û çawa bin jî, wergêrên helbestê di gel dijwariya karê xwe ji wergêrên din zêdetir rastî rexneyan tên. Vanderauwera (2014: 202) di gotareke xwe de ji hêla bendewariyên xwîner/rexnegir ve nêzikî mijara rexneyê dibe. Li gor wê rexneyên derbarê wergerên edebî piranî têkildarî hêsani/dijwariya xwendina deqa wergerandî ne. Xwîner û rexnegir berî her tiştî lê dinêrin bê ka werger bi awayekî hêsan û têgîner tên xwendin an jî na. Gelek caran xwîner û her wisa rexnegir jî derbarê guherînên zimanî û qalibên ku li zimanê armanc nayên, pir hasas in û li hember tiştên nestandart û edetî bertekan nîşan didin.

Nêrînên J. Holmes (1970: 90-97) ên derbarê wergera helbestê di lîteratura wergera edebî de li cihekî taybet dîsekine. Holmes rêbazên wergerandina helbestê bi çar kategoriyan ve dabeş kirine. Ev kategori jî bo nirxandina asta teorîk a wergerekê û ji bo dahûrandina helwesta wergêr çarçoveyeke teorîk çê dikin û ji bo analîzên wergerê jî sûdewer in. Ew çar kategoriyan ku em ê li jêr bi kurtî qal bikin ev in: *mîmetîk*, *analojîk*, *organîk* û *der-edetî*. Andre Lefevere jî di sala 1975an de xebata xwe ya li ser wergera helbestê pêşkêş kir ku ew xebat ji hingê ve bûye referanseke giring di vê mijarê de. Lefevere di vê xebata xwe de 7 stratejî kifşe kirin ji bo wergera helbestê: *wergera dengane*, *wergera rastîne*, *wergera metrîk*, *wergera nezmê ya pexşankî*, *wergera bi serwa*, *wergera nezma bê serwa* û *wergera şirovekîrî*. Ji wan heft stratejiyan her yek giringiyê dide hêleke taybet a helbestê. Helbet ew stratejî bi awayekî teqez ji hev venaqetin, lewre wergêr dikare hinek ji wan stratejiyan bi hev re bi kar bîne.

1.1. Haîkû Wekî Cureyeke Helbestê

Haîkû cureyeke helbesta lîrîk e ku ji edebiyata Japonî belavî cîhanê bûye. Di gelek edebiyatên neteweyî de, bi taybetî piştî sedsalên 19 û 20an, nimûneyên haîkûyan xuya bûne. Di wan nimûneyan de, her çî qas jî hêla teşeyê ve hin guhertin pêk hatibin jî, tê dîtî ku haîkûyê bi giştî xasyetên xwe yê resen ên cureyî parastîye (Henderson, 1990: 27-29). Her ku haîkû tûşî ziman, çand û civakên nû bûye, mijar û temayên wê jî berfirehtir bûne. Ji bilî temayên siruştî, di nav demê re hestên mirovî yê têkildarî tevgera jiyana bajêr û nakokiyên din ên civakî jî bûne mijarên haîkûyan.

Her çî qas nimûneyên haîkûyan ên ji serdemên kevntir jî hebin, Blyth (1963) dide zanîn ku Matsuo Bashō di sedsala 17an de pêşengiya vê cureya helbestê kir. Wekî peyrevên wî jî haîkûnûsên wekî Buson, Shiki, Issa û Takahama Kyoshi bûn tevkarên belavbûna cureya haîkûyê ku destpêkê li seranserê Japonyayê û piştê jî li çar aliyên cîhanê deng veda. Bandora haîkûyê jî hêla teşe û naverokê ve li ser tevger û helwestên cihê yê wêjeyî çê bû, wekî mînak helbesta îmajîst a edebiyata

Îngilîzî di destpêka sedsala 20an de bandor ji haikûyê wergirt û helbestvanên wekî W. B. Yeats, Ezra Pound, Jack Kerouac û Richard Wright jî ji nêzik ve bi tradîsyona haikûyê re têkildar bûn (Hakutani, 2009: 2-5). Di edebiyata Kurdi ya modern de helbestvanên wekî Berken Bereh, Şemal Akreyî, Xalid Elî Silêvanî, Ulku Bîngol û Kawa Nemir haikû nivîsîne û berhemên xwe çap kirine. Li wan salên dawî haikû di nav helbestvanên ciwan de jî dibe cureyeke popûler û nimûneyên haikûyên Kurdi diyar dibin.

Henderson (1990: 14) haikûya klasîk a Japonî bi çar xasyetên wê yên bîngêhîn ve pênase dike: 1) Ji 17 kîteyan pêk tê û wekî 3 rêzik (5-7-5) tê honandin. 2) Ji rewşên mirovî bêtir rewşên siruştî pêşkêşî xwînerên xwe dike. 3) Derbarê bûyereke kifşe ye, an ku rewşê bi awayekî gelemperî nîşan nade. 4) Behsa bûyereke dema *nîha* dike, an ku bûyereke *rabirdû* pênase nake. Haikûyên Japonî wekî yek rêzik tînan nivîsandin lê bi rêya peyvekê –bi zimanê Japonî ev peyv *kireji* ye– rawes dike nav rîtmî helbestê. Bi peyvekê haikûnûs tişteki dibire û bi tişteke din didomîne (Henderson, 1990: 18). Haikûyên Japonî yên klasîk derbarê siruştê û demê ne, lewre di wan haikûyan de herî zêde em rastî demsalê, danê rojê û hêmanên siruştê tînan. Dem û siruşt wekî du temayên bîngêhîn di hişê haikûnûs de bi mîzaheke bîcoş li hev diqelîbin û dibin bîngêha ravekirina bûyereke kifşe ya dema nivîsînê an jî hestkirinê. Ev nayê vê wateyê ku di haikûyan de mirov û rewşên tînkildarî mirovan cih nagire. Rast e ku siruşt mijara haikûyê ya esasî ye, lê belê her wekî Yasuda (2011: 238) destnîşan dike di çand û tîngihîştina Japonan de mirov beşeke bîngêhîn a siruştê ye û hemî tiştên tînkildarî mirovan jî di nav siruştê de tînan qebûlîkin.

Xasyetên haikûyê yên teşeyî her çî qas li pêş haikûnûsan hin sînorên vegotinê xêz bikin jî, bandoreke erênî li ser sêwirana wan çê dikin. Ji ber vê sînorê ku bi kîte û rêzîkên kurt xêz bûye, haikûnûs hewl didin ku bi gotinên kurt peyameke xurt çê bikin û bala xwînerê xwe bikişînin ser wate û tîngihîştineke hevgerî. Her wisa haikûnûs gelek caran barê wateyê ya hunera xwe datînin ser milê xwînerên xwe. Çawa ku bi gotinên hindik kirpandina wateyekê, bibîrxistina îmajekê, hevsengandina mod û tona helbestî ne hêsan be, bi heman awayî wergera haikûyê karekî ne hêsan e. Parastina teşeya resen an jî dariştina teşeyê manendî haikûya resen, veguhestina niyeta haikûnûs, veguhestina peyamên haikûnûs ên eşkere û veşartî, û ji nû ve afirandina haikûyê estetîk tev wekî kêşe li benda wergêr in ku çareseriyekê ji wan re peyda bike.

2. Modela Analîza Tekstê ya Werger-Navend a Christiane Nordê

Nêrînên C. Nordê di nav teoriyên wergerê yên Ekola Fonksiyonel de cih digire û gelek caran wekî model jî tê binavkirin. Nord modela xwe ya bi navê *analîza tekstê ya werger-navend* di nav ekola fonksiyonel de pênase dike. Fikrên Nordê yên derbarê wergerê xwedî xalên hevpar in li gel teoriya skopos û teoriya çalakiyê yên ekola fonksiyonel. Nord modela xwe di 2 berhemên xwe de rave dike. Berhema yekem, *Text Analysis in Translation -Analîza Tekstê di Wergerê de-* (1991), bi hûrgilî hemî nêrînên Nordê yên derbarê wergerê û modela wê digire nav xwe. Berhema duyem, *Translating as a Purposeful Activity -Wergerandin Wekî Çalakiyê Xwedî Armanc-* (1997) li ser teoriya fonksiyonel bi giştî radiweste û her wisa nêrînên wê yên derbarê teoriya skopos û teoriya çalakiyê de jî parve dike. Nord di vê berhema xwe de xasyetên fonksiyonel yên wergera edebî û mijara hevtayîyê jî dinirxîne.

Nord li destpêkê behsa pêwîstiya modeleke dahûrîna tekstê dike da ku wergêr bi vê modelê arîşeyên têgihîştina bi teksta jêder bi her awayî çareser bikin. Nord (1991: 1-2) sazkirina modeleke analîza tekstê ya werger-navend gengaz dibîne. Li gor wê, modeleke wiha divê bi tenê girêdayî referansên zimanên jêder an jî zimanê armanc nebe, lê di heman demê de jî ji bo her du hêlên wergerandinê (ji zimanê yekem ber bi yê duyem û berevajî) kêrhatî be. Her wisa divê ev model bibe çarçoveyeke teorîk ji bo xebatên wergerê, perwerdehiya wergerê û çalakiya wergerandinê. Lewre divê modela ku tê qalkirin bi têra xwe gelemper be da ku li her deqê bê sepanandin û bi têra xwe jî spesîfîk be da ku arîşeyên wergerê yê cur bi cur bikare li ber çavan bigire. Modela Nordê di heman demê de erka senifandina tekstan û nirxandin û rexneya kalîteya wergeran jî digire nav xwe.

2.1. Wergera Fonksiyonel û Rewşa Ragihanî

Nord çend xalên bingehîn dest nîşan dike ku di modela wê de xwedî rolên giring in. Ew xalên bingehîn jî wekî 1) rêgezên wergerzaniyê û 2) rêgezên tekst-linguîstîk dabeş dike. Di bin sernavê rêgezên wergerzaniyê de cih dide *hokar û hêmanên pêvajoya wergerandinê, rola destpêşxer (initiator) û rola wergêr*. Di bin sernavê rêgezên tekst-linguîstîk de jî cih dide sernavên wekî *hevbandoriya ragihanî* (communicative interaction), *pêvajoya wergirtina tekstê* (text reception) û *tîpolojiyên tekstan* (1991: 5-24). Nord diyar dike ku (1991: 6) werger pêvajoya veguhestina tekstê ya navberçandî ye. Ev pêvajo bi çalakiya destpêşxerekî/ê dest pê dike. Destpêşxer serî li wergêrekî/ê dide ji ber ku dixwaze tekstekê di zimanê armanc ji nû ve bide hilberandin. Ev tekst jî bi zimanê jêder ji hêla hilberînerê/ê ve hatiye nivîsandin an jî şanderê ev tekst jî bo wergerandinê dabîn kiriye. Di vê pêvajoyê de hokar û hêmanên sereke li gor rêza demkî bi dorê ew in: *hilberînerê teksta jêder, şanderê teksta jêder, teksta jêder, wergirê teksta jêder, destpêşxer, wergêr, teksta armanc, wergirê teksta armanc*. Hilberînerê teksta jêder (nivîskar) û şanderê teksta jêder gelek caran heman kes in. Wergirê teksta jêder û teksta armanc xwînerên wan tekstan in.

2.2. Hokarên Analîza Teksta-jêder

Nord fonksiyona ragihanî wekî pîvana sereke ya tekstê dibîne û li gor wê taybetiyên sentaktîk û semantîk ji hêla giringiyê ve di pileya duyem de ne (1991: 41). Ji ber vê qebûla xwe jî Nord hokarên ku rewşa ragihanê (communicative function) diyar dikin wekî hokarên herî giring ên ji bo analîza teksta jêder destnîşan dike û wan wekî hokarên dermetnî (extratextual) bi nav dike. Hokarên dermetnî ên ku li gor Nordê rewşa ragihanê diyar dikin ew in: *şander (sender), niyeta şander, wergir (xwîner), navgîn/kanal, cihê ragihanê, dema ragihanê, motîva ragihanê û fonksiyona tekstê*.

Nord (42) rola wan hokaran a di rewşa ragihanê de wiha zelal dike: Nivîskar an ku şanderê tekstê bersiva (**kî?**) yê ye. Niyeta şander bersiva pirsra (**ji bo çi?**) dide. Xwînerê tekstê dibe berve, an ku beramberî bersiva (**ji bo kê?**) ye. Navgîn û kanala ku tekst pê tê ragihandin bersiva (**bi kîjan navgînê?**) dide. Cih (**li ku?**) û dem (**kengê?**) derbarê zeman û mekanek berbiçav ên ragihanê ne ku tê de tekst hatiye hilberandin û wergirtin. Motîv (**çima?**) jî sedema ragihanê nîşan dide. Bi bersiva wan pirsan tev jî bersiva faktora dawî, an ku fonksiyona tekstê (**bi kîjan fonksiyonê?**) derdikeve holê.

Nord (87-142) ji bo analîzkirin û têgihîştina xasyeta peyama nav tekstê li gel wan 8 hokarên

dermetnî yên li jor, 8 hokarên navmetnî jî destnîşan dike. Hokarên navmetnî ew in: *mijar*, *naverok*, *feraziye* (*presupposition*), *kompozîsyona tekstê*, *hêmanên ne-peyv*, *peyvşazî*, *hevoksazî* û *taybetiyên raparçeyî* (*suprasegmental features*). Hokarên navmetnî jî bi dorê mijara tekstê (**derbarê çi?**), agahî û naveroka nav tekstê (**çi?**), zanyariyên ku nivîskar wekî ferazî dihesibîne (**tiştên dîtir**), kompozîsyon û avaniya tekstê (**bi çi rêzê?**), hêmanên ne-zimanî (non-linguistic), kêlek-zimanî (paralinguistic) ku di nav tekstê de cih digirin (**bikaranîna hêmanên ne-gotinkî**), xasyetên bêjeyî (**bi kîjan peyvvan?**), avaniya hevoksaziyê (**bi hevokên çawa?**) ya tekstê digirin nav xwe. Taybetiyên raparçeyî yên întonasyon û prozodiyê (**bi kîjan tonê?**) diyar dikin. Wergêr û rexnegir di analîza wergerekê de dikare wan hokaran tev li ber çav bigire, an jî pêşekiyê bide hinekan. Di analîza hin berheman de jî, ji ber taybetiyên tekstê, hin hokar dibe ku qet bi kêrî analîzê neyên.

2.3. Rexneya Wergerê

Nord (1991: 179) destnîşan dike ku wekî edetî pirtûkek werger her wekî pirtûkek resen tê xwendin û çî dema ku dahûrînek derbarê wergera pirtûkê tê kirin jî piranî ew li gor normên zimanî û edebî yên çanda armanc çê dibe. Bi awayekî din mirov bibêje, tiştê ku tê nirxandin berhema wergerandî ye. Nord her çî qas modela xwe ya analîzê ya li gor hokarên dermetnî û navmetnî ji bo analîza teksta armanc guncav bibîne jî, qîma xwe bi analîzeke yekalî nayne. Li gor wê, rexneyeke wergerê ya objektîf divê hem teksta jêder û hem jî teksta armanc bi awayekî berawirdî analîz bike, cudatî û manendiyên wan destnîşan bike û proseya wergerê û stratejiyên ku hatine bikaranîn rave bike. Dîsa jî Nord (180) berawirdkirineke bi vî rengî ya teksta jêder û teksta armanc bi têrê nabîne, lewre eger berawirdkirin bi tenê di asta zimanî û şêwazî de bimîne, eger armanc û metodên wergerê nenirxîne û şertên derveyî yên ragihanê li ber çav negire, vê çaxê ew nabe rexneyeke tam.

Nord (180-181) ji bo rexneyeke îdeal wekî pîvan destnîşan dike ku divê tê de hem analîz û nirxandina proseya wergerê û armanca wergerê hebe û hem jî nirxandina teksta armanc û fonksiyona wê ya ji bo armanca wergerê bê kirin. Di modela Nord de rexneya wergerê bi berawirdkirina teksta jêder û teksta armanc dest pê dike. Bi vî berawirdkirinê rexnegir derbarê proseya wergerandinê de dibe xwedî fikr; helwest û stratejiya wergêr dibîne û heta dikare armanca wergerandinê jî şirove bike. Li gor Nordê (182) di rexneya wergerê de berî her tiştî pêwîstî bi çarçoveyê teorîk û bijartina pîvanên nirxandina wergerê heye. Ji bo kifşekirina referansên teorîk û pîvanên rexneyê, rexnegir an bala xwe dide nîşe û danezanên wergêr, an jî eger ew referans, tercîh û pîvanên wergêr eşkere nehatibin diyarkirin jî divê li gor analîzên xwe pêşbîniya tercîh û stratejiyên wergêr bike û hevgeriya wan li gor berawirdkirina teksta jêder û teksta armanc pêk bîne. Wekî rêya sêyem jî rexnegir/analîzkar divê li gor armanca wergerê ya (skopos) a ku bi xwe diyar kiriye rexneya wergerê bike.

Nord (182-183) pêvajoya rexneya wergerê bi analîza teksta armanc a li gor modela xwe dide destpêkirin, an ku ji dawiyê ber bi destpêkê vedigere. Di vî analîza teksta armanc de rexnegir dê bala xwe bidê ka teksta armanc li beramberî vî rewşa ragihanê tê ya ku ew ê de bibe xwedî fonksiyon. Ji bo rexnegir tiştê giring ev e ku tekst bi rewşa heyî bigunce, di çarçoveya armanca wergerê de fonksiyona xwe bi cih bîne û ev fonksiyon jî bi faktorên dermetnî re li hev bê. Nord di tu qonaxa rexneya wergerandinê de giringiyeke taybet nade tespîta xeletiyên wergerandinê. Tiştê

esasî ya rexneyê di modela Nordê de pêkanîna tekstê ya fonksiyon û bandorê ye.

2.4. Di Modela C. Nordê de Têkiliya Fonksiyonalîzmê û Wergera Edebî

Nord balê dikişîne ser xasyetên cuda yên ragihandina edebî û taybetiyên wê şirove dike. Li gor Nordê (1997: 80-81) şanderê teksta edebî nivîskar e û bi awayekî eşkere navê nivîskêr li ser berhemê tê diyarkirin. Eşkrebûna navê nivîskêr jî bandorê li ser rewşa wergirtinê û hêviyên xwîneran çê dike. Niyeta nivîskaran di tekstên edebî de bi awayên cur bi cur xuya dibin bes ev niyet bi vegotîneke derbirînî û di çarçoveya cîhaneke pevbestî de diyar dibin. Wergirên tekstên edebî jî xwîner in û xwedî hêvî û bendewariyên spesîfik in. Her çî navgîna teksta edebî ye, berhemên edebî piranî nivîskî ne. Derbarê hokarên wekî cih, dem û motîvê de jî Nord (81) destnîşan dike ku her çî qas ew hokar taybetiya teksta edebî û ya ne-edebî nîşan nedin jî di wergerê de ji bo diyarbûna ferqa çanda jêder û çanda armanc a ji hêla dem, cih û motîvê ve ew hokar dibin xwedî giringî.

Nord (82-84) bi taybetî balê dikişîne ser bandor û fonksiyonê, her ku cudatiya teksta edebî ji hêla wergerê ve pênasê dike. Li gor Nordê (82) edebîtiya tekstê çî bi mijara berhemê be, çî bi koda edebî ya bijartî û çî jî bi nerîta zimanî re têkildar be, tiştê teqez ew e ku teksta edebî bandoreke poetîk û estetîk li ser xwînerê xwe çê dike. Ev bandor jî dibe bandora spesîfik a tekstê û her wisa dibe fonksiyona tekstê ya edebî. Bi vê bandorê qîmeta edebî ya tekstê çê dibe û li ser vê bandorê têkiliyeke edebî navbera nivîskar û xwîner saz dibe. Nord (84) wergera edebî wekî ragihandineke navber-çandî (cross-cultural) bi nav dike û vê ragihandinê jî bi çar têkiliyên bingehîn şirove dike: a) *têkiliya navbera niyeta şander/nivîskar û tekstê*, b) *têkiliya navbera niyeta şander/nivîskar û bendewariya wergir/xwîner*, c) *têkiliya navbera şander û wergir*, d) *têkiliya navbera wergir û tekstê*.

Ji bo Nordê hevsenga fonksiyonê û bandorê pir giring e di ragihana edebî ya navber çandî (cross-cultural) de û ew vê hevsengê bi têgeha hevtayiyê li gor xwe şirove dike. Li gor Nordê (89) di wergera edebî de ji wergêr tê hêvîkirin ku hevtayiyeyeke navbera teksta jêder û teksta armanc ji hêla fonksiyona tekstê û bandora tekstê ve saz bike. Lê sazkirina hevtayiyeyeke bi vî rengî hin şert û mercan pêwîst dike ku Nord (89-93) wan di bin çar sernavan de wekî çar pêwîstekên hevtayiyê (equivalence requirement) formule dike û wan pêwîstekên hevtayiyê bi hin pêwîstekên nû yên li gor ranêzikiya skoposê berawird dike. Ev çar sernav jî bi dorê *Şirove* (interpretation), *Fonksiyona Tekstê*, *Dûratiya Çandî* û *Bandora Tekstê* ye.

Di mijara şirovekirinê, an ku şirovekirina tekstê de, Nord pêwîsteka hevtayiyê wiha formule dike: Divê şiroveya wergêr her wekî niyeta şander/nivîskar be (1997: 89). Lê Nord vê pêwîstekê li gor wergereke xwedî armanc wiha formule dike: Wergêr tekstê ne tenê li dor niyeta şander/nivîskar şirove dike, lê belê ew lihevhatina tekstê ya bi rewşa zimanê armanc jî li ber çav digire (92). Ji vê formulekirina nû jî xuya dibe ku ranêzikiya Nord ji nêrîna wê ya edebî ya armanc-navend dariştiye. Nord hevtayiya ji hêla Fonksiyona Tekstê wiha formule dike: Divê wergêr niyeta nivîskar wisa bîne ziman ku teksta armanc bikare di çanda armanc de heman fonksiyonê pêk bîne ku teksta jêder di çanda jêder de kariye pêk bîne (1997: 90). Nord diwariya pêkanîna heman fonksiyonê destnîşan dike û vê pêwîstekê jî wekî: ‘Divê teksta armanc bi awayekî wisa saz bibe ku fonksiyonên wê yên di rewşa armanc de li niyeta nivîskar bigunce’ (92) formule dike. Vêca

wergêr ê biryarê bide bê ka kîjan fonksiyonên teksta jêder li gor niyeta nivîskar di teksta armanc de temsîl bike.

3. Dahûrandina Wergera Heft Haîkûyan

Cureya Edebî: Helbest / Haîkû

Nivîskar/Helbestvan: Jack Kerouac (1922-1969)

Wergêr: Sidîq Gorîcan

Teksta Jêder: Jack Kerouac Collected Haikus (1961)
(<http://terebess.hu/english/haiku/Kerouac-Haikus.pdf>).

Teksta Armanc: Kovara LEWenger, Hejmar 6, 2024. r. 22.

Teksta Jêder	Teksta Armanc
Haiku 1 A raindrop from the roof Fell in my beer	Haîkû 1 tipikeke şiliyê ji serbanê jorê ket ket nav meya min
Haiku 2 Train on the horizon - my window rattles	Haîkû 2 trên hê li asoyê li pencereya li berê me dibe gurregurr
Haiku 3 The sound of silence is all the instruction You'll get	Haîkû 3 dersa tu distînî ev e ji hemî perweriyên - pêjna bêdengiyê
Haiku 4 Dusk - boy smashing dandelions With a stick	Haîkû 4 şevê da ser lawko pifok berba kirin bi çovê xwe
Haiku 5 Snap you finger stop the world! - Rain falls harder	Haîkû 5 şirqînê li tilî xe dinyayê çik rawestîne - baran gurrtir tê
Haiku 6 Glow worm sleeping on this flower, Your light's on!	Haîkû 6 li ser kulîlkekê va ketiye xewê gûstêrik - min tu find navê
Haiku 7 No telegram today - Only more Leaves fell	Haîkû 7 telgrafek ji tune - ya îro li me heyî pel pirtir diwerin

3.1. Analîza Hokarên Dermetnî û Navmetnî

3.1.1. Analîza Hokarên Dermetnî

Şander: Nivîskarê Amerîkî Jack Kerouac (1922-1969) wekî nivîskarekî pirhêl di gelek cureyên edebî de berhem dane, bi taybetî jî bi romana xwe ya navdar *On the Road* li seranserê cîhanê bûye yekî navdar. Li gor agahiyên ku Theado (2000) derbarê jiyana û nivîskariya Kerouac de dide, nivîskar kesayetekî giring ê jî nifşa Beat e di wêjeya Amerîkî de. Wî romanên xwe ji çîrokên rast ên jiyana xwe saz kirine. Kerouac pêşengekî haîkûya Amerîkî ye û bi rêya haîkûyan hezkirina wî bi Bûdîzma Zen û ramanên mîstîk çê bûye. Di haîkûyên wî de jî şopên jiyana wî berbiçav in.

Niyeta Şander: Haîkûnûs hestên xwe û bertekên xwe yên demkî yên derbarê jiyana û bi taybetî yên derbarê siruştê di risteyên kurt ên haîkûyan de didin kifşê. Di haîkûyan de herî zêde hestên wekî xemgînî, şadî, ecibandî, heyîrîn, şaşmatîbûn tîn dîtin. Niyeta haîkûnûsan bi fikr û hîsiyata wan a li hember mijar û naveroka haîkûyê kifşe dibe û ew fikr û hîsiyat jî di encama çavdêriyekê de çê dibe. Rewşa derûnî ya haîkûnûsê çavdêr û bandora bûyer an jî rewşa ku ew çavdêriya wê dike, dibin faktorên avaker ên niyetê û bi peyv û gotinên parzûnkirî haîkûyek saz dibe. Theado (2000: 9) derbarê Kerouac de dibêje ku nivîskariya wî piranî otobîyografîk e. Wî hewl daye ku jiyana xwe bike bingeha hunera xwe, lewre jî rasterast ji tecribeyên xwe yên jiyana berhemên xwe afirandine. Hûrgiliyên jiyana Kerouac ên dema ku ew wan haîkûyan dinivîse rasterast bi niyeta nivîskar re têkildar e. Di her haîkûyê de fikr û hîsiyateke berbiçav heye ku wekî niyeta şander/helbestvan derpêş dibe.

Wergir: Wergir, an ku xwînerên haîkûyên jêder, ji dema çapbûna berhemê ya salên 1960an heya roja îro xwînerên edebiyata Îngilîzî ne. Ji ber ku xwînerên ku bi Îngilîzî dixwînin xwedî paşxaneyên çandê yên cihê ne, hêvî û bendewariyên wan ên ji haîkûyên Kerouac jî dê cihêreng bin. Dîsa jî, xwînerên ku li salên Kerouac ew haîkû nivîsîne û xwînerên ku xwedî bendewariyên hevpar in wekî xwînerên armanc divê bîn qebûlkirin. Wergirên haîkûyên armanc jî xwînerên Kurd in ku piştî çapbûna pirtûka werger derfeta xwendina wan haîkûyan bi dest xistine. Ji bo xwînerên Kurd haîkû dê wekî cure biyanî xuya bike, lê belê çend helbestvanên Kurd ên ku haîkû nivîsîne û sêxişteyên Kurdî dê li ba xwîner bendewariyekê nasraw çê bikin derbarê wan haîkûyên werger de.

Navgîn/kanal: Navgîna sereke ya teksta jêder û teksta armanc nivîs e, lewre her du tekst wekî pirtûk hatine çapkirin û di nav demê re bi vî kanalê gihîştine xwînerên xwe. Jack Kerouac hin haîkûyên xwe ji bo xwînerên xwe xwendine û dengê wî li ser platformên dijîtal ên wekî youtubeê berdest e, lê belê rewşeke wiha jî bo haîkûyên wergerandî nîn e.

Ûzin Beg mîrê yaylê ye, sê jinên wî hene, zarên wî çênabin, diçe jina çarem jî tîne. Mal û milkê wî pir e, destê xwe li ber Rebbê alemê vedike, dia dike. Xwedê neh meh, neh saet, neh deqîqe şûnda lawekî didê. Ûzin Beg hemî eşîrê kom dike, bîst û çar beranan serjê dike, ziyafetê dide û jî eşîrê ra dibêje navekî li lawê min bikin. Nav lê dikin Mihemed Emîn (te lawê bi tenê). Zeman derbas dibe, Mihemed Emîn dibe şeş heft salî, bavê kal wî dişîne mektebê. Wextê Mihemed Emîn dibe çardeh pazdeh salî bavê wî diçe jê ra dibêje ez dixwazim te bizewicînim. Mihemed Emîn ji ber ku hêj sî û sê kitêbên mektebê xitim nekiriye dibêje ez naxwazim bizewicim lê nikare emrê bavê xwe jî paşda vegeşîne. Hema li Rihil Bozê siwar dibe û sê roj û sê şevan diçe. Rêya xwe winda dike, di rê da li kalekî rast tê, kal berê hespê wî vedigerîne rê. Ji Mihemed Emîn ra dibêje ez qelawîzê felekê Ezraîl mîrê mewtê me. Wê çaxê Mihemed Emîn jê dipirse: çiqas emrê min maye. Ezraîl (kal) jê ra dibêje şeva gerdekê tu yê rihê xwe bidî. Lê bê çare Mihemed Emîn emrê bavê xwe qebûl dike. Ûzin Beg tevî pênsid siwarî diçe mala begê tirkan Mirseloxlu, Eyne Zelîxaya begê tirka ji lawê xwe ra dixwaze û tîne. Şeva erdekê Mihemed Emîn dimire, Ûzin Beg vê keçikê dide destê çend mêran, dibêje bibin bikujin, kirasê wê yê bixwîn ji min ra bînin. Eyne Zelxê dibin datînin çolê vedigerin. Neh mehên Eyn Zelxeyê diqedin lawekî wê dibe, nav lê dike Mecnûn. Heft salan li çolê dimîne, rojekê diçe gundekî, li wir tevî lawê xwe dibe şivanê mixêr. Şevê Mecnûn di xewna xwe da qîza Şêxê Zirkan Leylayê dibîne, ji ber eşq û mihbeta wê bi çolan dikeve, heft salan digere. Rojekê tê ser kaniya Rasûl'eynê, Leylayê dibîne, herdu aşîq digihên hevdu. Mecnûn serê xwe dide ser çokên Leylayê dikeve xewê, Leyla mecbûrî vedigere malê. Wextê digihe malê dibîne ku kon bar kirine diçin. Dike nake diya wê destûrê nadê ku vegere ser kaniyê (Jindires, 2022).

Vegêrana Hemgulî li vir bi dawî dibe, lê wextê em varyantên din ên Mihemed Emîn dixwînin (bo varyantên nivîskî bnr. Celîl û Celîl, 2016b: 392-415) û guhdarî dikin fam dikin ku herdu aşîq di encamê da dîmirin, dibin du stêrkên li esmên ku ev jî dirûvê efsaneyê dide destanê.

Encam

Mecîdê Hemgulî yek ji dengbêjên xwenda yê herêma Efrînê ye ku di peywenda hoste-şagirt da gihaye. Ewil li cem xalê xwe Elo û Mûrad li şevbuhêrkan, peyra li dawet û şahiyên hînî stran û destanan bûye. Paşê, guhdarî dengbêjên herêmê yên wek Hemûş Kûrik, Evdê Şerê, Hesên Nazî, Îbrahîmê Tirko, Cemîlê Evdê Kerrê dike û kilamên wan radike. Dikare bê gotin ku çiraxê Hesên Nazî ye ku piraniya destanên ku vedigêre sermiyanê wî ne. Hemgulî çawa ku li cem dengbêjên hoste yên serdema xwe hînî kilaman dibe wisa jî ji dengbêjên hevçax ra dibe hoste û li wan tesîr dike. Li ser Eliyê Kapê, Cemîl Horo, Elî Tico û Bavê Selah tesîra wî çêdibe.

Mekanên îcrayê yên serdemê şevbuhêrk, dawet, şahî û qehwexane ne. Wê demê teknoloji wekî îro li kar nîne. Di navbera salên 1985-1990î da xwarzê Hemgulî Loqman Xerza kilamên Hemgulî qeyd dike lê ev arşîv winda ye. Di navbera sala 1990 û sala 2002yê da li Şerqil Ewsed cihê qeydkirina kilaman ya Omer Fewzî hewl didin hemî berhemên dengbêj qeyd bikin. Fewzî qasî 30

şirîdî qeyd dike ku ev berhem bi saya teknolojiyê hatine parastin û îrroj derfeta bernivîsandinê dide me.

Hemgulî yek ji wan dengbêjan e ku riz xwariye. Lewra peyvên kilamên wî wek hebên rizê li dû hevdu rêz dibin. Zimanê wî zelal û fambar e, di berhemên wî da şopên devoka herêma Efrînê û peyvên erebî-tirkî tîn dîtin. Li gorî çavkaniyan, dengê wî dengêkî bi hêz û dewamdar e ku dikare bi saetan bistrê. Lewma kasetên wî yên ku sê saet û nîv, çar saet û nîv dikşînin hene. Wextê kilamên wî tîn guhdarkirin jî hêza dengê wî tê hîskirin. Li gorî rûdana bûyerê deng bilind dibe, dikeve, zîz û qalind dibe. Di hevpeyvînan da tembûrvan Wehîd Xelîl (2024) jî ji bo dengê wî dibêje, dengêk wisa li ser e ku wextê distra “esmên û dengiz dihezand”. Taybetiyeke din a Hemgulî ew e ku digel tembûrvanekî berhemên xwe îcra dike. Ewil Elê Kapê jê ra li tembûrê dide peyra jî digel tembûrvan Wehîd Xelîl distrê.

Repertuara Hemgulî piranî ji destanên wekî Dewrêşê Evdî, Ês û Ezîz, Memê Alan, Cembelî, Arzi û Qember, Mihemed Emîn, Êsibê Şer, Eysa Êbê, Ezîzê Tek Mistefa, Salihê Naso, Melek Can/ Naz û Edla Emer Begê pêk tê ku li cografyayeke berfireh tîn vegêran. Herwiha, stranên kurt ên weke Zeynebê, Meyremê, Heycan û Xwarzi Mihemed jî vegêraye.

Çavkanî

- Adak, A. (2018). “Analîzeke Kodîkolojîk li ser Leyla û Mecnûnên Sewadî, Bazîdî û Fuzûlî di Koleksiyona A. Jaba ya Destnivîsên Kurdî de”. *Şarkiyat*. 10/3 (Ağustos) 1197-1222. <https://doi.org/10.26791/sarkiat.443978>
- Alptekin, B. (2021). *Halk Hikayelerinin Motif Yapısı*. 11. Baskı. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Atlı, H. (2024). “Destanên Kurdî ji Alîyê Taybetmendîyên Dirûvî ve”. *Şarkiyat* 16/1 (Haziran). r. 488-501. <https://doi.org/10.26791/sarkiat.1437047>
- Celîl, O., û Celîl, C. (2016a). *Zargotina Kurda: Êpîk û Dastan 1*. Vienna: Înstîtûta Kurdzanîyê - Wien.
- Celîl, O., û Celîl, C. (2016b). *Zargotina Kurda: Êpîk û Dastan 2*. Vienna: Înstîtûta Kurdzanîyê - Wien.
- Celîl, O., û Celîl, C. (2016c). *Zargotina Kurda: Êpîk û Dastan 3*. Vienna: Înstîtûta Kurdzanîyê - Wien.
- Celîl, O., û Celîl, C. (2023). *Kela Dimdimê: Xanê Lepzêrîn*. Stenbol: Weşanên Wardoz.
- Çobanoğlu, Ö. (2023). *Türk Dünyası Epik Destan Geleneği*, Ankara: Akçağ Yayınları.
- Dezgehê Sema Kurd (2012). *Geştek di Bîrweriya Çiyayê Kurmênc de*. Sûriye: Weşanxana El-Zeman.
- Hatun Sürücü, S. (2024). “Di Navbera Nerît û Teknolojiyê da: Jiyan û Hunera *Kilamcî* Elî Dore.” *Kurdiname* (11), 75-95. <https://doi.org/10.55106/kurdiname.1536260>

- Hemkoçer, M. C. (2013). *Bêrîvana Cindî: Çend Destan û Serhatiyên devera Efrînê (Rojavayê Kurdistanê)*. Silêmanî: Enstituya Kelepûrê Kurdî.
- Kaplan, Y. (2019). *Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn*. İstanbul: Nûbihar.
- Kurt, Ş. (2023). “Evînek û Du Mesnewî: Danberheveke Naverokî ya Leyla û Mecnûna Sewadî û Leylâ wû Mecnûna Fuzûlî.” *Mukaddime*. 14(1), 177-194. <https://doi.org/10.19059/mukaddime.1241516>
- Le Coq, v. A. (1903). *Kurdische Texte: Kurmangi-Erzählungen und Lieder*. Berlin: Zweiter Teil.
- Sträuli, B. (2017) - *Dewrêşê Evdî - Dewresh, Son of Evdi A Kurmanji Epic as Performed by the Berazi Singer Baqî Xido*. Wiesbaden: Harrassowitz Verlag.
- Sträuli, B. (2021) “*Our Steppe is Vast ...*”: *Kurdish Epics and Tribal Stories from Urfa, 1906 Collected by Oskar Mann*. Wiesbaden: Harrassowitz Verlag.
- Subaşî, K. (2024). “Ji Mîtojojîyê ber bi Tarîxê û ji Lehengîyê ber bi Evînê Destan Weku Çemkeke Sîwan di Vegêrana Gelî da”. *Şarkiyat*. 16/1 (Haziran), 104-116. <https://doi.org/10.26791/sarkiat.1425264>
- Vali, S. (2021). *Şahnameya Kurdî: Rustemê Zal û Heft Xana Wî*. İstanbul: Avesta.
- Yaş, Z. (2015a). *Şakarên Muzîka Kurdî 1*. Amed: Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin.
- Yaş, Z. (2015b). *Şakarên Muzîka Kurdî 2*. Amed: Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin.
- Yaş, Z. (2016). Elî Tico. *Folklorê Kurda*. Jimar: 7.

Çavkaniyên Online

- Luqman Xerza. (2022, February 5). *تاس درك عم يل كهم ح دي جم نان فلأ* [Video]. YouTube. https://www.youtube.com/watch?v=XHcJ9_MaxC4
- Jindires. (2022, January 6). *نۆن جم لیل نیم دم جم* Mehmed Emîn: Mecîd Hemgulî [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=M3FKnciioe0>

Hevpeyvîn

- Xerza, A. (2024a, Îlon). Pêwendiya Şexsî ji aliyê Sevim Hatun Sürücü.
- Xerza, L. (2024b, Îlon). Pêwendiya Şexsî ji aliyê Sevim Hatun Sürücü.
- Xelîl, W. (2024, Îlon). Pêwendiya Şexsî ji aliyê Sevim Hatun Sürücü.
- Reşîd, M. (2024, Îlon). Pêwendiya Şexsî ji aliyê Sevim Hatun Sürücü.
- Hesen, A. (2024, Îlon). Pêwendiya Şexsî ji aliyê Sevim Hatun Sürücü.

PÊVEK

Mecîdê Hemgulî - Mihemed Emîn (Leyla û Mecnûn)

(tembûr)

Merheba gelî guhdaran, em dîsa rûniştine mala birayê me Wehîd Xelîl bavê Xelîl, tembûrciyê zemên. Tembûrciyê eslî eslî mayî nikna¹⁰ çiyayê me kurmanc da Wehîd Xelîl e. O pir dengbêja û tembûrvaniya pê ‘ihtîraf¹¹ kir. Wek Cemîl Horo, wek ‘El Tico, wek Hesenê Nazî o ê tembûrcî jî wekê Adîkê bavê Hênan ji Kora, wekê Beytêz wek Seîd ko giya jê ra ‘îtiraf kir ku rast didê tembûrê. O li ser cîhaza jî lawê ‘Omer Fewzî biçûk Istaz Ferhad mihendizê ser cîhaza, ew nokna wî jî xwew li xwe herimandî wek me xizmet miletê kurd dikê. O êk ji we ra bibêjî hewalde tarîxê kurd ê ji zemanê berê ji bav û kala da mane hundabûne artiq. Lê em ê ji we ra nikna aşlekin¹², ‘ecerlemîşkin¹³ bila milet pê bi’elimê¹⁴ bila winda nebê. Bavê Ednan Mecîd ji Tilifê, em ê niha ji we ra bibên kilama Mihemed Emîn telayê bi tenê.

(tembûr)

nema dilî min dibêêê
nema dilî min dilewa dil dibêêê
dalga dilî min radibe vê êvarê
li fena pêla behrê tîra dengizê¹⁵
di ser hevra diqulibê dere û tê û danêêê
Xwedê dînê dînenê mala Êzin Beg mîrê yaylêêê
erê erê Êzin Beg sê jina tîne Xwedê ti zûret û ewlada nadiyêêê
tîne jina çarê dîsa Xwedê ti zireta nadiyêêê
erê erê sibak ji sibê îniyê a meqbûle li ba Rebbî ‘alemê
Êzin Begê bi dest xwe kirî misînê avê avdast dikê û tehret dibê
gere berî xwe diftlîne Beytul mukere malê Xwedê
çar ri’kat limê dikê destê xwe vedigre li ber Wahidil Qehar yekê bi tenê
dibê elaaa ma’lûme malê min pire li dinyê
Xwedêyo tu bi me de ziretikî ewlada nêrlî î xêrlî î çê
erê malî min pire bila nebe yaxme û talanî xelkêêê
gere biranoo dem û dewrano digere be’dilê¹⁶ diqulubêêê
wextanî nehe mehe nehe roj tamam dibe
dîsa sibakê ji sibê îne Êzin Beg bi dest xwe kirî misînê avê
carikê balê xwe didiyêêê
gerê şewq û şemedanikê daye hêlê heramiyê
bi dengêkî ban dike li helaliya xwe ya mezin Elîvistanê

dibê lê lê helalê nema dilê min dilewa dil dibê

10 nikna/nokna/nakna (nûke): niha, aniha. Dema niha.

11 ‘ihtîraf kir: erê kir, qebûl kir, li xwe mikûr hat.

12 aşle kirin: nûkirinek pêşketî (pêşxistin).

13 ‘ecerlemîşkin: ecer nû, ecerlemîşkirin yanî nûkirin (li herêma Efrînê tê bikaranîn).

14 bi’elimê: fêrbûn, hînbûn.

15 dengiz: “deniz” tirkî ye, di kurdancî de “behr” e.

16 be’dilê: peyveke erebî ye, di şûna “pişt ra” da hatiye bikaranîn.

helalê balê xwe didimê tu mûm û şemadanê vêneketine li hêla heramiyê
 tu ro hilnehatî şewq û şemadanê dayî heramiyê
 ew çî roniyê xuyan têêê
 de were mino helala mezin Elîvistanê
 digo lo lo helalî min î vê dinyêêê
 Xwedê kire mirazê te Xwedê bike mirazê cim'î ometêêê
 erê erê Xwedê dayê te ewladikî nêrlî î xêrlî î çê
 artix¹⁷ mal û mewalê te nabê kisib û yaxme û talanê xelkêêê
 de were mino Êzîn Beg mîrê yaylêêê
 radibe ji ser dar û meqamê limê
 dikeve kozê bîst û çar berana vediqetînê
 erê erê dide berî kêrêêê êl û eşîrê teklîf dikê
 qûndaxa beşîgê biçûk radike tîne didîne ortê ortê
 de were mino vê yekêêê
 dibê navikê ji min ra lêkin li vê dinyêêê
 erê dibê navî xwe Mihemed Emîn telayê bitenê
 beytul miskîn Wehîdil Qehar bi tenêêê
 sê guliyê ber dilê Rebbî 'alemê nazliyê ber dilê dê û bavê de lorê
 yawrim¹⁸ yawrim Emînê min yawrim

(tembûr)

54

nema dilê min dilewa dil dibêêê
 kekê wextê be'dîlê diqulibe dere û tê
 gerê malê min danî Êzîn Begêêê
 salê Mihemed Emîn şeş in ketiyê heftê
 jê ra hucra û mektebekê digrê
 erê erê Mihemed Emîn telayê bi tenêêê
 gere kekê dikeve hucrê û mektebê
 erê artix wext û me'dîl û zemanî derbas dibê dere û tê
 salê Mihemed Emîn çarde ne pê kirî panzdê
 erê de were mino Êzîn Beg mîrê yaylêêê
 derê destî xwe didê qapiyê¹⁹ hucrê îçê hucrê da dinêrê
 erê Mihemed Emîn telayê bi tenêêê
 sikiniye li ser darê meqamê limê
 wextanî silavê vedidê li ser piyê rastê diftilê ser piyê çepê
 balê xwe didiyê bavikê kal bi riyê spî destî xwe daye qapiyê hucrêêê
 erê Mihemed Emîn digo lo bavo lo bavooo
 dilê min dibê û dil dibêêê
 xêr e vê sibê tu gunê xwe bi ustiyê mi dixî xêr e tu derbas nabî îçê hucrê
 Xwedê dîne dînenê mala Êzîn Beg mîrê yaylê

17 artix: "artık" peyveke tirkî ye, di şûna peyva "bes, êdî" ya kurmançî da hatiye bikaranîn.

18 yawrim: "yavrum" tirkî ye di şûna "lawê min, keça min" de hatiye bikaranîn.

19 qapî: "kapı" peyveke tirkî ye, di şûna peyva "derî" de hatiye bikaranîn.

digo yawrim yawrim yawrim Emînê min yawrim
dilê min dibê û dil dibêêê
ez kê vê sibê ji te bikim minetikê
eger tu kê minetê bavê kal bigrê kê derbazbim îçê hucre
eger tu nagrê yawrim ku e netêm îçê hucre
digo bavo tima tu zanî ku ez nemînim de bajo derbazbê îçê hucre
bavo ‘emr û dêdigiya te çî ye tu yê bi mi ra bibiyê
go yawrim nema dilê min dilewa dil dibêêê
oxlim eger tu kê minet û ricê bavê bigrêêê
tu kê destî xwe dîne ser qîzikê mêra qîzikê xelkê
yawrim mal û mewalê min pir e li dinêêê
belkî Xwedê ziret û ewlada bi te dê
mal û mewalê me nemîne ne bi ê kisib û talanê xelkêêê oyyy
yawrim Emînê min yawrim

(tembûr)

gerê Emîn diftilê ku ez nemînim li bavê kala vê sibêêê
digo bavo dilî min liyan e dilî min liyaneee
bavo eva dem û dewraneee
bavo bilbil aşiqî darî gulan e
ê lo bavooo ‘emrî min çarde ne pê kirine panzda nee
bavo ku ez nemînim hîn min têrikê xitim nekirî sîh û sê kitabê sîniyane
bavo ji min bigere ne wexta min û eksîk û ‘eyanê jinan e
gerê malê min danî Êzin Begêêê
yawrim dilê min dibê Emînê min dilê min dibêêê
yawrim eger ti minet û ricê bavê nagrêêê
yawrim li wê dinê li axretê terezî mezîn dakeve erdê heft sahebî heqê xwe bistîne
yawrim ku ezê destê xwe di yaqê te kim heqê xwe ji te bistînim li wê dinyêêê ooooy
erê erê Mihemed Emîn çiqasa dibêse çarê nabîne ji bavê kala Êzin Begêêê
erê radibê bi qehir ji ser dar û meqamê limêêê
xwe berdidê yanî tewlê jê bi derdixê Rihil Bozê
nav û tenga dişidîne lingê xwe diavê zengîyê diqulibê li xaniyê zînêêê
bervî xwe diftilne çol û kerbelê diqetîne kefê û yazê dikeve deşta Rihê lêêê

(di vê navberê da ji cimaeta guhdaran yek dibêje: ha ha ha...!)

erê erê de were mino vê heywanêêê
serî sitandiye ji Mihemed Emîn telayê bi tenê
nikanê biftilîne belêkêd berfê pozê yaylê wetanê dê û bavê
erê erê Mihemed Emîn telayê bi tenê
simêlê hûrê şikîne serî lêvê
hûrik hûrik îstêra bi ser rûçikê xwe da berdidê

de were mino li wê daxê²⁰ li wê demê
balê xwe dayê kalik li pêşiyê çow bi dest da sekinye li pêşiyê
wextanî derbasbûna heywanêê
gerê kal digre bi serî Rihil Bozê jê ra diskinîne
gere dibê Emînê min yawrim lo yawrim
Emînê min yawrim yawrim telayê bi tenê
yawrim te xêr e simêle te hûr e şikîne serê lêvêêê
xêr e tu hûrik hûrik êstira bi ser xwe da berdidê
erê Mihemed Emîn fitilî li kalêê
go apo nema dilî min dibê û dil dibêêê
îro sê ro û sê şev in mi qetandî kepê û yazê ketime deşta Rihê lêêê
apo vê çol vê ketê serî ji min istandî e nikanim biftilîm wetanî dê û bavê belêkêd berfê
de wê çaxê kal jê ra serî diftilîne dibê oxir be Emînê min yawrim ji te ra oxir beee
erê wextanî Mihemed Emîn telayê bi tenêêê
bi atimê qûrşinikî jê bi dûr dikevê
dibê wey malê min nekeve nakina min bervî xwe fitiland wetanî dê û bavê
ma xelk bi min ra nebê kê ji te ra fitilan serî vê (...)²¹
ser ji nû ve Mihemed Emîn diftilê ser kalêêê
dibê apo nema dilê min dibê û dil dibê
apo serî min bi qurbano te serî ji min ra fitiland belekêd berfê wetanî dê û bavê
xelk kê ji min pirs ke ê nebê kê ji te ra fitiland serî vê heywanê
apo Xwedê kê vê sibê tê î navî xweyî bimbarek ji min ra heval dêêê

gere digo Emînê min yawriim
yawrim nema dilê min dibê û dil dibê
ma tu kê vê sibê pêçkê bi navî min ê bimbarek li dinyêêê
heger ti li navê min dipirsê bi min ra dibêne qelawîzê felekê Ezraîl mêrê mewtê
yawrim ku e digirim li çar etrafê dinyê
bi emrê Rebbî ‘alemê ku ez rihê canik û camêra qebûl dikim vê sibê oooy oooy
erê digo apo ma’dem kî bi te ra dibêne Ezraîl mêrê mewtêêê
apo nakina ti zanî çiqasa ‘omrê min jî mayê li dinyêêê
gere were mino kalê digo yawrim Mihemed Emînê min yawrim yawrim yawrim
yawrim nema dilê min dibêêê
yawrim eger tu nezewicî felek bi te ra biraye hetanî diyarê diyarê qiyametê
yawrim eger ti bizewicîm
li şeva bi tenê şeva êrdekê li pêşî koz û perdê li ser doşekê pirsê
yawrim e te nagînim ti bext û miraza li dinyê
ku ezê peyabim li ser singî te wa ezê emanetî xwe bibim bi emrî Xwedê
de lorê de lorê Emînê min de lorê oyyy

(tembûr)

20 li wê daxê: li demê, wê çaxê. (Li Efrînê dax di şûna wê rojê wê demê da tê bikaranîn).

21 du peyv nehatin fêmkirin

gerê nema dilê min dibêêê
Mihemed Emîn telayê bi tenêêê
wextanî şorê vê ra dikêêê
bervî xwe diftilîne belekêd berfê wetanî dê û bavêêê
gere dîsaaa bi dest xwe dike misînê avdasêêê
ketî îçê hucre dîsa dike çar ri'ket nimê li boyî Rebbê 'alemê
erê erê dîsa silavê vedide li ser piyê rastê diftile ser piyê çepê
balê xwe didiyêêê dîsa bavikê kalo destî xwe dane qapiyê hucreêêê
di îçê hucre da dinêêê
gere Mihemed Emîn go lo bavooo lo bavooo
nema dilê min dibê o dil dibêêê
lo bavo tu xêre guniyê xwe bi ustuyê min dixê
tema ti ezîni qey ne aqilî te nagê
erê erê de were mino Êzin Beg mîrê yaylê
digo yawrim Emînê yavriim
Emînê yawrim nema dilê min dibêêê
yawrim ku ez kê bikin ji te minet û ricakê
gere yawrim eger tu kê bigrî minet ricê bavê
ez kê derbazbim îçê hucreêêê
eger ti minetê min nagrêêê
yawrim li heşer û mehşerê royê qiyametêêê
heq sahibî heqê xwe bistîne yawrim
destê min di yaqê te da ye li wê dinê
erê nema dilê min dilewa dil dibêêê
de were mino Emîn telayê bi tenê
dibê bavooo tema mera bişkîne şorê atê
li wê ji mera ra cihenim yazmîş dibê
ê lo baba were ji min bigere ji min û vê yekêêê
bavo dilê min leyane sê carî leyaneee
bavo dilê min leyane leyane
erê erê salê min çardene pê kirine panzdaneee
lo bavo ne wexta min û eskîk û eyanê jinan e oyyy
erê erê çiqasa Mihemed Emîn dibêse çarê nabîne li bavê kal Êzin Begê
dibê bavo de here tu zanîî
bila bi emr û dêdigiya te be
mîrin ne carkê dibê li dinyayê
bavo bila ez herim bimrim serî xwe dînim diyarê rehmetêêê
de lorê de lorê ooo yyy

(tembûr)

nema dilê min dilewa dil dibêêê
Mihemed Emîn telayê bi tenêêê

digo bavo nema dilê min dilewa dil dibêêê
tema mi qetandibû kefê û yazê ketibûn deşta Rihê lê
erê bavooo min bi çavên xwe dî Ezraîl mêrê kulêêê
bi mi ra go yawrim eger ti nezewicêêê
felekê yaman bi te ra biraye heta bedîl û bedîl û diyarê axretê
yawrim eger tu bizewicêêê
şeva erdekê şeva bi tenê li ser heft doşekê pirsêêê
ezê li ser singî te rûnim yawrim ku ez emanetî xwe ji te bistînim bi emrê Xwedê
bavo dîsa tu zanî bavo tu zanîî
erê heger mera emrî bavikê xwe bişkîne li vê dinyê
li wê dinyê cihenim ji me ra yazmîş dibêê
erê bavo ne mirin carekê dibêêê
de here emrê te çîye bila bi emr û dêdigiya te bê oyyy
yawrim yawrim Emînê yawrim yawrim oyyy

(tembûr)

erê nema dilê min dilewa dil dibêêê
wexta Mihemed Emîn te layê bi tenê
vê şorê bi Êzin Beg mîrê yaylê ra dikê
erê Xwedê dînê dînenê mala Êzin Beg mîrê yaylê
radikê pênsid siyarî fîstanê kinî li kabê şûrê qutî li navê
erê radikêêê xwe berdide çewligê deşta Hemqê²²
xwe bi ser Murseloxlu begî tirka da berdidê
sê ro û sê şeva rûdinê li periyê odêêê
erê erê nanî pir e nî'metî dere û têêê
qehwe pir e xelas nebê
erê royê çarê Êzin Beg mîrê yaylê
go law begî tirkano
nema dilî min dilewa dil dibê
îro sê rone ketin roja çarêêê
ku em rûniştine li periyê odêêê
nanî te pir e xilas nabe dere û têêê
gere ne nanî te xilas dibê ne jî 'ûrê me pê didirê
tu qe nabê low low Êzin Begê mîrê yaylawo
tu li çi digerî ji ku da derî û ku da têtîî
erê nema dilê min dilewa dil dibê
de were mino bego tirka Murseloxlu vê sibê
go low low mîrê yaylawo
eyba reş e fediya giran e li dinyêêê
e kê çow bi te ra bibêm ti ji ku da tê yo ku da derê
gerê go low low begî tirkaow
nema dilê min dilewa dil dibêêê

22 Hemq:Deşta Amîk (Amîk Ovasî).

ku ezî hatime di ser te da rûniştîme li periyê odêê
seb xatirê eksîk û ‘eyanîk jina li dinêê oyyy de lorê de lorêê

(tembûr)

gerê nema dilê min dilewa dil dibêê
wexta Êzin Beg vê şorê bi begî tirka ra dikêê
begî tirka lo mîrê yaylaow tu yê bi mi dî firsendê saetikêê
hetanî derbas dibim hêlê heramiyêê
erê erêê de were mino begî tirka Mirseloxlû vê sibêê
dikeve hêlê heramiyêê
dibê yawriim yawrim ‘Eyne Zelîxa mi yawriim
erê yawriim dilê min leyaneee qîza min leyaneee
yawriim Êzin Beg mîrê yaylaneee
îro sê rone ketî mecalê çaraneee
yawrim li periyê odê rûniştîye bi pênsid peya di ser kokimî bavikê te da ne
erê yawriim destî te dixwaze ji Mihemed Emîn telayê bi tenê ra ne
de yawrim bi mi de cewabkê bavikê xwe ra bikî çî beyane
erê de were minooo ‘Eyne Zelxê digo bavooo
lo bavo e nakim lo kalo e nakim e nakim
e nakim bavo xerîba nakiiim
tirbê merî xerîbê li ûc e bavo ez nakiiim
vê yekê bavo ez qebûl nakim
gerê digo yawriim lê qîza min yawrim
dilî min liyane tema ketî mecalê sê ro sê şevane
Êzin Beg mîrê yaylane ranabe ji periyê odê heta nebe sozikê giraneee
gere digo bavo dilî min tuneee
bavo dilê min tune sê carî tuneee
bavo êl û eşîra bavikê min eşîrekê pir mezin eee
herhal parîk nan tê da heye lîyaqî devê min e
e nakim bavo ez xerîba nakim ez nakim
erê erê go bavo dilî min dibêê
de rabe here bisekine li hizûra mîrê yaylêê
gerê tê qelengê mi lê dagrê dagrêê
gerê bila ji ber serî mi birevêê oyyy yawrim yawrim

(tembûr)

erê nema dilê min dibêê
wextanî ‘Eyne Zelxê bi bavikê ra go
here bavo tu yê barî min lê dagrê
bila ji pişt min birevêê
de were mino begê tirka radibêê
tê diskine li hizûra Êzin Beg mîrê yaylê mîrê yaylêê

dibê bego nema dilî min dibêêê
emrî te yê biqedeêê welakîn welakîn
tu yê bi mi dêêê pênsid siyarî fistanî kinî li navê şûrî qutî li kabê²³
erê erê tu yê bi mi de pênsid hêştir û cûdk ez nemînim barî xwe yek bê
tu pê ra tu yê bi mide pênc hezar mîyê qemer li kelê biharê li serê helbêêê²⁴
erê erê de were mino Êzin Beg mîrê yaylêêê
lo go begê tirka lo tu kê bi piranî pera mi ji pêş xelkê kîbar birevîniî
ezê bi te dim pênsid siyarî ku ez nemînim fistanî kinî li navê şûrî qutî li kabêêê
ezê bi te dim dîsa pênsid mîyê qemer li kelê biharê li serê helbêêê
ezê bi te dim pênc hezar hêştir û cûdan tevda barê wana li ser bê
welakîn belkî ti yî time' bî ti qinyatê xwe pê nekêêê
ezê ji vir da bi tedim heta binyana Besr û Bexdadêêê
li serî te têkim seredê û dapûyêêê
de lorê de lorêêê de lorê delorê de lorêêêy
ê de kekê rê nema li pêşiya Mirseloxlî begê tirka vê sibê
go bibirin xelkî min î kîbar bibirin qelengî²⁵ xelkî min î kîbar bibirin
erê dibirin qelengê xelkê kîbar li vê sibêêê
xelkî kîbar siyar dike tod dike ma'fê bervî xwe diftile pozê yaylayo çiyêêê
erê erê didê pêşîd koz û perdêêê
were mino Mihemed Emîn telayê bi tenêêê
şeva êrdekê şeva bi tenê şeva bext û miraza li dinyêêê
wextanî dikevê pêşîd di koz û perdê cem xelkî minî kîbar ser heft doşekê pirsêêê
erê erê wê çaxê balê xwe didiyêêê
dibê pêşî girtîye Ezraîl mêrê mewtê qasidê felekêêê
gere peya dibe li ser sîngê Mihemed Emîn telayê bi tenê
emanetê xwe jê distîne bi emrê Rebbî 'alemêêê
de werin birano mino vê yekêêê oyyy oyyy oyyy
erê xeber didinê Êzin Beg mîrê yaylêêê
xerabê malê Êzin Beg mîrê yaylêêê
hatê girtê bi qirtikê vê êksîgêêê
go lawê min sax bû min şande cem te
te çi anî serî min lawî min vê şevê
ji berê da dilî te tinebû li lawî min ra li dinyê
bi zorê pera min ti girtî anî hatî vê derêêê
de hewal de de hewal de te çi anî serî Mihemed Emîn telayê bi tenêêê oyyy
de lorê lorê Emînê de lorê lorêêê

(tembûr)

(li vir Hemgulî bi dengekê bilind dibêje: bijî bijî bavê Wehîd bijî, bavê Xelîl!)

Ê birano wexta ku Mihemed Emîn serê danî diyarê rehmetê axa gornê bi emrê Rebbî 'alemê.

23 li vir dengbêj xwe şaş dike.

24 helb: ji bo wexta şîrdadana heywan tê bikaranîn (bêri-helabe).

25 qeleng: qelen, mehr.

Were mîrê yaylê Úzin Begê hat bi qirtikê vê êksîgê girt. Go mi lawê xwe kir cem te xweş bû, tişkî xwe tinebû. Te i bi serî kir? Apo, wele tişt nekir bîle min tişt nekir. Mi çi pê kir? Ê kê xêr e bikujim? Ê go berê dilî te tinebû ti bikî, go herhal bi zorê pera mi ti anî hatî te îşek anî serî. Apo welehî go mi tiştêk pê nekir, wekî din Rebbî ‘alemê emrê xwe tamam bû ‘umrê xwe tamam bû, Xwedê bir. Go na te bi serê lawê mi kir. Anî hat, zor peya wesandin, dan destê wan zorê peya, go hûnê bibin herin çiyê bikujin kirasê gêndî²⁶ di xwûnê da kin ji min ra bînin werin. De were mino va peyana va êksîka dan nav xwe birin çûn kekê şeva li nîvê şevê li nav çiyê kûrê kûrê cin û cinewirê çolê. Yawrim go em kê vê êksîgê xêre bikujin ma bi me çi kiriye? Go va êksîgê çi kiriye? Go wî Mihemed Emîn kuşt, go Mihemed Emîn berê go mi xwewnê da dî ye, go min Ezraîll mêrê mewtê dîye. Go e bizewicim e kê bimrim. Go were emê berdîn. Em berdîn, berdan. Kirasê gêndî jî anîn hatin destmal bû kiras bû anî hatin. Heywanek bi rê va kuştin, bi xwîna gêndî dan anîn hatin.

De bila ewana werin em biftilin ser ‘Eyne Zelxê. De şev li nîvê şevê kûrê kûrê cin û cinewirê çolê li dorê tê. Eva êksîgê kê ku da here. Hildikşe ser darekê heta sibe lê vetê. Sibe lê vehat efendime soleyim, gerî li nav çiyê berqefîk²⁷ dî. Dikeve wê berqefê artix. De heywan, xezal di derdikevin çêrê ev jî pê ra derdikevê çêrê. Heywan çi dixwun ew jî wê ra dixwê. De wexta nehe mehe, neh saet, neh deqîqe qediyar Rebbê ‘alemê dayê ewladik. Ya îlah ya Rebbî go vî ewladî e kê çi nav lê bikim. Go yawrim ma’dem ku tu yê li vê çol û kerbelê li va derbendêd asê di nav çiyê da di kûr kûrê cin û cinewirê çolê bila navê te jî Mecnûn be. Ê de birano, heft sala ev êksîga li wê derê ma, di nav çiyê da. Wexta dûr e bi şoran nêzik e, heft sal tamam bûn, vî mehsûmî artix bi çayir û çîmenê çolê ma. Îşte wekî heywana diçêre. Rokê ji royê Rebbî ‘alemê go anê nan. De ‘Eyne Zelxê jî gul xana go heyata xwe mi çirimîş kir²⁸, va mehsûma di nav vî çiyayî da, di nav cin û cinewirê çolê da ê kê bi’elime çi, ê kê çi şorê bike, ê kê çi yaqîşmîşê²⁹ însana bibe eva. Qe e nakevim ber gunê vî jî. Go ezê bibim herim nav milet, nav xelkê, nav ‘alemê. Qe nebe bila bi’elime, bila wekê însana bê, li vê derê wekê cinawira ne. De ‘Eyne Zelxê efendime soleyim, bi desta girt û ket rê. Di vî çiyayî ra di vî çiyayî ra derê. Bala xwe dayê haşa dengê kûçka î tê. Go welehî herhal eva gundek e. Derê derê digihê ber hewşîkê, te’zîye şilfe. Malê malê malê mêrê jinkê derdikevê xwudanê malê! Kî ye ew? Dibê wele ez im. Ez êksîg im. Ê dibê derbas be xuçê, derbas be. Tu çi dixwazî derbas bê. Dibê keko here malê we ra bê bila kevneke kinca ji min ra wîne ez te’zî me. Wele dere hundir mêrik şîr helal e. Divê qîzê êksîgê li ber malê ye dibê ez te’zîme rabe êskîkî jê ra bibe here bila li xwe ke were. De ew jinika êskîkê radike dibe dere efendime soleyim lê dike tîne tê. Xuçê tu ji ku da tê, tu ji ku da derê, tu kî, tu qîza kê yî, filan bêvan? Dibê wele ez êksîgêk xerîbim kesî min tine. E ji xwe ra li pars marsê digirim. De li cem mêrik dimînê, de mêrik qey ne şîva xwe jê ra dikê. Êpey zeman lê dimînê, gund pê dihesê, bala xwe didêye ‘Eyne Zelxê keko çêlkê firinga ye tu qêmîş nabî lê binêrî. Dibê xwegînciyê xwe ji vir û wê da hatin. Mêrik dibê xuçê tu yê kê mêra bikîse xwegînciyê te tîn em te pêdîn. Dibê keko e mêra nakim. Ku min xêr bidiya minê ji mêrê xwe bidiya. Mêr li min heram bin. Sa’etikê

26 gêndî: ji tirkî hatiye hildan. Wek “kendi” ya tirkî ye, li herêma Efrînê berbelav e.

27 berqefîk: cihê binerdê yên sergirtî yên weke şikeft. (Şikeft an cihê sergirtî).

28 (heyata xwe) çirimîş kir: “hayatî çürümek”, ev qalibeke tirkî ye.

29 yaqîşmîş: ev peyv di wateya “şubh” ê de hatiye bikaranîn.

te'mê li wir nabîne. Ji wî gundî dere gundekî din. Dere gundekî din efendime soyleyim li wir jî wiha ye. Ji wî gundî jî derê. Ku da dere xwezgîncî jê nagerin tênê. Încâ gîşt gundekî mezin wekî hezar malî heye. Gîşt gundekî efendime soyleyim. Çû mala mixtêr kîjan e, mala mixtêr kîjan e? Çû mala mixtêr. Go keko ez êksîgeka xerîbim o ev jî lawê min e. Go ez dixwazim ti xirabakê tiştê bi mê dê, e têkevim. O ga û golik naxirê we heye se ezê ji we ra biçêrînim. Ê de mixtar jî dilê xwe pê şewitî, go zîrar tine. Tîne tê efendime soyleyim, xirabakê berqefkê didinê dikevîyê ew lawê xwe va. De ew xêra xwe lê dikê şîvê jêr tîne ew jêra nanîkî tîne ew jê ra tiştê tîne efendime soyleyim ê tê da xwew dikê. De artix bû naxircî, bû nator³⁰. Berê nator hebûn, dexil dipan. Bû nator efendime soyleyim, wext û zeman pê ra derbas bûn. Dibê bi wexta dûr e bi şora nêzik e. 'Umrê Mecnûn bû çardeh sal, ketin panzda. De artix ga û golikê naxirê gunda diçêrîne. 'Eynezelx qêmîş nabe Mecnûn ji xwewê rake sibê. Derê naxirê kom dike tîne tê şûnê bêdera paşê tê radike ji xwewê. Rokê ji royê Rebbî 'alemê rabû ser xwe dêkê çû naxir maxur kom kir anî hat dan ser bêdera, fîtilî hat Mecnûn rakir. Mecnûn rakir go anê te xêr e ji xwew rakirim? Go e ketibûm xwewnik şeva eşq û mihbetik dila de hele bila mecnûn ban dêkê kê eşq û muhbeta dilê xwe çî ye.

(tembûr)

gerê nema dilê min dibê û dil dibêêê
wexta 'Eynezelxê li serî sibê da li berî berbangêêê
erê erê ga golik û naxirê kom dikê li serê bêderêêê
tê radike Mecnûn telayê bi tenê ji xwewêêê
erê mecnûn go lê anê lê anê lê anêêê
erê anê dilê min liyane dilê min liyaneêê
anê çima te e rakirim ji xwewa şêrîn û giran e
anê ku ez ketibûm xwewnik xwe yê şevane
eşq û muhbetik dilane
ê lê anê vê ra dibêne Leyla Leylane oyyy
gere dêkê digo yawriim Mecnûnê min yawrim yawrim
yawrim dilê min liyane dilî min liyaneêê
yawrim e wa ne xwewna şeva ku ez nemînim ne Leyla Leylan ne
yawrim ewa ku ez nemînim şeytanê lanetulanê
yawrim gerê tu nû tîye ciyê mêrane
gerê yawriim yawrim ewa çalixçîkî gezgançîkî navî malane
oxlîm ewa ne Leyla Leylane oyyy
gere Mecnûn digo lê anêêê lê anê lê anêêê
bi tekeve derdekî giranê te bigerînim li ser sî û sê hekîmêd loqmanê
bi canî te yî can nebe şîfa û dermanê
ê lê anêêê lê anêêê çow xwewnê min î şevan e
Lêylê min î Leylanê
eşq û muhbeta min î dilanê
tu dikê îşê şeytanê neletulanê
lê anê tu dikî ku e nû hatime ciyê mêranê

30 nator: beqçî (li herêma Efrînê tê bikaranîn).

tu çow ji min ra dikî çalixçî û gezgançikî navî malane oyyy
lê anêê tu li min helalkî nan û xweyê şîrê bera
te bi mi ra diye li çola û kerbelane
gerê digo yarim lo Emînê min yawrim
Mecnûnê min yawrim yawrim
yawrim ew Leylê Leylane yawrim
Leylê Leylan tu dibê ewa qîza Şêxê Zirkan e
qelengê wê biha ye yawrim bi çêl û çar kîsan e
yawrim tema dêykê te fiqare ye nikane qelengê wê bidê biha ye ne erzan e
gerê yawriim yawrim dawê ji vê sevdê girane
tema dayikê te pîrê xerîb e kesî xwe tine yawrim bêxwedane
min e bavo yawrim min ne an e
o xiltikê min çavê li va derane oyyy de lorê de lorê de lorê lorê
gerê digo lê anêê heger ti dibê qîza Mîrê Zirkan e
qelengê xwe çêl û çar kîsane bihayê ne têda ne
lê anêê e ji te naxwazim ti mêl ti perane
bes ti li min helalkî şîrê bera xwewna şevane
anê te'm û cefayê te mi ra diye li çol û kêrbelane
gere digo yawrim Mecnûnê min yawrim yawrim
dilê min leyane oxil dilê min leyane
ê lo yawriim tema dayikê te sefîl e yawrim qelengê xwe biha ye ne tê dane
tema yawrim tu û dayikê pîr va diçêrînin ga û golikê naxirê gundane
ê yawrim Mecnûnê min dawê ji vê sevdê girane oyyy
gere digo lê anê dilê min leyane leyane
e ji te naxwazim ti mal û ti perane
lê anê bi mi de îzn û rûşqetê ku ez kê bervî xwe biftlînim çol û kêrbelane
ya ezê bibînim xwewnê xwe şevane
ya jî ez jî serî xwe dinîm diyarê rehmetê axa gorna ne
yawrim yawrim Mecnûnê min yawrim

(tembûr)

gerê yawriim lo yawrim lo yawrim lo Mecnûnê min yawrim yawrim
erê dilê mino dil dibêêê
Xwedê dînê dînenê mala 'Eynezexê
erê çiqasa dibêse ti çare nabî ji Mecnûn telayê bi tenêê
erê erêê dibê here Mecnûnê min yawrim yawrim ji te ra oxir be oyyy
gerê yawrim hevalê te be Xizir aleyselem çê siwarê keybê
yawrim tu li kê derê bankê di bangîne te werê
gerê de kekêê Mecnûn telayê bi tenêê
radibe destê û lingê dêykê maç dikêê
xatirê xwe jê dixwazê bervî xwe diftlîne çol û kerbelê
o yawrim de yawrim Mecnûnê min yawrim oyyy

(tembûr)

(Hemgulî dibêje: Saet xweş bavê Xelîl saet xweş!)

Ê birano wexta ku dêkê îzîn dayê, bervê xwe fitiland çol û kerbela. Mecnûn heft sala geriya ri dirêj bûn, dirnax dirêj bûn, kinc lê neman, tî birçî sêfil, zelîl³¹, yoqsirlix³², zehmet. Çow bûye ela ku perîşan bûye. Rokê ji royê Rebbî ‘alemê gîşt ber şet û delavê Cizîrê, ka’niya Rasûl’eynê. Bala xwe dayê yekê ji wê da xwe hol dikê tê ser kaniyê. Yaw go wele wek ya min di xwewnê da diye ev be. Go ezê banê kim, ku ew be zate ew e ku ne ew be zate ewê min azar ke³³ ezê li ciyê xwe bisenim. Hele banê ke em sekin hele kê vê ra bê çi hele (bavê Xelîl).

(tembûr)

gerê Mecnûn digo

lê Leylêêê lê Leylê lê Leylêêê
tu Leyla min î Leylane tu xwewna min î şevane
tu eşq û muhbeta min î dilane
ê lê Leylê eger ti Leyla Leylaneee
eşq û muhbeta dilane Xwedê kê xwe ji min ra bike beyanee
gere ji min ra xeber de delav û gêçîdê we Cizîrê di ku ra ne oyyy

64

gere mino Leyla Leylaneee
bi dengekê bang fikir digo
Mecnûno dilê min leyaneee
serî min bi qurbanooo heft caraneee
ketî mecalê heft salane
çavê min çûne li rêk û yolaxa ne
erê Leylan Leylan tu dibê ez bi xwe me
de bûyrin bûyrin derbas be Mecnûno
delav û geçîdê Rasûl’eynê di tengê te ra ne
heta nikna tê ra derbas bûn deh car meriv
av nadê kabê meriya ne

de were minooo Mecnûn telayê bi tenêêê
xwe lê dixê delav û gêçîdê Rasûl’eynê derê ser kaniya Rasûl’eynê
kekê ew Leyla Leylane hevdu dibînin vê sibêêê
de were Xwedê kê Xwedê hebîne
derdê eşq û muhbetê derdêkî giraneee
gerê rûniştin li ba hevdu dikine ken û henek û mesqeriyane

gerê kekê Mecnûn go lê Leylê lê Leylêêê
Leylê dilê min leyan e leyaneee

31 zelîl: rezîl, bêqîmet, bindest.

32 yoqsirlix: xizani, hêjarî, feqîrî. Ev peyv peyva “yoksulluk” ya tirkî ye.

33 min azar ke: hişyarkirin.

ketî mecalê heft salaneee
e digirim li çol û baniya li deşt û kêrbelaneee
ê lê Leylê mi têr xwew nekîrî xwewa şevane
Xwedê kê kabê xwe dîne serî xwe dinîm ser kabê te
rakim xwewa xwe ya şevaneee oyyy
erê dilê min leyane Leyla Leylaneee
kabê xwe didine erdê serê Mecnûn didine ser kabane
Mecnûn dikeve xwewa şêrîn û xwewa giraneee
gerê kekê ro dagerî gihîşte berî şîvaneee
Leyla Leylane kê here qêmîş nabe serî rake dîne erda çolane

de were mino Leyla Leylaneee
gerê fistanê xwe di bin serî Mecnûn da qut dikê derê malane
dibê we' dî saetekê diduya ku ezê biftilim Mecnûnê xwe dinyalika bi derewane
erê erêê wextanî Leyla Leylan derê
balê xwe didiyêê bavikê xwe yê kalo ku ez nemînim Mîrê Zirkan e
gerê konê gêr kirine
gerê siwar kirine delûl û hêştirane
ê kê bervî xwe biftilînin pozê yaylim û çiyaneee de lorêêê
gerê Leylê digo lê anê lê anêêê
lê anê dilê min leyane leyane
li ser kaniya Rasûl'eynê anê di mi derket 'ewrane
gere anê ku e reviyam gerê dawê fistanê mi jî bire bi xwe ra ne
ê lê anê li ser kaniya Rasûl'eynêêê
mi jî bîr kiriye koma zêrane
bi mi de anêêê firsendekê nîv saetikê diduyane
ku ez herim bînim komê zêrane

ku ez nemînim dêka Leylan Leylanê digo yawrim
lê yawrim lê yawrim dilê min leyaneee
carikê ku ez nemînim malê bar kirine li delûl û hêştiraneee
yawrim wextê ku emê herim pozê yaylane
kê werin etarê gundiyane
ê lê yawrim ku ezê dîsa ji qîzê xwe ra bikirim ku lê nemînim konê zêrane oyyy
de lorê de lorê lorê
(tembûr)



ŞERÊ GAMÊŞVANÊ DI WESÎQEYÊN DÎROKÎ Û KILAMÊN DENGBÊJAN DA

Önder BEYTER

The Battle of Gameshvan in the Historical Documents
and the Songs of the Dengbêjs

Tarihi Vesika ve Dengbêj Kılamlarında Gameşvan Çatışması

Önder BEYTER

ORCID: 0009-0002-4859-3004 | beyter1990@hotmail.com
PhD Student, Institute of Living Languages, Department of Kurdish
Language and Literature, Bingöl University, Türkiye.

Citation/Jêgir/Atf:

Beyter, Ö. (2024). Şerê Gamêşvanê di wesîqeyên dirokî û kila-
mên dengbêjan da. Kurdiyât (10), 67-87. DOI: 10.55118/kurdi-
yat.1555616

Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:

Research Article/Gotara Vekolînê/Araştırma Makalesi

Received/Dema Hatînê/Geliş Tarihi: 24.09.2024

Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 17.11.2024

Publication Date/Dema Weşandinê/Yayın Tarihi: 30.12.2024

Peer-Review/Hekemî/Hakemlik:

Double anonymized-Two External/Cot Nenas-Du ji derve/ Çift Taraflı
Kör Hakemlik-İki hakem

Plagiarism Checks/Kontrola İntihalê/Benzerlik Kontrolü:

This article has been scanned by iThenticate plagiarism website./
Ev gotar di malpera întihalê ya iThenticate ra hatiye derbaskirin./ Bu
makale iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır.

Ethical Statement/Beyana Etik/Etik Beyanı:

It is declared that scientific and ethical principles have been fol-
lowed while carrying out and writing this study and that all the sour-
ces used have been properly cited./ Hatîye beyankirin ku di pêkanîn
û nivîsîna vê xebatê de hemû rêzikên zanistî û etik hatine şopandin
û hemû çavkanî bi awayekî têtûz hatine referanskirin./ Bu çalış-
ma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan
tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.

Conflicts of Interest/Nakokiyên Berjewendiyên/Çıkar Çatışması:

There is no conflict of interest between the author and any parties in
the article./ Di gotarê de li navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya
berjewendiyê tune ye./ Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında
herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.

Grant Support/Alîkariya Darayî/Maddî Destek:

The author acknowledge that they received no external funding in
support of this research./ Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê
vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine./ Yazar, bu çalıştırma-
yı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.

**Copyright & License/Mafê Telifê & Destûr/Telif Hakkı & Lisans-
lama:**

Authors publishing in the journal retain the copyright to their work
licensed under the CC BY-NC 4.0./ Nivîskar li jer lisansa CC BY-NC
4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin./ Dergide yayın yapan
yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif
haklarını saklı tutarlar.

Kurte

Şerê Gamêşvanê yek ji wan bûyerên dîroka Kurdî ye ku di destpêka sedsala 20em da qewimiye û bûye sedema kuştina gelek însanan. Ji ber ku di encama vî şerî da gelek insan hatine kuştin, karbidestên dewletê yên wê hingê bi awayekî cidî li ser meseleyê rawestiyane û xwestine bêtir tedbîr bîn wergerin da ku rêtina xwinê dewam neke. Herweha vê bûyerê rengê xwe daye kilamên dengbêjan jî. Îja di vê gotarê da bi metoda wesfî û berawirdî hewl hatiye dayîn ku li ber roniya wesîqeyên arşîva Osmanî û herweha kilamên dengbêjan ew yek were fêmkirin ka ev şerê ku di sala 1907an da li gundê Gamêşvanê qewimiye, ji ber çî sedemê derketiye û di vê babetê da wesîqeyên dîrokî û kilamên dengbêjan ji hevdu digirin yan na. Di vê çarçoveyê da ev wesîqe û kilam hatine berawirdkirin û analîzkirin. Di encama vê lêkolînê da hatiye tesbîtkirin ku yekane fikar û tatêla peywirdarên dewletê yên di belgeyan da diaxivin, bi tenê pergala qamûyê û îstiqrar e, qet serê xwe pê neêşandine yan jî ji bo wan giring nebûye ka çend kes û ji bo çî hatine kuştin. Lê di kilaman da salixê meydana şerî hatiye dayîn û leheng tevî wesfên xwe hatine nasandin.

Peyvên Sereke: Dengbêj, Kilam, Arşîva Osmanî, Şerê Gamêşvanê, Eşîra Heyderan.

Abstract

The Battle of Gameshvan is one of the events in Kurdish history that occurred at the beginning of the 20th century and caused the death of many people. Since many people lost their lives in this conflict, the state authorities of the time looked into the issue seriously and demanded that more precautions be taken to prevent further bloodshed. Also, this event has given its color to the songs of the dengbêjs. In this article, with the descriptive and comparative method, an attempt has been made to understand the reasons for the conflict that took place in the village of Gameshvan in 1907 in the light of the documents of the Ottoman archives and the songs of the dengbêjs and whether the historical documents and the words of the dengbêjs are different from each other or not. In this context, these documents and songs have been compared and analyzed. The research has shown that the only concern of the government officials speaking in the documents is the security system and stability, and questions such as the cause of the conflict and how many people were killed as a result of the conflict are not important to them. But in the songs, the battlefield is described and the heroes are introduced with their characteristics.

Keywords: Dengbêj, Kilam, Ottoman archives, The Battle of Gameshvan, Haydaran tribe.

Özet

Gameşvan Çatışması, 20. yüzyılın başlarında meydana gelen ve çok sayıda insanın ölümüne yol açan Kürt tarihinin olaylarından birisidir. Bu çatışmada çok sayıda insan hayatını kaybettiğinden, dönemin devlet yetkilileri meseleyi ciddiye almış ve çatışmayı önlemek için daha fazla önlem alınmasını talep etmişlerdir. Ayrıca bu olay, dengbejlerin şarkılarına da yansımıştır. Bu makalede, tasviri ve karşılaştırmalı yöntemle, 1907 yılında Gameşvan köyünde yaşanan çatışmanın nedenleri Osmanlı arşiv belgeleri ve dengbêjlerin şarkıları ışığında anlaşılmasına çalışılmış ve tarihi belgelerle dengbêjlerin sözlerinin birbirinden farklı olup olmadığı ortaya konulmaya çalışılmıştır. Bu bağlamda bu belgeler ve şarkılar karşılaştırılıp analiz edilmiştir. Yapılan araştırma sonucunda, belgelerde konuşan hükümet yetkililerinin tek kaygısının güvenlik sistemi ve istikrar olduğu, çatışmanın nedeni ve çatışma sonucunda kaç kişinin öldüğü gibi soruların onlar için önemli olmadığı ortaya çıkmıştır. Ancak dengbej şarkılarında çatışma alanı tasvir edilmiş ve kahramanlar özellikleriyle tanıtılmıştır.

Anahtar Kelimeler: Dengbej, Kilam, Osmanlı arşivi, Gameşvan çatışması, Haydaran aşireti.

Destpêk¹

Di sala 1907an da li gundê Gamêşvanê (bi fermî Değirmendüzü) ku li Patnosa navçeya Agiriyê dimîne, di nava Torina Mala Şero bi xwe da pevçûnekê rû daye û qederek însan hatine kuştin ku Gamêşvan wê hingê girêdayî Erdîşê bûye. Ji ber ku di nava Kurdan da sazî yan jî dezgehêk tune ye ku peywira tomarkirina bûyeran an jî nivîsîna dîrokê bi cih bîne, ev bûyer û bûyerên bi vî rengî di nava rûpelên dîrokê da wenda dibin û tên jibîrkirin. Lêbelê hin faktor û amraz hene ku nahêlin ev qewam bi temamî di bin xweliya demên borî da bimînin û bîn jibîrkirin. Ji van amrazan yek jê wesîqeyên dîrokî ne ku ji hêla peywirdarên dewleta serdest a çaxa xwe hatine nivîsîn û arşivkirin, ya duyem kilamên dengbêjan in û ya sêyem jî bîr û hafizeya civakê ye. Di vir da divê em wê yekê destnîşan bikin ku arşîva Osmanî û kilamên kurdî di xebatên biwarê çand, dîrok û folklorê kurdî da zemîneke dewlemend rabeerî mirov dike. Bi taybetî di nirxandina kilamên kurdî da nêrîneke xweş dabîn dikin ji bo xebatên dîrokî yê derheqê kurdî û kurdan da û bi saya serê van lêkolînan meriv valahî û kêmasiyên dîroknivîsîna fermî ya akademîk jî dikare bibîne (Yüksel, 2023, r. 136). Rêyeke xweş ya ronîkirina van qewamên giring ên civakî jî belgeyên fermî yê dewletê bi xwe ne ku carcar ji bo zelalkirina paşxane yan jî karakterên di kilaman da (bnr. Yüksel, 2016, 2023) an jî hin aliyên rastî yê vegêranên dirêj ên wekî destanan dikarin berçav bikin (bnr. Kaplan, 2023; Subaşı, 2023). Ev xebat bi metoda wesfî û rabeerî (berawirdî) va xwe lê datîne ku di ser pêlikên amrazên navborî ra firqas bike û bi qandî taqeta xwe mijara Şerê Gamêşvanê li ber roniya wesîqeyên dîrokî û kilamên dengbêjan vekole.² Lewra bi qasî wesîqeyên dîrokî, tekstên kilamên dengbêjan jî giring in û di warê ronîkirina serdemên borî da agahiyan vedihewînin. Di vê babetê da Yüksel jî destnîşan dike ku çî ji dengbêjên berî xwe hîn bûbin çî jî ji serpêhatiyên xwe sêwirandibin, vegêranên helbestkî yê dengbêjan ji qeydên dîrokî yê kêmdîtî ne ku gihîştine ber destê me (Yüksel, 2019, r. 326). Ji lewma jî gelekî muhim e ku di lêkolînen akademîk da sûd ji tekstên kilamên dengbêjan jî were wergirtin.

Ji aliyekî din va gelekî giring e ku ew yek were tesbîtkirin, ka wesîqeyên dîrokî û tekstên kilamên dengbêjan di vê mijarê da bi çî rengî li hev dikin û li ser kîjan aliyên ji hevdu dûr dikevin. Di vê çarçoveyê da ji bo vê xebatê me wesîqeyên Arşîva Osmanî (Devlet Arşivleri Başkanlığı Osmanlı Arşivi), herdu pirtûkên Kemal Süphandağ³, kilama ku Aslıqa Qadir, Dengbêj Evdilkerîmê Patnosî û Dengbêj Maşelayê Mûşî dibêjin, bi kar anîn. Herwesa di beşa peywenda dîrokî da me sûdeke mezin ji teza doktorayê ya Erdal Çiftçi ya bi navê “Fragile Alliances in the Ottoman East: The Heyderan Tribe and the Empire” (Îttifaqên Qels li Rojhilatê Osmaniyan: Eşîra Heyderan û Împaratorî) wergirt.

Ev xebat ji destpêkek, sê beş û encamekê pêk tê. Di destpêkê da me qala armanc û giringiya

1 Heta ev gotar kamil bû, alîkariya gelek kesan gihîşt min û lewma ez dixwazim li vir spasiya wan bikim. Di serî da ez sipasiya mamosteyê hêja Dr. Mehmet Rêzan Ekinçi dikim ku di xwendina hinek cihên têlxirafên Seraşker Riza da alîkariya min kir. Dîsa mamoste Dr. Ömer Delikaya jî bi xwendin û pêşniyazên xwe rê ji min ra xweş kir, sipasiya wî dikim. Herweha edîtorê Kurdiyatê Dr. Yakup Aykaç, edîtorê qadê Dr. Kenan Subaşı, hekemên navnediyar bi pêşniyaz û rexneyên xwe kirin ku gotar bikemile, ez malavayîya tevan dikim.

2 Di destpêkê da me plan kir ku em vê gotarê li ser sê lîngan ava bikin ku ew jî wesîqeyên dîrokî, kilamên dengbêjan û hafizeya civakî bûn. Li gorî îmkanan me wesîqeyên dîrokî û kilamên dengbêjan biter kirin û di vê xebata xwe da bi kar anîn. Lêbelê lingê sêyem, kulek ma. Digel ku me pir hewl da û di vê çarçoveyê da me peywendî bi 3-4 kesan ra danî jî, lêbelê em bi ser neketin ku ji nava gel bi şarezayekî mijarê ra hevpeyvînê bikin û di xebata xwe da bi kar bînin. Divê em di vir da diyar bikin ku helbet me şarezayekî mijarê dît ku dikaribû salix bidaya, hetta ewil qebûl kir ku salix jî bide, lêbelê di pey ra bêyî ku sedemêkê destnîşan bike, xwe ji mijarê vekişand û hevpeyvînê encam neda. Dema me bi kesê navborî ra peywendî danî yê ewil qebûl kir ku hevpeyvînê bike û dî ra xwe jê vekişand, diyar kir ku ew bi mijarê dizane û heta bi çend hevokan mijar izel jî kir. Di wê izelê da derket holê ku salixdana wan, ji ya Mala Paşê (ku di pirtûkên Kemal Süphandağ da derfeta ifadeyê dîtiye) hinekî cudatir e. Ji lewma jî em texmîn dikin, ji ber ku argumenta wan û ya Mala Paşê nakok e û herweha mijar jî mijareke hesas e û temasî meseleyên eşirtiyê dike, kesê navborî dil nekir ku li ser meseleyê xeber bide.

3 Süphandağ, K. Büyük Osmanlı Entriğası Hamidiye Alayları. İstanbul, Weşanên Komal, 2006; Osmanlı Arşiv Belgelerinde Heyderan Aşireti ve Ağrı Direnişi, İstanbul, Pel Yayınları, 2021.

mijarê kir. Me beşa yekem ji bo peywenda dîrokî ya mijarê terxan kir û herweha me bi kurtenêrînekê cih da dîroka malbata Torina Mala Şero. Di beşa duyem da jî em li ser Şerê Gamêşvanê rawestiyen ku mijara esasî ya vê gotarê ye. Di vê beşê da me wesîqeyên dîrokî û herweha kilamên dengbêjan ên li ser mijarê parve kirin. Herweha di beşa sêyem da jî me hewl da ku em van wesîqe û tekstên kilaman bikin ber şirove û analîzan. Di beşa encamê da jî me cih da wan encamên ku me bi vê xebatê bi dest xistin.

1. Peywenda Dîrokî

Heyderan wekî eşîreke konfedere û rêkxistî di dawîya sedsala 19em û destpêka sedsala 20em da cihê xwe yê di nav rûpelên dîrokê da wergirtiye û herweha di vê heyama dîrokê da bi pêşengiya Torina Mala Şero va ev rola xwe mezin lîstîye û li herêmê bûye hêzeke sereke. Mihemed Emîn Zekî Beg diyar dike ku Heyderan ji eşîrên Kurdan ên herî mezin e, ji Mûşê heya Êrmiyeyê li her derê hene, koçer in û herweha sî hezar mal in (Zekî Beg, 2002, r. 261). Diyar e ku Zekî Beg ev agahiya xwe ji Mark Sykes wergirtiye. Lewra agahiyên Zekî Beg û yên Sykes nêzikî hev in û herweha Zekî Beg diyar dike ku wî di xebata xwe da ji Sykes jî sîd wergirtiye (Zekî Beg, 2002, r. 235). Li gorî Sykes jî bîst hezar konên Heyderiyen hene (Sykes, 1908, r. 478).

Li gorî wesîqeyê arşîva Osmanî (Çiftçi, 2018, r. 28; Kaya, 2022, r. 495), pêşiyên eşîra Heyderan digihîjin Silîvaya (Farqîn) navçeya Diyarbekirê ku di wextê xwe da paytextê Merwanîyan bû. Li gorî wesîqeyê, Heyderan li Meyafarqînê (Silîva/Silvan) êleke şaxa Zîlan in, xwedan 31 konan in û dîroka wê jî vedigere sala 1540î. Her di vê çarçoveyê da Kaya bal dikişîne, ji nivê yekem ê sedsala şanzdehan û pê va eşîra Zîlan ji ber zêdebûna nifûsê û herweha ji ber sedemên civakî, aborî û siyasî ber bi deverên cuda yên coxrafyaya Osmanî belav bûye (Kaya, 2022, r. 491) û herweha nexasim ji ber çêre û zozanên wê, koçî herêma Serhedê (Bazîd, Erzirom, Qers û Mûş) kiriye (Kaya, 2022, r. 493). Dîsa li gorî wesîqeya ku Çakır (2023, r. 135) di xebata xwe da parve kiriye jî Heyderan li Senceqa Meyafarqînê ya eyaleta Diyarbekirê şaxeke eşîra Şikakî ne û ji wir bar kirine çûne aliyê Mûş û Wanê. Lêbelê Çiftçi (2018, r. 34) diyar dike ku agahiyên der barê peywendîya Heyderan û Şikakan da ne zelal in û herweha nakok in û hin lêkolerên hevdem jî bêtî ku vê agahiyê di bêjîngê ra derbas bikin, bi dest xwe ra pejirandine û îdia kirine ku Heyderan şaxeke Şikakiyan e. Lêbelê di vê mijarê da meriv dikare wê yekê bêje ku Heyderan ne şaxeke Şikakiyan in, lê pêkan e ku di heyameke diyar a dîrokê da rêkeftin pêk anîbin û bûbin mitefîqê hev. Çawa ku di nivê sedsala XVIIem da digel Rojkiyan (Çiftçi, 2018, r. 24)⁴ û heya nivê sedsala XIXem jî digel Ademiyan (Çiftçi, 2018, r. 297) îttifaq pêk anîne, mumkin e ku Heyderan demekê digel Şikakiyan jî rêkeftin pêk anîbin û bûbin mitefîq. Herwesa bi qasî ku Kor Huseyîn Paşa ji Elî Emîrî ra salix daye, bav û kalên wan di heyamekê da ya ew pê nizanin, ji Meyafarqînê koçî herêma sînorê bakur ê Osmanî-Îranê kirine (Çiftçi, 2018, r. 53).

4 Di wergera bi Tirkiya îro ya Seyahetnameya Evliya Çelebi da navê "Heyderî" derbas dibe, lêbelê di çapa Osmanî ya sala 1898an da ev agahî tune ye (Çelebi, 1898, r. 227).

1.1. Tebeqeya Rêveberiya Heyderan: Torina Mala Şero⁵

Piştî ku mîrnîşîniyên Kurdan ên dawîn ji aliyê Dewleta Osmanî va bi plan û hêza leşkerî va ji holê hatin rakirin (Bruinessen, 2010: 200), li herêmê şûna desthelata kevnare û irsî ya mîran, eşîr xurt bûn û rola wan di qada siyasî da derket pêş. Herwesa li gorî gotina Ulugana, di demekê da ya ku otorîteya navendî nikaribû hebûna eşîran ji holê rake ku piştî tesfîyeya mîrektiyên xurtir û qewîntir bûn, coxrafyaya Kurdistanê bi sê aktorên nû ra nasiya xwe da hev: Şêxên Xalidî yê bi şaşîk, mîsyonerên Rojavayî yê bi şewqe û rêveberên Osmanî yê bi fes/kumê sor (Ulugana, 2022, r. 65). Di atmosfereke bi vî rengî da stêrka Torina Mala Şero biriqî û bi rasthevhatina politîkaya Padişahê Osmanî Evdilhemîdê duyem va ya biryara avakirina Alayên Hemidiye da, rol û hêza malbatê berçavtir û mezintir bû.

Di vê serdemê da li herêmê eşîrên herî xurt ên bi hejmara alayên xwe va derketin pêş, Heyderan, Hesenan û Milî ne. Heyderan li wilayetên Wan û Erziromê heft alay, Hesenan li devera Milazgirê pênc alay û eşîra Milî ya bi serkêşîya Îbrahîm Paşayê Milî jî li devera Wêranşarê pênc alay damezirandin (Ekinçi, 2017, r. 718) û di heyama xwe da bûn sê hêzên sereke yê herêmê.

Navê Mala Şero ji Şerîf Mihemed Beg tê ku di sedsala XIXem da yek ji serkirdeyên Heyderan e (Çiftçi, 2018: 25). Mala Şero bi hêz û rola xwe va bûye elîtên konfederasyona Heyderan û endamên malbatê, şax û baskên konfederasyonê bi rê va birine. Bo nimûne, dema ku li ser pêşniyaza Fermanarê Artêşa Çarem Muşîr Zekî Paşa di destpêka salên 1890î da (Eraslan, 1997, r. 462) bi telîmata Evdilhemîdê duyem xebatên avakirina alayan dest pê dîkin, serekên eşîra Merxuran jî li hev dicivin da ku alayekê ava bikin ku fermanarê wê jî ji Merxuran be. Lêbelê serekên baskên malan ên eşîrê li hev rûnanên û ji bo femandariya alayê, yekî ji nav xwe naneqînin. Li ser vê yekê erkê femandariya alayê pêşniyazî Huseyîn Paşa dîkin. Di vê gavê da Huseyîn Paşa jî bi şertê vî tekîlfa Merxuran qebûl dîke ku şertê wî jî ew bûye ku ji hêla dîsîplîn û techizatê va tu kêmasiyeke alayê dê tunebe. Ji ber vî şertê Huseyîn Paşa, alaya ku ji hêzên Merxuran pêk tê, dibe alaya herî birêkûpêk û ji herdu teftîşan jî bêyî qusûr û kêmasî derbas dibe (Avyarov, 1995, r. 250).

Ji aliyekî din va dema em awirekî didin dîroka Torina Mala Şero, em dibînin ku çî di nava malbatê da bi xwe, çî bi baskên din ên konfederasyonê ra û çî jî bi eşîr û konfederasyonên din ra Torina Mala Şero ketine nav gelek şer û pevçûnan. Ji şerên navxweyî yê Mala Şero yê herî navdar Şerê Gamêşvanê ye ku mijara vê meqaleyê ye. Ji bo şerê di nav baskan da jî em dikarin şerê Mala Şero yê bi Merxuran ra (BOA.DH.TMIK.M.270/84) wekî nimûne destnîşan bikin. Heyderan û Hesenan û herweha Heyderan û Celalîyan, Heyderan û Takoriyan jî gelek caran ketine rikeberiya hêzê û berê tîfingane dane hev (Demirci û Çabuk, 2014, r. 82-83; Aydın û Çiftçi, 2021, r. 158; Süphandağ, 2021, r. 39, 49). Der heqê şerê van eşîrên navborî da di arşîva Osmanî da jî gelek belge hene ku Süphandağ di pirtûka xwe ya navborî da cih daye wan.

⁵ Li gorî Alakom, di zimanê kurdî da “torin” wekî peyv tê maneya kesên esilsaze, aristokrat û bijarte û herweha wekî tîgîh jî tê çend maneyên cuda yê wekî nav û sîfet, navê tebeqeyekê, navê malbatekê yan jî navê qebileyekê (Alakom, 2009, r. 21-22). Helbet di nav kurdan da bi navê “Torin” qebileyekê heye û em vê di listeyên civaknasan da jî dibînin. Lê “torin” a li vir amaje bi tebeqeyekê, bi malbatekê dîke ku ew xwe wekî tebeqeya bijarte û rêveber dibînin û dihesibînin. Li vir dema em dibêjin “Torina Mala Şero”, em tebeqeya rêveberiya eşîr yan jî konfederasyona Heyderan qesd dîkin. Lewra wekî ku Ulugana ji Randot vediguhezîne, di organizasyona civaka kurdan da du tebeqeyên sereke hene ku ew jî “eşîr” û “reaya” ne (Ulugana, 2022, 318). Di serdemê mîrektiyên kurdan da ev cudabûn, bêtir aşîkar û li ber çavan e. Lewra ev yek xwe di malikên Feqiyê Teyran da wiha dide der: “Gul dibê ev lawê ras ne/Mîr li kurmancan qiyas ne/Te ji destê min xelas ne/Ho li te didim muhletê” (Teyran, 2022, r. 131). Ango “Gul ji lawîk ra dibêje ev ne rast e, ma qet di navbera Mîr û yekî Kurmanc da qiyas dibe, tja te tune ji destê min xilasi, ha ji te ra didim muhletê.”

2. Şerê Gamêşvanê

Şerê Gamêşvanê li gundê Gamêşvanê yê Patnosê di sala 1907an da di navbera serkirdeyên Heyderan ên hêzên Huseyîn Paşa û Emîn Paşa da qewimiye. Ji ber ku konfederasyona Ademan jî beşdariya vî şerî kiriye û rabûye piştê hêzên Emîn Paşa, jê ra “Şerê Heyderan û Ademan” jî tê gotin. Ademan heya nîveka sedsala 19em şaxeke Heyderan bûye. Ji vê dîrokê şûnda wekî eşîreke serbixwe organîze bûye (Çiftçi, 2018, r. 297). Şerê Gamêşvanê herçiqaş wekî şerê Heyderan û Ademan were binavkirin jî lê ev şer di rastiya xwe da yê Heyderan bi xwe ye. Lewra cihê ku şer lê qewimiye dikeve hînterlanda desthelata Heyderan û Torina Mala Şero.

Dema meriv li dîroka Mala Şero dinihêre, meriv dibîne ku di serê ser da nakokî û berberî di nava malbatê da heye. Malbat ji seriyekî bêtir bi awayekî pîrserî dixuyê. Ji yekbûn û tifaqê bêtir malbat bi şîraq e. Di rastiya xwe da ji xeynî vî şerê navxweyî, eşîr bi xwe jî radibin hemberî hev û şerê hevdu dikin. Di arşîva Osmanî da belgeyên têkildarî şer û pevçûnên eşîran hene û Kaya jî gelek ji van belgeyan ên têkildarî şerê eşîrên li wilayeta Erziromê tomar kirine (Kaya, 2021, r. 971-987). Herweha ev nakokîya di navbera serekên malbata Şero da di belgeyên Osmanî da bi eşkereyî li ber çavan e. Lewra di dema avabûna Alayên Hemidiyeyê da her kurapekî cuda cuda xebatên damezirandina alayan meşandine û ala ava kirine. Di vê serdemê da rikeberiya di navbera kurapan da ku Huseyîn, Emîn û Hecî Temir Paşa ne, gurtir bûye. Huseyîn Paşa çar alay, Emîn Paşa du alay û Hecî Temir Paşa jî alayek ava kirine. Lê ji ber ku paşatiya wî ji mulkiyeyê bûye, Emîn Paşa ferdariya alayan wekî fermî spartiyê birayê xwe Qaymeqam Elî Beg (Süphandağ, 2006, r. 335).

Herweha kurapan her yekî jê li devereke cuda hêza xwe edilandibû, bakur û rojavayê Patnosê di bin bandora Huseyîn Paşa da, gundên nêzikî Erdîşê di bin bandora Emîn Paşa da û gundên bi ser nehiyeya Kosa (Sarîsu) jî di bin bandora Hecî Temir Paşa da bûn (Çiftçi, 2018, r. 275). Van serekên Heyderan pîrî carî êrîş dibirin ser gundên hev, nexasim jî gundên Ermenîyan diketin ber van êrîş û şêlandinan. Ji ber zêdebûna êrîşên bi vî rengî, hersê serekên navborî di Rêbendana 1898an da bo Stenbolê hatin veguhestin û tewqûfkirin (Çiftçi, 2018, r. 299). Lê piştî ku teahud dan îradeya şahane ku dê êdî bi rik tevnegerin, îstiqrarê têk nebin û li rêya hev biçin, ev hersê serek hatin berdan û vegeyîyan memleketên xwe.

Hersê kurap piştî ku vedigerin memleket, ji bo demeke dirêj di bêdengiyê da dimînin û na-kevin nav şer û pevçûnan. Lêbelê di sala 1907an da li gorî gotina Süphandağ, Evdîla Begê Qaymeqamê Patnosê yê kurê Huseyîn Paşa hêzeke bi qasî sed mirovî dişîne ser gundê Ermenîyan ê bi navê Gamêşvanê yê li hînterlanda Emîn Paşa (Süphandağ, 2006, r. 418). Lê Emîn Paşa jî bi gotina amiyane, ne di guhê gê da bûye, wî jî tedbîra xwe sitandiyê, li dora gund kozik dane kollandin, herweha birayê wî Elî Beg jî li şênîyên gund ên Ermenî çek belav kirine (Çiftçi, 2018, r. 308). Di van şert û mercan da hêzên Huseyîn Paşa yê êrîş birine ser gundê Gamêşvanê, ji nivî zehftir hatine kuştin. Li gorî Süphandağ, qedera 80 çekdar di vî şerî da hatine kuştin ku di navê da mîrxasên Huseyîn Paşa yê wekî Êşkê Bozo yê Xelkî û Mûsayê Zorav yê Laçekî jî hebûne (Süphandağ, 2006, r. 418).

Dîsa li gorî ku Çiftçi ji çavkaniyên zarî vediguhezîne, ji ber ku diya Emîn Paşa keça serokê eşî-

ra Ademan bûye û mêla Ademiyan li ser Emîn Paşa bûye, di vî şerî da jî piştgirî dane hêzên Emîn Paşayî (Çiftçi, 2018, r. 297). Beramberî vê yekê, Sîpkîyên li Dutaxê jî alîkarî dane Huseyîn Paşa.

2.1. Şerê Gamêşvanê di Wesîqeyên Dîrokî da

Di Arşîva Osmanî da bi zarê belgeyan tê diyarkirin ku Paşayên Eşîra Heyderan bi hev çûne (BOA, Y.MTV, 299/125 H-16-05-1325) û divê demildest ev pevçûn û rageşî bê bidawîkirin, lewra ji ber vî şerî xelkê deverê pir zirardêde bûye (BOA, BEO, 3091/231789 H-21-05-1325) û herweha her di vê navberê da du hefte şûnda jî hatiye diyarkirin (BOA, DH.TMIK.M, 249/31 H-02-06-1325) ku nakokî û berberiya di navbera Paşayên Heyderiyan da hatiye çareserkirin.

Hem di telxrafa Seresker Riza da û hem jî di ya wilayeta Erziromê da fikara ku herî zêde dertê pêş, ew îhtimal e ku bi beşdarîkirina eşîrên din va ya di şer da, asayîş dê bi temamî tîk biçe û îstîqrar dê nemîne. Lewma di herdu telxrafan da jî tê xwestin ku tedbîrên di cih da demildest bînin sitandin. Dîsa di telxrafa Wilayeta Erziromê da diyar e ku yê herî zêde mirov li dora xwe kom kirine û dikeve liv û tevgerê, Huseyîn Paşa ye. Di vir da herweha tê diyarkirin ku şerê di navbera kesên navborî da ji zû da ye didome û di serdema ziraetê da yê herî zêde zirarmend dibe jî gel e. Dîsa em dibînin ku di vir da tê gotin ku paşayên mezkûr bi saya serê Padişah bûne xwedan meqam û pile, lêbelê ji ber nezanî û cahiliyê, karên kirêt û sosret dikin û herweha zordestiyê dikin û xwîne dirêjin. Lewma jî tê xwestin ku layenên şerker bi awayê herî giran bînin cezakirin da ku careke din teşebusî karekî wiha nekin.

Wekî di wesîqeyan da jî diyar e, Huseyîn Paşa ji Emîn Paşa û birayê wî Qaymeqam Elî Beg û herweha Temir Paşa xurtir û serdestir e. Ev yek jî hejmara alayên damezirandine jî diyar e, lewra Huseyîn Paşa bi serê xwe çar alay ava kirine. Helbet ev xurtbûna wî xwe dispêre hêzên baskan ên eşîrên din ên di bin baskê konfederasyonê da. Lewra Süphandağ jî bal dikişîne ku hêza Huseyîn Paşa ne ku ji Mala Şero ya ku mensûbê wê ye, belkî ji piştewaniya efradên din ên eşîra Heyderan tê (Süphandağ, 2006, r. 335). Bo nimûne, wekî me li jor jî behs kiribû, eşîra Merxurî sercem li cem Huseyîn Paşa ne û Alaya Siwariyên Sivik a 25em a ji hêzên Merxuran pêk tê di bin fermandariya Huseyîn Paşa da ye.

Wekî me li jor jî diyar kir, hê berî ku pileya paşatîyê werbigirin, şer û pevçûn di navbera endamên Torina Mala Şero da qewimîne. Di belgeyên arşîva Osmanî da em dibînin ku Huseyîn avêtiye ser mala Hecî Temir ku belge wan wekî “axa” diwesifînin û ji ber vê çendê jî daxwaz hatiye kirin ku Huseyîn Axa were cezakirin (BOA, DH.MKT, 1543 90 H-11-01-1306; BOA, DH.MKT, 1546 58 H-18-01-1306). Herweha em ji belgeyan hîn dibin ku wextê hukmê wan hebûye, zarokên şexsên navborî jî ev rikeberî û herweha şer û pevçûn domandine (BOA, MKT.MHM, 666 24 H-15-01-1313).

Di hedê zatê xwe da ev avêtina bi ser malê da nîşanî me dide ku yê zordest Huseyîn Paşa ye. Herweha divê meriv di vir da wê yekê jî bîne ziman ku gava meriv li wesîqeyên Osmanî dinihêre, meriv dibîne ku endamên Torina Mala Şero di tebeqeya herî bilind da qet ji hev nehewîne, timî belapêjgarî hev bûne û gava konjonktur guheriyê û bi politikaya Ebdulhemîdê Iiyem hêzeke bêtir kesb kirine û hêza wan qaîmtir bûye, bêtir ketine pêşîra hev.

Li gorî belgeyeke din jî mirovên Qaymeqam Elî Begê birayê Emîn Paşa agir berdane tîrên (zeviyên genim) Mîrlîwa Huseyîn Paşa. Ev jî nîşanî me dide ku Elî Beg û Emîn Paşa li hemberî Huseyîn Paşa qels in û tiştta ku ji destê wan tê, agirdadayîkirina zeviyên genim e. Ji dîroka wesîqeyê diyar e ku heyama, heyama tîrdîrûnê ye û zeviyên hatine şewitandin jî tîr in (BOA, DH.ŞFR, 372/9 R-07-08-1322).

Me li jor jî diyar kir ku devera di bin kontrola Huseyîn Paşa da bakur û rojavayê Patnosê ye, ya di bin kontrola Emîn Paşa da jî bêtir gundên nêzikî Erdîşê ne. Gamêşvan wekî coxrafya digel ku nêzikî Patnosê ye, wê hingê li ser qezaya Erdîşê dixuyê (BOA, DH.ŞFR.190/80) û şênîyên wê jî bi giranî Ermenî bûne. Bi ihtimaleke mezin, ji ber ku girêdayî Erdîşê ye Emîn Paşa difikire ku li herêma wî dimîne û heqê bacê yê wî ye û herweha ji ber ku nêzikî Patnosê ye jî malbata Huseyîn Paşa wisa difikire ku ev heq, yê wan e. Ji xwe dema em li van herdu (BOA, BEO, 768/57565 H 08-11-1313/BOA, DH.ŞFR. 190/80 R 07-12-1312) belgeyan dinihêrin, em dibînin ku di sala 1897an da ango 10 sal berî şerê Gamêşvanê, birayên Emîn Paşa, Evdillah, Edo û Elî û herweha biraziyên wî êrîş birine ser gundê Gamêşvanê, hinek emwal û pênc sed exnam xesb kirine (exnam, baca şer'î ye), du mêr û jinek kuştine, du kes jî birîndar kirine.

2.2. Şerê Gamêşvanê di Kilamên Dengbêjan da

Şerê Gamêşvanê di kilamên dengbêjên herêma Serhedê da û nexasim jî di yên devera Patnosê da pir deng vedaye. Dengbêjên wekî Hecî Evdilkerîmê Patnosî, Maşelayê Mûşî, Kemalê Kûçeka û Hecî Adil kilama li ser Şerê Gamêşvanê ya bi “Delal hay delal”ê va dest pê dîke, gotine. Dîsa di Radyoya Rewanê da jî hunermend Aslîka Qadirê ev kilam gotiye ku wiha dest pê dîke:

Lo axawo şerekî li me çêbû li Gamêşvanê Tozîbelanê li devê avê
Eskerê Huseyîn Paşayê Heyderî giran e derketiye ji Patnosê xwe da navê (Maşelayê Mûşî, dq. 0:57)

Delal qurban tu delal î

Were hey delal gazî ye xweş hewar e (Aslîqa Qadir, dq. 0:35)

Bê axawo şerêka li me qewimî Gamêşvana şewitî li derî avê

Lo maqûlo qaleka li me qewimî Gamêşvana kavi li derî avê

Eskerê Zor Huseyîn Paşa derket ji Patnosê (Hecî Evdilkerîm, dq. 09:00)

Dema em dengbêjan guhdarî dîkin, em dibînin ku kilam bi sehneya şer dest pê dîke û diyar dîke ku li Gamêşvanê wa ye şerekî mezin diqewime û herweha gazî û hewarî ye. Di pey ra jî tê diyarkirin, yê ku eskerê wî giran e û herweha şer daye destpêkirin, Huseyîn Paşa ye. Lewra li ser zarê dengbêjan tê îfadekirin ku wa ye eskerê Huseyîn Paşa bi hezarî ye û dikişe, diçe şer.

Were hewarî hewarî hewar hewarî

Bavo îro li Gamêşvanê agir barî

Her çar gundê dora Kela Kudo bi serê min da mabû xirûxalî

Li ser serê eşîra Heydera da bûye gazî hewarî

Tu bala xwe bidê sala îsal orta Huseyn Paşayê Heyderî

Edoyê Hesên Axa bavo çawa bû neyarî (Maşelayê Mûşî, dq. 01:30)

Hele bala xwe binê derdê li ser derda yî

Orta Zor Huseyîn Paşayê Heyderî, Edoyê Hesên Axa bi resmen bavo bû neyarî (Hecî Evdîlkerîm, dq. 08:41)

Di vir da em dibînin ku dengbêj diyar dikin ku ev şer, şerê xwebixwetiyê yê Heyderan e ku li aliyekî Huseyîn Paşa heye û li aliyê din jî mala Hesên Axa heye.

Min dî Edoyê Hesên Axa bi sê dengên bang dikir
Gelî hevalan çê bin çê bixebitin
Hûn ê lêxin Êskê Bozo Mûsê Zorav bikujin
Cinazê van xweşmêran bidine li ber tavê (Maşelayê Mûşî, dq. 01:15)
Edoyê Hesên Axa kire gazî
Go, Fariz Mihemedê Şana, Evdîlê Muslî bavê min bi lawo mêr bin çê bisekinin

Em ê bikujin Êskê Bozo, Mûsê Zorav termê van zilaman bidem ber tîra tavê (Hecî Evdîlkerîm, dq. 09:25)

Piştî ku eskerên Huseyîn Paşa dikişin û nêzîkatîyê bi cihê şer dikin, Edoyê Hesên Axa dide bin çenga mêrxasên xwe û ji wan ra dibêje ku xwe jêhatî bikin, em ê lêxin wan xweşmêran bikujin. Li gorî ragihandina dengbêjan, em dibînin ku li meydana germ a şer, kurê Hesên Axa, Qaymeqam Elî Beg birîndar dibe û herweha xweşmêrên Huseyîn Paşa, Êskê Bozo û Mûsê Zorav tên kuştin. Em vê yekê ji zarê Êskê Bozo hîn dibin ku dibêje, “Heyran wele ez du gula birîndar im destê min nagire qevda mîrata modolyê (Maşelayê Mûşî, dq. 07:45).” Helbet ev, agahiyeke rasterast e ku destnîşan dike kê birîndar e û kuştî ye. Lê em ji gotina “Tê zarîna qîz û bûkan lûbelûbê jinebiyan e (Maşelayê Mûşî, dq. 08:30); Weyle wêlê qîza li bûka, jinebiyan e (Hecî Evdîlkerîm, dq. 10:05).” fam dikin ku bîlançoya şer gelekî giran e. Lewra gelek qîz mane bêbav, gelek bûkên destbîhene û jin mane bêmêr û bûne jinebî. Her bi vî awayî dengbêj bi pesn û medh Edoyê Hesên Axa bi birîntînin û dawiyê li kilama xwe tînin.

Gava em li kilaman dinihêrin em dibînin ku dengbêj dema bûyerê vediguhezîne, agahiyan dide, teswîran dike, hetta carinan bi eşkereyî û carinan jî bi awayekî remzî û nerasterast mêl û sempatiya xwe ji bo layenekî nîşan dide. Ji vê hêlê va ji bo Şerê Gamêşvanê em dikarin bêjin ku dengbêjan der barê bîlançoya şer da agahî dane, teswîra şer kirine. Li gorî vê, em dibînin ku ka kê birîndar bûye û kê hatiye kuştin û herweha şervanên herî bijarte yên layenan kê ne û aqûbeta wan çî ye.

Ji aliyekî din va gava em li handana navborî ya Edoyê Hesên Axa dinihêrin, em dibînin ku biryardayîna şer di derbekî da nebûye. Ev di pêvajoyekê ra derbas bûye û haya layenan ji hevdu hebûye. Ev jî nîşan dide ku Edo, di gund da kozîk vedane, tedbîrên xwe wergirtine û hew karê mayîn jî handana mêrxasan bûye û ew jî, roja şer kiriye.

Di vir da belkî xala herî giring a divê em li ser rawestîna dengbêj e. Lewra çî dengbêj çî destanbêj, gava kilamekê, destanekê yan jî rûdanekê vediguhezîne, terefgiriya xwe jî nîşan dide, ango bi uslûb û şêwezarekî layengîr îcraya xwe dike. Hetta carinan hestên xwe jî tevî mijarê dike û fikr û rayeya xwe ya der barê waqîyê da derdibire. Bo nimûne, destanbêj di dema îcraya xwe da, veguhestina tekstê di carekê da radiwestînin û ya di dilê xwe da tînin

ziman. Helbet nîşandana vê terefgîriyê her carê bi heman rengî, bi awayekî eşkere pêk nayê. Em dibînin ku dengbêj rewş û dînamîkên civakê jî li ber çavan digire û li gorî wê tevdigere. Wekî ku Delikaya jî amajeyê pê dike, kilam [...] li ser fail û mexdûrên şîdetê terefgiriya xwe ya exlaqî ligel masûmiyeta sîvîlan tîne ziman (Delikaya, 2024, r.17).

Di vir da divê em wê yekê destnîşan bikin ku layenên bûyerê jî li ser uslûba vegêrana dengbêj tesîrê dikin. Ango heger kiryar, peywirdarên dewletê yan jî hêzeke biyanî û dereke be, ev îfadekirina bêgunehbûna sîvîlan a navborî, ji bo dengbêj hêsan dibe. Lêbelê hin rewş jî hene ku dengbêj nikare navê neheqiyê lê bike û jê ra bêje zilm. Belkî bi remzan û bi îfadeyên nerasterast vê neheqî û zilmê destnîşan dike û di vegêrana kilamê da di van rewşan da bi baldar tevdigere. Îja dema em li Şerê Gamêşvanê dinihêrin, em dibînin ku yekcar dikeve vê çarçoveyê. Lewra ji ber ku şer, şerekî xwebixwetiye ye, aliyên şerker mirovên hev in û di ser da jî mijar diçe digihîje meseleyên eşîrtiyê, dengbêj nikare navê neheqiyê lê bike û heq û neheqan bi eşkeryî destnîşan bike yan jî der heqê aliyekî da gotinên xirab bibêje. Şûna vê jî radibe, bi hin îfadeyên nixumandî va terefgîriya xwe nîşan dide. Dema em ji vê hêlê va li Şerê Gamêşvanê dinihêrin, em dibînin ku herçiqas bi eşkeryî nebe jî dengbêj, Huseyîn Paşa neheq dibînin. Lewra di kilaman da tê diyarkirin, yê ku eskerên wî bi hezaran dikişin û diçin şer Huseyîn Paşa ye. Ji xeynî vê, di kilaman da der heqê Huseyîn Paşa da çî erênî çî nerênî hema hema tu îfade tunene, çî heye bi tenê di versiyona Maşelayê Mûşî da wesfandina, “Huseyn Paşayê Heyderî lawo mija rû erdê ye (Maşelayê Mûşî, dq. 07:55).” derbas dibe.

Ev bêdengiya dengbêjan wê yekê nîşan dide ku naxwazin yan jî nikarin zordestiya Huseyîn Paşa bînin ziman. Lê gava mijar tê ser Hesên Axa û zarên wî, dengbêj pesnê wan didin û sempatiya xwe ji wan ra nîşan didin. Dengbêj diyar dikin ku Hesên Axa di wextê xwe da çiqas bihêz bûye û mîna mij û dûmana Çiyayê Sîpanê Xelatê dakutaye ser dijmin (Aslîka Qadir, dq. 01:05), kana tirs û xofê bûye, lê heyf û mixabin ku niha ew tune û tirsê wî jî nemaye. Herweha ji ber ku di şer da Eliyê kurê Hesên Axa birîndar dibe, dengbêj wî wekî mîrê zirav tewsîf dikin (Aslîka Qadir, dq. 0:47) û dîsa payeyeke leheng û qehremanane didin Edoyê Hesên Axa û Edo derdixin asta serlehengên destanên Kurdî. Lewra di destanên Kurdan da serleheng bi cesaret û sexaweta xwe tînin naskirin û herwesa hespekî wan jî heye ku xwedan nav û karakter e. Di vir da ji bo Edo tê gotin ku siwarê Kurdo û bavê Silêman e (Hecî Evdilkerîm, dq. 10:15; Maşelayê Mûşî, dq. 08:35). Ango navek li dinyayê hiştiye ku kurê wî dikare pê serbilind be. Edo herwesa mêrekî wisa ye ku fena keleheke li deştê, xurt û zexm e, li jor penahê hawar û gaziye ku Xweda be, li jêr jî Edoyê Hesên Axa ye (Hecî Evdilkerîm, dq. 10:06; Maşelayê Mûşî, dq. 08:45). Îfadeya, “Cebilxanê Edoyê Hesên Axa ji kîsî canfidan e (Hecî Evdilkerîm, dq. 09:56).” jî ji bo Edo pesn û medhek e. Lewra tê diyarkirin ku mirovên wî jê ra yar in, tu wextî îxanetî wî nakin û ji bo wî canê xwe feda dikin.

Ji aliyekî din va di mijara xwedan nav û nasnamebûna hespê Edo da, divê em diyar bikin ku ev yek ne bi tenê tîkildarî destanên Kurdî ye. Ev yek belkî tîkildarî edetên Kurdan e ku di jiyana xwe ya gundewariyê da bi piranî dianîn nav li wan heywanan dikirin ku jiyana wan hêsan dikir yan jî di hin qonaxên jiyana da refaquetiya wan dikirin. Bo nimûne, Kurdan dianîn û nav li kûçik, tejjî, ga, ker û hespên xwe dikirin. Em dibînin ku Yüksel jî di vê mijarê da diyar dike ku Kurd çandinî û heywandariyê dikin û lewma jî ew yek di nav wan da rewşeke pir berbelav e ku navan nexasim li

heywanên kêrhatî û jêhatî dikin û navê hespê Ferzendeyê ji serkêşên Serhildana Çiyayê Agiriyê, Enzawir e û nimûneya vê yekê ye (Yüksel, 2019, r. 342-343).

2.3. Cudahiya di Navbera Wesîqe û Kilaman da

Herwesa dema em li wesîqeyên Osmanî dinihêrin, em dibînin ku destnîşan dikin, şerek qewimiye û hinek însan hatine kuştin û hinek jî birîndar bûne û hew. Ji bo rêveberên ji navendê hatine şandin ne muhîm e yên hatine kuştin kê ne, çîrokên wan çî ne û hetta ji bo wan hejmar jî muhîm nîne û lewma diyar nekirine ka hejmara kuştî û birîndaran çend e. Bi qasî ku dixuyê, ev yek zêde di xema şefên eşîrê yên xelkê herêmê bi xwe da jî nîne, lewra Ebdullah Begê kurê Huseyîn Paşa dema hêza xwe dişîne ser Gamêşvanê, bi xwe li Patnosê rûdinê û di atmosfereke aram da kişîka xwe dilîze (Süphandağ, 2006, r. 418).

Lêbelê dema em li kilamên dengbêjan guhdarî dikin ku dîroka alternatîf a gel û hafîzeyê civakî ye, em dibînin ku meydana şerî tê teswîrkirin û der heqê şer da agahî tên dayîn. Di vir da zimanê kilaman ne zimanekî bêlayan e, dengbêj dibe teref û ne pir bi eşkereyî be jî heq û neheqan destnîşan dike.

Cudahiyeke din a di navbera wesîqe û kilaman da jî ew e ku di wesîqeyan da navê Emîn Paşa pir derbas dibe, lêbelê di kilaman da qet derbas nabe. Şûna wî, navê birayê wî Edo bêtir derbas dibe û behsa wî tê kirin. Ev jî nîşanî me dide ku yê xwenda û ji mulkiyeyê Emîn Paşa di nezdê rayedarên dewletê da dibe mixatab. Lê di nav gelê herêmê da yê mixatab tê girtin jî Edo ye. Edo kurê mezin ê Hesên Axa ye û di temamî kilamên dengbêjan da yê derdikeve pêşîya me, ew e. Herweha wekî me li jor jî destnîşan kir, Edo tevî birayên xwe deh sal berî ku Şerê Gamêşvanê biqewime, êrîş biriye ser heman gundî ku di encamê da sê kes hatine kuştin.

2.4. Cudahiya di Navbera Kilaman da

Versiyona kilamê ya ku Aslıqa Qadirê di Radyoya Rewanê da gotiye, li gorî kilamên dengbêjên din kintir e û cih cihan jî hatiye sansurkirin û herweha navê lehengan tevlihev bûne û guherîne. Di vir da tê diyarkirin ku gula siwaran, ango mîrxasê herî bijare û dilêr, Îskanê Zero hatiye kuştin. Lê em dizanin mîrxasê hatine kuştin Êskê Bozo û Mûsayê Zorav in. Ango di vir da navê Êsko bûye Îskan û nasnavê Zorav ê Mûsa jî wekî Zero guheriye û ji Îskan ra bûye nasnav. Herweha navên mîrxasên mala Hesên Axa jî li gorî dengbêjên din guherîne û bûne Simbo û Sêvo. Dîsa dema dor tê ser rêzika ku dê wê yekê rave bike, eskerê Huseyîn Paşa derket û kişîya çû, peyvên nayên fêmkirin yên wekî “Bi gotinê eskerê *kura savde şaşêla têne sitka qûya gulla davên*”⁶ tên gotin. Bi qenaeta me di vir da navê Huseyîn Paşa û salixdana wê hatiye sansurkirin. Lewra li dewlet û rejîmeke ku wisa dihesibîne hemû însan bira ne û herweha di radyoyekê da ya ku fikra “Kurd hemû bira ne” belav dike (Elend, 2021, r. 16), ravekirin û pesindana axayekî ku dewleta rikeber remza Paşatiyê dayê, yê ku “dibe sedema xwînretinê”, ne maqûl û muteber e. Di vir da dîsa bavê Emîn Paşa, Hesên Axa bûye Paşa ku di rastiyê da paşatiya wî tune. Herweha hatiye balkişandin ku Hesên Axa di wextê xwe da çiqas bihêz bûye û mîna mij û dûmana Çiyayê Sîpanê Xelatê, kana tirs û xofê bûye, lê heyf û mixabin ku niha ew tune û tirsê wî jî nemaye.

6 Di vê risteyê da nivê hevokê nayê fêmkirin. Dema meriv leza kilamê dadixe, peyvên famkirinê lêbelê îcar maneyeke wan çênabe. Herwesa Süphandağ di pirtûka xwe da (2021, r. 73) ev riste wekî, “*Bi gotinê eskerê Huseyîn Paşa jêr da tene gule davên*” nivîsiye.

Versiyona kilamê ya ku dengbêj Hecî Evdilkerîmê Patnosî dibêje, fena ya Radyoya Rewanê sê bend e. Di vê kilamê da em dibînin, çawa ku mêrxasên Huseyîn Paşa hene, bi heman rengî yên mala Hesên Axa jî hene ku navê wan Fariz Mihemedê Şana û Evdilê Muslî ne, pir dilêr û canfida ne û lê dixin, mêrxasên mala Paşê dikujin û termê wan li ber tîra tavê dihêlin.

Versiyona kilamê ya ku dengbêj Maşelayê Mûşî dibêje, şeş bend e û li gorî yên din hinekî dirêjtir e. Di vê kilamê da pir bi eşkereyî tê diyarkirin ku herdu hêzên rikeber, ne hevseng in û yên Huseyîn Paşa girantir e û bi hezarî ye. Bereksê kilamên din, di vir da tê diyarkirin ku ev şer, şerê Heyderan ê navxweyî ye û ev yek bi hevoka, “Li ser serê eşîra Heydera da bûye gazî hewarî.” tê îfadekirin. Dîsa jî vê kilamê û jî kilama Aslîka Qadirê em hîn dibin ku di şer da Eliyê Hesên Axa jî birîndar bûye ku bi gotina “mîrê zirav” va mêl û sempatiya ji bo Mala Hesên Axa di vir da jî tê îfadekirin.

Wekî tebîeta hemû şeran, di vir da bi gotina “Tê zarîna qîz û bûkan lûbelûbê jinebiyan e.” encama ji bo jinan hatiye destnîşankirin. Herçiqas rasterast nebin hedefa guleyan jî, lê di şeran da yên esil mexdûr dibin jin in, wekî di vir da jî tê gotin, hinek jê keç in ku bavê xwe ji dest didin, hinek jê bûkên destbihene ne ku mîrê xwe ji dest didin û hinek jê jî ew jin ku mîrê wan tê kuştin û dibin jinebî.

Encam

Şerê Gamêşvanê di sala 1907an da li gundê Gamêşvanê yê niha li ser Patnosa navçeya Agiriyê ye, lê wê hingê li ser Erdîşa navçeya Wanê bûye, di encama rêkeberiya hêzê ya naxweyî ya malbata Torina Mala Şero (TMS) da qewimiye. Aliyên ku di vî şerî da hatine hemberî hev û mîr ji hevdu kuştine, hêzên Huseyîn Paşayê Heyderî û yên kurapê wî Emîn Paşa ne. Di vî şerî da jî ber ku hinek merivên eşîra Ademiyan rabûne piştî Emîn Paşa, ji bo vî şerî di heman demê da Şerê Heyeran û Ademan jî tê gotin.

Dema ku em bala xwe didin arşîva Osmanî, em dibînin ku di wesîqeyên li ser vî şerî da tesbîtên giring hene. Di van wesîqeyan da hatiye balkişandin ku ev rikeberiya di nava malbata TMSyê da mîlmilaneyeke kevn e, ji ber şer xelkê sivil ê deverê pir zirardîde dibe û lewma divê êdî teqez rê lê were girtin û teşebuskarên şer divê bîn cezakirin. Dîsa di van wesîqeyan da hatiye diyarkirin, serokên eşîran bi saîqeya cehalet û zordestiyê li ser hidûd aramiyê tîk dibin û teşebusî xwînretîne dikin. Helbet em dîsa jî wesîqeyên dîrokî hîn dibin ku di pêşdatirî vî şerî da hem li Gamêşvanê bi xwe û hem jî li deverên din, serkirdeyên TMSyê ketine şer û pevçûnan. Hetta jî ber ku hêzên Emîn Paşa û birayê wî Qaymeqam Elî Beg ne hevsengî yên Huseyîn Paşa bûne, çûne agir berdane zeviyên wan ên genim.

Ji aliyê xwe va gava mirov li tekstên kilaman dinihêre, mirov dibîne ku hem teswîra meydana şerî hatiye kirin û hem jî qehremaniya lehengên sereke yên şer hatiye ravekirin û navê wan hatiye zikirkirin. Dîsa versiyona kilama li ser şer ya ku Aslîka Qadirê di Radyoya Rewanê da gotiye, li gorî kilamên dengbêjên din kintir e û cih cihan jî hatiye sansurkirin. Di kilamê da navê lehengan tevlihev bûne û guherîne û herweha rêza ku navê Huseyîn Paşa û eskerên wî derbas dibe, hatiye sansurkirin û di şûna wê da hin peyvên ku nayên fêmkirin hatine gotin.

Wekî xaleke cuda ya di navbera wesîqe û kilamên li ser vê mijarê da jî mirov dikare wê yekê destnîşan bike ku navê Emîn Paşa di wesîqeyan da pir derbas dibe, lê di kilaman da qet derbas nabe. Şûna wî, navê birayê wî Edoyê Hesên Axa derbas dibe.

Dema em li zimanê kilaman dinihêrin, em dibînin ku herçend bi eşkeryî nebe jî terefgîriyek xwe dide dest. Ji ber sedemên wekî şerê xwebixwetiyê û meseleyên hesas ên eşîrtiyê, dengbêj naçar mane ku terefgîriya xwe nerasterast îfade bikin. Di vê çarçoveyê da dema mijar bûye Huseyîn Paşa, dengbêjan sikût kiriye û dema mijar bûye Hesên Axa û lawên wî jî bi remz û teşbihan pesna wan dane û sedeqet û wefadariya mirovên wan derxistine pêş. Herweha dengbêjan di vî warî da bêtir cih dane Edoyê Hesên Axa û ew adeta derxistine asta leheng û qehremanên destanên Kurdî.

Wekî xala dawîn, li vir em dikarin wê yekê pêşniyaz bikin, lingê naqis ê ku me di destpêkê da amaje pê kir, divê di xebateke din da bê temamkirin da ku rastî û heqîqeta vê bûyera tarîxî bi awayekî objektîftir derkeve meydanê.

Çavkanî

Wesîqeyên Arşîva Osmanî

- BOA, DH.MKT, 1543/90 H-11-01-1306
BOA, DH.MKT, 1546/58 H-18-01-1306
BOA, BEO, 768/57565 H 08-11-1313
BOA, DH.ŞFR. 190/80 R 07-12-1312
BOA, MKT.MHM, 666/24 H-15-01-1313
BOA, BEO, 1033 77406 H-06-06-1315
BOA, BEO, 1034 77502 H-08-06-1315
BOA, DH.TMIK.M, 43/6 H-15-06-1315
BOA, DH.MKT, 2202/45 H-02-01-1317
BOA, BEO, 1312 98340 H-11-01-1317
BOA, DH.ŞFR, 372/9 R-07-08-1322
BOA, Y.MTV, 299/125 H-16-05-1325
BOA, BEO, 3091/231789 H-21-05-1325
BOA, DH.MKT, 1153/47 H-03-02-1325
BOA, DH.TMIK.M, 249/31 H-02-06-1325

Jêderên Çapkirî

- Alakom, R. (2009). *Torin Arîstokratên Serhedê* (Çapa 2yem). Stenbol: Avesta.
- Avyarov (1995). *Osmanlı-Rus ve İran Savaşlarında Kürtler 1801-1900*. Çev: Muhammed Varlı (Hoko Xanî), Ankara: Sîpan.
- Aydın, S. û Çiftçi, E. (2021). *İmparatorluğun Son Aşiret Sayımı Fihristü'l Aşâir Yorumlar ve Çeviriyazım*. İstanbul: İletişim.
- Bruinessen, M. V. (2010). *Ağa, Şeyh, Devlet*. İstanbul: İletişim.
- Çakır, İ. (2023). Mehmed Hurşîd Paşa'nın Seyâhatnâme-i Hudûd Adlı Eserine Göre Osmanlı-İran Sınır Aşiretleri: Celali, Zilanlı, Haydaranlı Ve Sıbki Aşiretleri. *İran Çalışmaları Dergisi*, 7(1), 127-150. <https://doi.org/10.33201/iranian.1230814>
- Çelebi, E. (1898). *Evliya Çelebi Seyahatnamesi*. 4. Cilt. Derseadet: İqdam Matbaası.
- Çelebi, E. (2010). *Günümüz Türkçesiyle Evliya Çelebi Seyahatnamesi*. 4. Cilt, 1. Kitap. İstanbul: Yapı Kredi.
- Çiftçi E. (2018). *Fragile Alliances in the Ottoman East: The Heyderan Tribe and the Emipre, 1820-1929*, *Phd. Dissertation*, Bilkent University.
- Delikaya, Ö. (2024). Navê Cihan, Mekanên Birê û Geliyê Zilan di Çanda Dengbêjiyê de. *Mukaddime*, 15(1), 15-40. <https://doi.org/10.19059/mukaddime.1453602>
- Demirci, S. û Çabuk, F. (2014). Celâli Kürt Eşkıyası: Bayezid Sancağı ve Osmanlı-Rus-İran Sınır Boylarında Celâli Kürt Aşireti'nin Eşkıyalık Faaliyetleri (1857-1909). *International Journal of History*, 6(6), 71-97.
- Ekinci, M. R. (2017). "1897 Tarihli Hamidiye Hafif Süvari Alayları Taksimatı". *Şarkiyat* 9/2, 703-724. <https://doi.org/10.26791/sarkiat.339530>.

- Elend, K. (2021). *Kimliği Terennüm Etmek Erivan Radyosu Kürtçe Yayını*. İstanbul: İletişim.
- Eraslan, C. (1997). Hamidiye Alayları, *İslam Ansiklopedisi, C. 15*. İstanbul: DİB Yayınları.
- Kaplan, Y. (2023). Ji Edebiyata Devkî ya Kurdî Serhatîyek Evînî: Salih û Kejê û Deqeke Çapkiri. *Mukaddime*, 14(1), 120-146. <https://doi.org/10.19059/mukaddime.1265178>
- Kaya, H. (2021). “18. Yüzyılda Erzurum Eyaleti’nde Yerel Siyaset Ve Yezidi Aşiretlerin Rollerini”. *Şarkiyat* 13/3, 971-987. <https://doi.org/10.26791/sarkiat.1000137>.
- Kaya, H. (2022). Diyarbekir’den Serhad’a Kadim Bir Aşiret: Zilan, *Aktör; Müttefik, Şaki Kürt Aşiretleri*, Der. Tuncay Şur-Yalçın Çakmak (s. 489-504). İstanbul: İletişim.
- Mehmed Hurşid Paşa (1997). *Seyahatname-i Hudud*. Çev. Alaatin Eser. İstanbul: Simurg.
- Subaşı, K. (2023). Fesad û Bêbext di Trajedîya Evînê da: Weku Nimûne Destanên Evîna Mêjûyî. *Mukaddime*, 14(1), 148-176. <https://doi.org/10.19059/mukaddime.1243035>
- Süphandağ, K. (2006). *Büyük Osmanlı Entrikası Hamidiye Alayları*. Stenbol: Weşanên Komal.
- Süphandağ, K. (2021). *Osmanlı Arşiv Belgelerinde Heyderan Aşireti ve Ağrı Direnişi*. İstanbul: Pel Yayınları.
- Sykes, M. (1908). The Kurdish Tribes of The Ottoman Empire. *The Journal of the Royal Anthropological Institute of Great Britain and Ireland*, 38, 451-486.
- Teyran, F. (2022). *Dîwan*. (Werger û Şîkar: Kadri Yıldırım, Çapa 2yem). T.C. Kültür ve Turizm Bakanlığı Kütüphaneler ve Yayımlar Genel Müdürlüğü Yayınları.
- Ulugana, S. (2022). *Kürt-Ermeni Coğrafyasının Sosyopolitik Dönüşümü (1908-1914) Halidiler, Hamidiyeliler, Bedirhaniler ve Taşnaklar*. İstanbul: İletişim.
- Ulugana, S. (2022). Şiddet Yüzyılı İçinde Dört Sınır Aşiret: Hesenan, Cibran, Pencînarın ve Xweytî (1837-1937), *Aktör; Müttefik, Şaki Kürt Aşiretleri*, Der. Tuncay Şur-Yalçın Çakmak (s. 317-350). İstanbul: İletişim.
- Yüksel, M. (2016). On The Borders of Turkish and Iranian Nation States: The Story of Ferzende and Besra. *Middle Eastern Studies*, 52, 656-676.
- Yüksel, M. (2019). Dilşa’nın Babasına Ağıt: Ruslar, Dengbêjler ve Bulanık Savaşı, Çağlayan, E. (ed.) “*Burası Muştur*”: *Tarih, Toplum, Kültür ve Edebiyat* (s. 325-358). İstanbul: Pınar Yayınları.
- Yüksel, M. (2023). Besra, Zarife, Gulnaz ve Diğerleri: Arşiv Belgeleri ve Kürtçe Sözlü Anlatılarda Kadınlar. *Toplumsal Tarih Akademi*(3), 136-141.
- Zekî Beg, M. E. (2002). *Dîroka Kurd û Kurdistanê*. Stenbol: Avesta.

Jêderên Online û Dîjîtal

Hunermend Aslıka Qadir:

<https://www.youtube.com/watch?v=BaHcIz5kUTI> (Guhdarîkirin, 07.01.2023).

Dengbêj Hecî Evdilkêrîmê Patnosê: <https://www.youtube.com/watch?v=0HbRCmmff4Q&t=623s> (Guhdarîkirin, 07.01.2023).

Dengbêj Maşelayê Mûşî:

<https://www.youtube.com/watch?v=u8QD0i--rTo> (Guhdarîkirin, 07.01.2023).

PÊVEK

Wergera bi kurdî ya têlxrafa Serasker Riza-1

Nimroya Arşîvê: Y.MTV.00299.00125.001

Meqamê Seraskerî/Mektûbê Qelemê Xusûsî

Di tezkîreya samiyeyê (sadaret) da ya ji Babê Eliyeyê hatiye şandin, hatiye diyarkirin ku di navbera serokên Eşîra Heyderan Mîrlîwa Huseyîn û herweha Emîn Paşa û Qaymeqam Elî Beg û mirovên wan da şerekî dijwar qewimiye, ji herdu aliyan gelek mirov hatine kuştin û birîndar bûne û herwesa heger bi awayekî bilez rê li rikeberiyê neyê girtin, neyartî dê têkeve dirûvekî dijwartir û bi beşdariya serokên eşîrên din va nexweşiyên hîn mezintir dê rû bidin û herwesa telgrafa ji hêla Wilayeta Erziromê verêkirî ya der heqê pêdiviya cezakirina curetkaran da hat şandin û wekî bersiv ji wilayeta navborî ra hat destnîşankirin ku ji bo rêlêgirtin û jinavbirina nexweşiyê û jiholêrakirina sedemên wê digel Muşîriyeta Mezin a Artêşa Humayûn a Çarem hevniwîsîn pêk were û herweha hat balkişandin ku ji hêla eskerî jî çî pêwîst e divê bilez were kirin û bi telgrafnameya xwe ya acîzane va me ji muşîriyeta navborî ra pêşniyaz kir û nivîsand ku wekî di tezkîreya samiyeyê da behskirî ye, çî pêwîst e divê bê kirin û encama wê jî bê nivîsîn û herweha sûreta telgrafnameya kesên navborî yê ji Wilayeta Erziromê, wekî pêvek hatiye erz û teqdîmkirin û di wê babetê da emr û ferman ya hezretî Padişah e.

16ê Cemazeyîlewela 1325an (k.) - 14ê Hezîrana 1323yan (r.) - 27ê Hezîrana 1907an (z.)

Serasker Riza

82

Wergera bi kurdî ya têlxrafa Serasker Riza-2

Nimroya Arşîvê: Y.MTV.00299.00125.002

Meqamê Seraskerî/Mektûbê Qelemê Xusûsî

Sûretê telgrafnameya bi şîfre ya dîrok 10ê Hezîrana 1323yan e ku ji Wilayeta Erziromê gihîşt Babê Eliyeyê

12ê Cemazeyîlewela 1325an (k.) - 10ê Hezîrana 1323yan (r.) - 23yê Hezîrana 1907an (z.)

Ji ber bicihkirina Resûl Axa a li Xamûrê ya ji hêla Mîrlîwa Huseyîn Paşa yê ji serokên eşîra Heyderî, di nav eşîrê da dijyayê û dijmintî peyda bû û li ser agahiya Huseyîn Paşayê navborî tevî çend sed siyariyên li dora xwe kom kirin ber bi Xamûrê bi rê ket, Wekîlê Fermandarê Lîwaya Hemîdiyeyê bi xwe bû navbeynkar û lihevanîn pêk anî û siyarî ji hev belav kirin. Lêbelê digel vê yekê ji ber ku Huseyîn Paşa cardin maiyeta xwe kom kir û ket nav tevgera dijminane, di navbera van û herweha mirovên Emîn Paşayê Heyderî û birayê wî Qaymeqam Elî Beg ê rûniştvanên qezaya Erdîşê da şerekî dijwar qewimî, ji herdu aliyan gelek mirov hatin kuştin û birîndar bûn û herwesa heger bi awayekî bilez rê li rikeberiyê neyê girtin, bi tûj û tundbûna neyariya ji zû da dewam dike û bi beşdariya serokên eşîrên din va nexweşiyên hîn mezintir dê rû bidin û di vê heyama ziraetê da hetta dê bibe sedema per û perîşanbûna şênîyên feqîr û belengaz ku ev yek di telgrafên Qaymeqamtîyên Qerekilîs û Dutaxê û Wekaleta Muteserrîfiya Bazîdê da hatiye destnîşankirin û

bi qandî vê pileya vî karî, cîbicîkirina tedbîrên eskerî zerûrî ye û rewş ji bo Muşîriyeta Mezin û Femandariya Lîwaya Yekem a navborî hatiye nivîsîn. Ev cure serokên eşîran ên ku bi saya serê Padişah bûne xwediyê şerefa wesfê erkan û femandarê eskeran, bi saîqeya cehalet û zordestiyê va li ser hidûd aramî û rihetiyê têk dibin û teşebusî xwînretinê dikin ku ev yek halekî pir kirêt û sosret e û teşebuskar heta bi lewnekî bi îbret neyên cezakirin, herçiqas bi şûn da rêlêgirtina dubarebûn û qewimînê ne mumkin be ji îcraya îcabî wabesteyî îradeya bilind e. Ferman.

KILAMA DELAL

Versiyona ji dengê dengbêj Maşelayê Mûşî:

Lo axawo şerekî li me çêbû li Gamêşvanê Tozîbelanê li devê avê
Eskerê Huseyîn Paşayê Heyderî giran e derketiye ji Patnosê xwe da navê
Min dî Edoyê Hesên Axa bi sê dangan bang dikir
Gelî hevalan çê bin çê bixebitin
Hûn ê lêxin Êskê Bozo Mûsê Zorav bikujin
Cinazê van xweşmêran bidine li ber tavê
Were hewarî hewarî hewar hewarî
Bavo îro li Gamêşvanê agir barî
Her çar gundê dora Kela Kudo bi serê min da mabû xirûxalî
Li ser serê eşîra Heydera da bûye gazî hewarî
Tu bala xwe bidê sala îsal orta Huseyn Paşayê Heyderî, Edoyê Hesên Axa bavo çawa bû neyarî
Hahê hahî
Lo axawo îro şerekî çêbû li Gamêşvanê wê bida yalê
Eskerê Zor Huseyn Paşayê Heyderî derketiye ji Patnosê bavo bi hezar e
Tu bala xwe bidê gula barûdê îro Edoyê Hesên Axa bi ser bavê Edo da zarezar e
Heyran wele cabekî hat orta nîvro esrê
Dibê Eliyê Hesên Axa bi du gula bavo lê birîndar e
Were ferman e ferman e ferman e mîrê min ferman e
Heyran îro mi go viya çi dem e çi dewran e
Eviya çi berf e çi baran e
Ji êvar da tê dengê qîz û bûkan îro lûbelûbê jinebiyan e
Hewara me li jorê mabû Rebê Alemê, li jêrê Edoyê Hesên Axayê kela deştê siwarê
Kurdo bavê Silêman e
Lo axawo şerekî çêbû li Gamêşvanê bi kereng e
Eskerê Huseyn Paşayê Heyderî derketiye ji Patnosê bavo rengbireng e
Mi dî Êskê Bozo bang dikir Mûsê Zorav
Lêxin Edoyê Hesên Axa bikujin êvar e gelo ro li me dereng e
Were hewarî hewarî hewar hewarî
Bavo îro li Gamêşvanê agir barî
Herçar gundê îro gelo Kela Kudo mabû xirûxalî
Li ser serê îro eşîra Heyderan da bûye gazî û hewarî
Tu bala xwe bidê orta Huseyn Paşayê Heyderî, Edoyê Hesên Axa bavo çawa bû neyarî

Lo axawo şerekî çêbû li Gamêşvanê berî bê ye
Mi di Êskê Bozo bang dikir Mûsê Zorav
Lawo îro çê bin çê bixebitin
Heyran wele ez du gula birîndar im destê min nagire qevda mîrata modolyê ye
Kesekî xêrxwazî xêra tune cabekî bihere Patnosê li ba Huseyn Paşayê Heyderî lawo mija rû
erdê ye
Were ferman e ferman e mîrê min ferman e
Heyran îro çî berf e çî baran e
Eva çî mij e çî dûman e
Ji êvar da tê kalekalê berx û miyan e
Tê zarîna qîz û bûkan lûbelûbê jinebiyan e
Hewara me li jorê mabû Rebê Alemê, li jêrê Edoyê Hesên Axayê kela deştê siwarê
Kurdo bavê Silêman e


Versiyona ji dengê hunermend Aslîka Qadirê:

Were hey delal, hey delal tu delal î
Delal qurban tu delal î
Were hey delal gazî ye xweş hewar e
Dora koşka bavê Hemîd girtine çar e çar nikale ye
Bi gotinê Elî Begê mîrê zirav bi gulê mawîzerê her du zenda birîndar e
Ne xwezil wê evdî ra ku Hesên Paşa Bavê Edo ra sê roj e bive dijmin û neyar e
Notlanî Çiyayê Sîpanê û Xelatê mij e û dûman e ser neyar da melû xwar be
Were hey delal, hey delal, hey delal tu delal î
Were hey delal, hey delal tu delal î
Delal qurban tu delal î
Delal qurban Camûşvanê wê çîman e
Bi gotinê patrondaşê Elî Begê mîrê zirav ji êvar da kîsî canfîda ne
Elî Begê erafê meydanê dikir gazî digo Simbo, Sêvo kurê min de rabin çê bin çê bixevtin
Wextê hewara me yê bê Edoyê Hesên Axa û taxana av û erdan e
Were hey delal, hey delal, hey delal tu delalî
Delal qurban şer qewimiye Camûşvanê beriya avê
Bi gotinê eskerê *kura savde şaşêla têne sitka qûya* gulla davên
Bi gotinê hatiye kuştinê Îskanê Zero firarê dewletê gula siyara
De wê çawa cinyazê vî maqûlî danîne Camûşvana kavil nav neyara berî tavê
Were hey delal, hey delal, hey delal tu delal î

Versiyona ji dengê dengbêj Hecî Evdilkerîmê Patnosî:

Delal hay delal hay delal hay delal hay delal hay delal hay delal
Delal hay delal delal hay delal hay delal î
Ez ê çî bikim her çar terefê Kela Gulduz axayê min mane xalî
Îja li ser serê Edoyê Hesên Axa bûye gazî û hewarî


Hele bala xwe binê derdê li ser derda yî
Orta Zor Huseyîn Paşayê Heyderî, Edoyê Hesên Axa bi resmen bavo bû neyarî
Bê axawo şereka li me qewimî Gamêşvana şewitî li derî avê
Lo maqûlo qaleka li me qewimî Gamêşvana kavil li derî avê
Eskerê Zor Huseyîn Paşa derket ji Patnosê
Bi sê birûtan ser ciya daye navê
Edoyê Hesên Axa kire gazî
Go, Fariz Mihemedê Şana, Evdilê Muslî bavê min bi lawo mêt bin çê bisekinin
Em ê bikujin Êskê Bozo, Mûsayê Zorav termê van zilaman bidem ber tîra tavê
Erê bê dewran e dewran e dewran e dewran e dewran e dewran e
Bira bala xwe binê çî terş e çî talan e
Cebilxanê Edoyê Hesên Axa ji kîsî canfîdan e
“Weyle wêlê” qîza li bûka, jinebiyan e
Gumana me li jor Xwedê ma mîrê mîra ye
Li jêrê micaciyê Kela Deştê siyarê Kurdo, Edoyê Hesên Axa bavê Silêman e



Y.MTV.00299.00125.001

Arşîva Osmanî: Y.MTV, 299/125/1

Telxrafa der heqê şerê Huseyîn Paşa û herweha Emîn Paşa û Qaymeqam Elî Beg da.



Y.MTV.00299.00125.002

Arşîva Osmanî: Y.MTV, 299/125/2

Telxrafa der heqê şerê Huseyîn Paşa û herweha Emîn Paşa û Qaymeqam Elî Beg da.



MARK SYKES'İN ESERLERİNDE KÜRT ALGISI*

Kenan BOZKURT

Têghiştina Kurdan di Berhemê Mark Sykes da Perception of Kurds in Mark Sykes's Works

Kenan BOZKURT

ORCID: 0000-0002-5227-0614 | kenan.bozkurt@batman.edu.tr
Assoc. Prof. Dr., Faculty of Arts and Sciences, Department of Turkish Language and Literature, Batman University, Türkiye.

Citation/Jêgir/Atf:

Bozkurt, K. (2024). Mark Sykes'in eserlerinde Kürt algısı. Kurdiyat (10), 89-119. DOI: 10.55118/kurdiyat.1541093

Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:

Research Article/Gotara Vekolînê/Araştırma Makalesi

Received/Dema Hatînê/Geliş Tarihi: 30.08.2024

Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 03.12.2024

Publication Date/Dema Weşandinê/Yayın Tarihi: 30.12.2024

Peer-Review/Hekemî/Hakemlik:

Double anonymized-Two External/Cot Nenas-Du ji derve/ Çift Tarafî
Kör Hakemlik-İki hakem

Plagiarism Checks/Kontrola Întihalê/Benzerlik Kontrolü:

This article has been scanned by iThenticate plagiarism website./
Ev gotar di malpera întihalê ya iThenticate ra hatiye derbaskirin./ Bu
makale iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır.

Ethical Statement/Beyana Etik/Etik Beyanı:

It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited./ Hatîye beyankirin ku di pêkanin û nivîsina vê xebatê de hemû rêzîkên zanistî û etik hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têkûz hatine referanskirin./ Bu çalîşma yapîlirken ve yazîlirken bilimsel ve etik ilkelere uyulduđu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduđu beyan edilir.

Conflicts of Interest/Nakokiyên Berjewendiyên/Çıkar Çatışması:

There is no conflict of interest between the author and any parties in the article./ Di gotarê de li navbera nivîskar û ti aliyên din nakokiya berjewendiyê tune ye./ Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.

Grant Support/Alîkariya Darayî/Maddî Destek:

The author acknowledge that they received no external funding in support of this research./ Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine./ Yazar, bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.

Copyright & License/Mafê Telifê & Destûr/Telif Hakkı & Lisanslama:

Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0./ Nivîskar li jer lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin./ Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

* Bu çalîşma, Zaxo Üniversitesi'nin 29-30 Nisan 2024 tarihinde düzenlediđi From the Unity to Fragmentation: The Role of the Tribes in Kurdistan (1514-1914) sempozyumunda Kürtçe olarak sunulan "Di Berhemên Mark Sykes da Eşîrên Kurdan û Taybetmediyên Wan" adlı bildirinin genişletilmiş Türkçe çevrisidir.

Özet

Bu çalışma; İngiliz siyasetçi, casus, diplomat, asker, yazar ve gezgin Mark Sykes'in eserlerinden hareketle onun Kürtlere dair tespitlerini ve bakış açısını irdeleme amacıyla hazırlanmıştır. Osmanlı, Kürt ve Arapların yakın tarihinde çok önemli bir yere sahip olan Sykes, I. Dünya Savaşı sonrası Osmanlı İmparatorluğu'nun yıkıldığı dönemde Ortadoğu'nun sınırlarının çizilmesinde önemli rol oynayan Sykes-Picot Antlaşması'nın mimarlarından biridir. Zira Sykes-Picot Antlaşması, Osmanlı İmparatorluğu topraklarının nasıl paylaşılacağına dair özel bir plan içeriyordu. Bu süreçte Kürtler, anlaşmanın dışında bırakılmış ve yaşadıkları topraklar komşu devletler arasında paylaşılmıştır. Kürtler arasında umutsuzluk ve öfke yaratan bu anlaşma, Kürtlerin bağımsızlık kazanmasını engellediği gibi onlarla yaşadıkları ülkeler arasında siyasi, sosyal ve kültürel çatışmaların başlamasına neden olmuştur. Bu durum, büyük acıların yaşanmasına yol açmıştır. Bu anlamda Kürtlerin kaderini şekillendiren bir anlaşmanın mimarı olan bir kimsenin o millete dair algısı, anlaşmaya dair daha iyi bilgi edinmeyi sağlayacaktır. Bu amaçla da Sykes'in "*Beş Türk Eyaletine Doğru, Halifelerin Son Mirası, Darü'l-İslam*" adlı kitaplarından ve "*The Kurdish Tribes of the Ottoman Empire ve Journeys in North Mesopotamia I-II*" adlı makalelerinden hareketle onun Kürtlere dair görüşleri irdelenmiştir.

Anahtar Kelimeler: Osmanlı imparatorluğu, Kürtler, Kürt aşiretler, Kürt algısı, Mark Sykes.

Kurte

Ev lêkolîn; li ser xebatên Mark Sykes ku siyasetmedar, sîxûr, dîplomat, leşker, nivîskar û gerokê Brîtanî ye, ji bo lêkolîn û nêrîna wî ya li ser Kurdan hate amadekirin. Sykes di dîroka nêz a Osmanî, Kurd û Ereban da xwedî cihêkî giring e. Ew, yek ji mîmarên peymanana Sykes-Picotê ye. Ev peyman, piştî Şerê Cihanê yê Yekem di dema hilweşandina împaratoriya Osmanî da bi armanca xêzkirina sînorê Rojhilata Navîn hatiye înzekirin. Di peymanana Sykes-Picot da planeke taybet hebû ku ew ji li ser parvekirina axa împaratoriya Osmanî bû. Kurd dervêyê vê peymanê hatibû girtin û ev ji bûbû sedema di nav dewletên derûdor da parçekirina welatê Kurdan. Ev peyman ku di nav Kurdan da bêhêvîti û hêrs pêk anîbû, nehiştibû ku Kurd serxwebûna xwe bi dest bixin. Ev rewş, bûbû sedema êşên mezin û destpêkirina nakokiyên siyasî, civakî û çandî di navbera Kurdan da û herwiha li welatên ku lê diman. Di vî warî da têgihîştina kesê ku mîmarê peymanê ye ku çarenûsa neteweyekê derbarê wî miletî da çêdike, dê derbarê peymanê da agahiyên çêtir bide. Ji bo vê yekê, dîtînen Sykes ên li ser Kurdan li ser bingeha pirtûkên wî yên bi navê "*Through Five Turkish Provinces, The Caliphs' Last Heritage: A Short History of The Turkish Empire, Daru'l-Islam*" û gotarên wî yên "*The Kurdish Tribes of the Ottoman Empire û Journeys in North Mesopotamia I-II*" hatine lêkolînkirin.

Peyvên Sereke: Împaratoriya Osmanî, Kurd, Eşîrên kurdan, Têgihana kurd, Mark Sykes.

Abstract

This study, based on the works of British politician, spy, diplomat, soldier, writer and traveler Mark Sykes, was prepared to examine his findings and perspective on the Kurds. Sykes, who has a significant place in the recent history of the Ottomans, Kurds, and Arabs, is one of the architects of the Sykes-Picot Agreement, which played an important role in drawing the borders of the Middle East during the collapse of the Ottoman Empire after World War I. Because the Sykes-Picot Agreement contained a specific plan for how the lands of the Ottoman Empire would be distributed. In this process, this agreement, which was signed without taking into account the independence goals of the Kurds, caused the division of their lands. This agreement, which created despair and anger among the Kurds, prevented the Kurds from gaining independence and led to the beginning of political, social, and cultural conflicts between the Kurds and the countries they live in. This situation led to great suffering. In this sense, the perception of a person who is the architect of an agreement that shapes the destiny of a nation regarding that nation will provide better information about the agreement. For this purpose, Sykes's views on the Kurds were examined based on his books "*Through Five Turkish Provinces, The Caliphs' Last Heritage: A Short History of the Turkish Empire, Daru'l-Islam*" and his articles "*The Kurdish Tribes of The Ottoman Empire, Journeys in North Mesopotamia I-II*".

Keywords: Ottoman empire, Kurds, Kurdish tribes, perception of Kurdish, Mark Sykes.

Giriş

Cesaret, sözünün eri olma, misafirperverlik, yiğitlik, hoşgörülü olma, beceriklilik, kadınlarının özgür oluşu ve cesareti, kadına duydukları saygı karakterlerinin temel özelliğidir. Ancak onların karakterinde olumsuzluklar da vardır. Zira Sykes'e göre Kürtler; saf ve geri kalmış bir ırktır. Bu da onların kolay bir şekilde idare edilmelerini, hatta sömürülmelerini sağlar. Zalim, kan dökücü, hırsız, yağmacı, vahşi bir karaktere sahiptirler. Hırsızlık yapmak, başkalarını yağmalamak, onlar için günlük yaşamın bir parçasıdır. Fakat başkalarını ya da düşmanlarını yağmalamaktan ziyade birbirlerine zarar verirler. Bunun temel nedeni de onların genlerine işleyen savaşçı özellikleridir. Silaha tutkun olan bu halk, savaşmayı bir eğlence olarak görür. Ona göre bu özellikleri, onların kendi aralarında sürekli çekişmelerine, birbirinin kanını dökmelerine ve birbirleriyle uzun sürecek kan davaları yaşamalarına neden olur. Bu durum, ona göre milli bir kimliğin oluşmasının önündeki en büyük engellerden biridir. Sonuç olarak Sykes'e göre Kürtler tüm bu olumsuzluklara rağmen birçok güzelliği içinde barındıran Ortadoğu'nun en kadim ve seçkin ırklarından biridir.

Kaynakça

- Aslanmirza, Ö. (2024). *Britanya, Orta Doğu Ve Mark Sykes Üçgeninde İstihbari Bilgi Üretimi*. (Yayınlanmamış Doktora Tezi). Kocaeli Üniversitesi.
- Bozkurt, G. (2003). Sevr'i Bilmek Lozan'ı Anlamak. *Atatürk Araştırmaları Merkezi Dergisi*, XIX (56), 483-505.
- Cemal, S. (2023). İngiliz ve Fransız Arşiv Belgeleriyle Sevr-Lozan-Musul'da Kürtler. *İstanbul: Nübihar*.
- Ciğerli, S., Le Saout, D. (2022). *Fransız Diplomatik Arşivlerinde Kürtler Kürt Milliyetçiliğinin Ortaya Çıkışı (1874-1945)*. İstanbul: Avesta.
- Çağlayan, K. T. (2010). "İngiltere'nin Kürt Politikası"nın Van Vilayetindeki Etkileri (1919-1920). *Ataturk*, 3 (3), 37-48.
- Ehmedê Xanî (2005). *Mem û Zîn* (Amedekar M. Emin Bozarşan). İstanbul: Doz.
- Ekinci, M. R. (2021). Mîr-i Aşiretten Eşkıyalığa: Aşiret Hanedan Üyelerinin Makbulden Madunlaşma Sürecine Bakış 1800-1855. *Nübihar Akademi*, 4 (16), 143-168.
- Erim, N. (1953). *Devletlerarası Hukuku Ve Siyasi Tarih Metinleri Cilt: I (Osmanlı İmparatorluğu Andlaşmaları)*. Ankara: Ankara Üniversitesi Hukuk Fakültesi Yayınları.
- Gümüş, E. (2019). *Devlet ve Asi -18. Yüzyıl Ortalarında Osmanlı Diyarbekir'inde Eşkıyalık*. Ankara: İlahiyat.
- Hakan, S. (2023). *Cumhuriyet'e Giderken Kürtler (1920-1923)*. İstanbul: İletişim.
- Harvey, D. (1982). *British Imperialism, In The Middle East Of World War One: A Psychosocial History Of The Arab Revolt*. The University of Texas At Austin.
- James, L. (2004). *Sykes, Sir Mark, Sixth Borneo (1879-1919)*. Oxford Dictionary of National Biography: İngiltere, Oxford University Publication.
- Karaca, T. N. (2018). *Sınırları Çizen Kadın İngiliz Casus Gertrude Bell*. İstanbul: Kronik.
- Kurubaş, E. (1998). Sevr Sürecinde Yapılan Uluslararası Toplantılarda Kürt Konusu ve İngile-

- re'nin Politikası. *Süleyman Demirel Üniversitesi İktisadi ve İdari Bilimler Dergisi*, 3, 199-212.
- Küçük, C. (2010). Sykes-Picot Antlaşması. *DİA*. içinde (c. 38, 204-206). İstanbul: Diyanet Vakfı.
- Leslie, S. (1923). *Mark Sykes: His Life and Letters*. London: Cassell and Copmany, LTD.
- Mela Mehmûdê Bayezîdî. (2012). *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*. İstanbul: Nûbihar.
- Muhammed Emin Zeki Beg. (2018). *Kürt ve Kürdistan Tarihi*. İstanbul: Nûbihar.
- Özsoy, R. (2024). *Sir Mark Sykes 'ın Osmanlı Devletindeki Faaliyetleri*. (Yayınlanmamış Doktora Tezi). Erciyes Üniversitesi.
- Özsoy, R.&Kartın, C. (2021). "Sir Mark Sykes'in Ortadoğu İzlenimlerine Kısa Bir Bakış." *Sinop Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 5 (2), 341-364.
- Sazak, S. (1988). *Sir Mark Sykes ve 1900-1920 Arası İngiltere'nin Ortadoğu Politikasına Etkileri*. (Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Ankara Üniversitesi.
- Sükan, B. (2024). I. Dünya Savaşı Sonrası Dönemde Sykes-Picot Antlaşması Kaynaklı Sorunlar. *Ankara Üniversitesi Türk İnkılâp Tarihi Enstitüsü Atatürk Yolu Dergisi/Journal of Atatürk Yolu*, 74 (2024), 199-214.
- Selvi, H. (2010). İngiltere'nin Musul Politikası Karşısında Osmanlı Devleti ve Bölge Aşiretleri (1918-1920). *Belleten*, 74 (274), 789-832
- Sykes, M. (1907). Journeys in North Mesopotamia (Continued). *The Geographical Journal*, 30 (4), 384-398.
- Sykes, M. (1907). Journeys in North Mesopotamia. *The Geographical Journal*, 30 (3), 237-254.
- Sykes, M. (1908). The Kurdish Tribes of the Ottoman Empire. *The Journal of the Royal Anthropological Institute of Great Britain and Ireland*, 38, 451-486.
- Sykes, M. (1915). *The Caliphs' Last Heritage: A Short History Of The Turkish Empire*. London: Macmillan and Co.
- Sykes, M. (2000). *Darü'l-İslam-Osmanlı'nın Şark Bölgesinde Seyahat* (Çev. Hikmet İlhan). İstanbul: Avesta.
- Sykes, M. (2013). *Beş Türk Eyaletine Doğru* (Çev. Hilal Sağdıç, Büşra Aycibin). İstanbul: İnsan.
- Şahin, İ-Şahin, C.-Şükür, İ. (2015). Ortadoğu'da Emperyalist Güçlerin Gizli Oyunu: Sykes-Picot Antlaşması. *The Journal of Academic Social Science Studies*, 38 (2), 241-262.
- Üner, M. E. (2009). *Aşiret, Eşkîya ve Devlet*. İstanbul: Yalın.
- Yaşar, A.-Akengin, H. (2022). İngiliz Sömürgeciliği ile Emperyalizminin Gelişimi ve Özellikleri. *SDÜ Fen-Edebiyat Fakültesi Sosyal Bilimler Dergisi*, Aralık, 57, 426-444.
- Yel, S.-Kartın, C. (2013) Osmanlı Son Döneminden Cumhuriyetin İlk Yıllarına İki İngiliz'in, Sykes ve Noel Anıları. *Kuruluşunda 90. Yılına Türkiye Cumhuriyeti Sempozyumu*, Ankara 23-25 Aralık 2013, 1, 107-175.



VEKOLÎNEK LI SER CUREYÊN BÊJEYÊN METINÊN DI PIRTÛKA DERSA KURMANCÎ YA POLA HEŞTEM DA*

Bayram GÖKHAN & Kenan BULUT

Sekizinci Sınıf Kurmancî Ders Kitabındaki Metinlerde
Yer Alan Kelime Türleri Üzerine Bir İnceleme
A Review on The Word Types in The Texts in
The Eighth Grade Kurmancî Textbook

Bayram GÖKHAN

ORCID: 0009-0000-7977-6490 | gokhanbayrem@gmail.com
Master's Degree (Kurdish Language and Culture), Teacher (MEB),
Van, Türkiye.

Kenan BULUT

ORCID: 0000-0003-4771-0459 | kenanbulut80@yyu.edu.tr
Assoc. Prof. Dr., Faculty of Education, Van Yüzüncü Yıl University,
Türkiye.

Citation/Jêgir/Atf:

Gökhan, B. & Bulut, K. (2024). Vekolînek li ser cureyên bêjeyên metinên di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da. Kurdiyat (10), 121-142. DOI: 10.55118/kurdiyat.1588983

Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:

Research Article/Gotara Vekolîne/Araştırma Makalesi

Received/Dema Hatîne/Geliş Tarihi: 21.11.2024

Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 26.12.2024

Publication Date/Dema Weşandinê/Yayın Tarihi: 30.12.2024

Peer-Review/Hekemtî/Hakemlik:

Double anonymized-Two External/Cot Nenas-Du ji derve/ Çift Tarafî
Kör Hakemlik-İki hakem

Plagiarism Checks/Kontrola Întihalê/Benzerlik Kontrolü:

This article has been scanned by iThenticate plagiarism website./
Ev gotar di malpera întihalê ya iThenticate ra hatiye derbaskirin./ Bu
makale iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır.

Ethical Statement/Beyana Etik/Etik Beyanı:

It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited./ Hatîye beyankirin ku di pêkanin û nivîsina vê xebatê de hemû rêzîkên zanistî û etik hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têkûz hatine referanskirin./ Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.

Conflicts of Interest/Nakokiyên Berjewendiyên/Çıkar Çatışması:

There is no conflict of interest between the author and any parties in the article./ Di gotarê de li navbera nivîskar û ti aliyên din nakokiya berjewendiyê tune ye./ Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.

Grant Support/Alikariya Darayî/Maddî Destek:

The authors acknowledge that they received no external funding in support of this research./ Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê vekolîne ti fonên derveyî wernegirtine./ Yazarlar, bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.

Copyright & License/Mafê Telifê & Destûr/Telif Hakkı & Lisanslama:

Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0./ Nivîskar li jer lisansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin./ Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

* Ev gotar, ji teza masterê ya bi navê "Vekolînek li ser Cureyên Bêjeyên di Metinên Pirtûka Dersa Kurmancî ya Pola Heştem da Cih Dîgîrin" ve hatîye adaptetirin.

Kurte

Di bin banê Wezareta Perwerdeya Neteweyî da ji sala 2012an pê ve perwerdeya hin zimanan wek dersên hilbijêrkî hate pêşkêşkirin. Yek ji van zimanan jî kurdî ye ku bi zaravayên xwe kurmancî û zazakî di nav van dersan da cih digire. Îro di xwendîgehên navîn da ango ji pêlika pola pêncem heta pêlika pola heştem darsa kurmancî yan jî zazakî bi awayê hilbijêrkî dikare bê vekirin. Armanca vê xebatê, *vekolîna cureyên bêjeyên metinên di pirtûka darsa kurmancî ya pola heştem da ye*. Di vê xebatê da, li gor cureyên bêjeyan dabeşbûna bêjeyên di metinên berhema navborî da, hatiye tesbîtîkirin. Ev xebat li gor *rêbaza vekolîna çawanî (qualitative research methods)* hatiye rêvebirin. Di xebatê da dane bi rêya *analîza dokumentê (document analysis)* hatine bidestxistin. Materyala xebatê, 35 metinên di pirtûka darsa kurmancî ya pola heştem da ne ku aîde weşanên Wezareta Perwerdeya Neteweyî ne. Daneyên hatine bidestxistin, bi rêya *analîza teswîrî (descriptive analysis)* hatine analîzkirin, bi tabloyan hatine pêşkêşkirin û şirovekirin. Di dawîya xebatê da metinên di pirtûka darsa kurmancî ya pola heştem da serhev 12594 (bi tevî dubareyan) bêje hatine tesbîtîkirin. Di hemû metinan da 4347 navdêr, 2165 lêker, 775 rengdêr, 925 hoker, 1714 cihnav, 1313 daçek, 1226 gihanek û 129 baneşan hatine bikaranîn. Tê dîtin ku metinên di pirtûka darsa kurmancî ya pola heştem da herî zêde navdêr herî kêr baneşan hatine bikaranîn. Di metinên agahîder da 9781, yê hîkayetî da 2134 û helbestan da 679 bêje hatine bikaranîn. Di dawîya xebatê da, di serî da ji amadekar û sepînerên bernamêya hînkirinê û nivîskarên pirtûka darsê, paşê jî ji kes û sazîyên pêwendîdar ra hin pêşniyaz hatine kirin.

Peyvên Sereke: Vekolîn, Pirtûka darsa kurmancî, Pola heştem, Metin, Cureyên bêjeyan.

Abstract

Since 2012, a number of languages have been taught as elective courses within the Ministry of National Education. One such example is the Kurdish course, which is taught in Kurmanji and Zazaki dialects. Today, in secondary schools, that is, in the five to eight grades, Kurmanji or Zazaki courses can be opened as electives. The purpose of this study is *to examine the word types in the texts in the eighth-grade Kurmanji textbook*. The present study employs a *qualitative research method*, and its findings reveal the distribution of words in the texts of the work in question according to word types. The data in the study was collected through *document analysis*. The material of the study consists of 35 texts in the eighth-grade Kurmanji textbook belonging to MEB Publications. The data obtained was analyzed using *descriptive analysis*, presented in tables and interpreted. At the end of the study, a total of 12594 words (with repetitions) were identified in the texts in the eighth grade Kurmanji textbook. The analysis revealed that 4347 nouns, 2165 verbs, 775 adjectives, 925 adverbs, 1714 pronouns, 1313 prepositions, 1226 conjunctions and 129 exclamations were used in all texts. In the texts derived from the eighth grade Kurmanji textbook, nouns were identified as the most common and exclamation words were the least common. It was found that 9781 words were used in informative texts, 2134 in narrative texts and 679 in poems. At the end of the study, various suggestions were made to relevant individuals and institutions, especially to curriculum preparers and implementers, as well as textbook writers.

Keywords: Examination, Kurmanji textbook, Eighth grade, Text, Word types.

Özet

2012 yılından itibaren Milli Eğitim Bakanlığı bünyesinde bazı diller seçmeli ders olarak okutulmaya başlanmıştır. Bunlardan biri de Kurmancî ve Zazakî lehçeleriyle okutulan Kürtçe dersi'dir. Bugün ortaokullarda yani beşinci sınıftan sekizinci sınıfa kadar olan kademelerde Kurmancî veya Zazakî dersi seçmeli olarak açılabilir. Bu çalışmanın amacı, *sekizinci sınıf Kurmancî ders kitabındaki metinlerde yer alan kelime türlerini incelemektir*. Çalışmada söz konusu eserde yer alan metinlerdeki kelimelerin sözcük türlerine göre dağılımı ortaya konulmuştur. Bu çalışma *nitel araştırma yöntemiyle* yürütülmüştür. Araş-

tirmada veriler *doküman analizi* yoluyla toplanmıştır. Çalışmanın materyalini, MEB Yayınları'na ait sekizinci sınıf Kurmancî ders kitabında yer alan 35 metin oluşturmaktadır. Elde edilen veriler, *betimsel analizle* çözümlenmiş, tablolar halinde sunulmuş ve yorumlanmıştır. Çalışmanın sonunda sekizinci sınıf Kurmancî ders kitabındaki metinlerde toplam 12594 (tekrarlarla birlikte) kelime belirlenmiştir. Bütün metinlerde 4347 isim, 2165 fiil, 775 sıfat, 925 zarf, 1714 zamir, 1313 edat, 1226 bağlaç ve 129 ünlemin kullanıldığı tespit edilmiştir. Sekizinci sınıf Kurmancî ders kitabındaki metinlerde en çok isim, en az ise ünlem türündeki kelimelere rastlanmıştır. Bilgilendirici metinlerde 9781, öyküleyici metinlerde 2134 ve şiirlerde ise 679 kelime kullanıldığı belirlenmiştir. Çalışmanın sonunda öğretim programı hazırlayıcıları ve uygulayıcılarıyla ders kitabı yazarları başta olmak üzere ilgili kişi ve kurumlara çeşitli önerilerde bulunulmuştur.

Anahtar Kelimeler: İnceleme, Kurmancî ders kitabı, Sekizinci sınıf, Metin, Sözcük türleri.

Destpêk

Bêje yekeyeka ziman e ku ji yek an jî çend morfemên ku bi hev ve girêdayî ne, pêk tê. Xwedî nirxek dengî ye û mana lê tê barkirin. Bêje ji yek an jî çend komên dangan pêk tê. Dema ku di navbera kesên heman zimanî diaxivin da tê bikaranîn bi tena serê xwe di hişê wan da, beramberî têgihêkê şênber an jî têgihêkê razber tê ku hest û ramanekê nîşan dide. Herweha yekeyeka zimanî ye ku têkilîyekê di navbera têgihên şênber û razber da saz dike. Ji bêjeyê ra di zimannasîyê da şanîker (indicator) tê gotin. Şanîker; bi awayekî giştî ew nîşanek e ku dikeve şûna tişteke, manayekê yan jî nirxekê din û li şûna wê tê bikaranîn (Hengirmen, 1999). Loma bêjeyên di ziman da şanîker in ku cihê tişt an jî têgihan digirin. Giringtirîn hêmana ziman bêje, ji tîp û kîteyan pêk tê. Mirov dema ku ziman bi kar tîne bi alîkarîya bêjeyan tiştên ku dixwîne û guhdarî dike, manadar dike, gotinên xwe dibêje û xwe bi nivîskî îfade dike. Bêje, ji çend tîpên ango herfên bi hev ra manayeka serbixwe didin ra tê gotin. Li pêşî û paşîya bêjeyê valahî heye. Di nava hevokê da dibe ku qertafan bigire yan jî negire. Ji hêmanên hevokê cuda tên gotin (İlmer, Kocaman, & Özsoy, 2011). Di kurmancî da cureyên bêjeyan di du koman da tên nîşandan: Nav û lêker. Ji bêjeyên ku heyber û têgihan didin nasîn ra nav tê gotin. Loma navdêr, rengdêr, hoker, daçek, cihnav, gihanek û baneşan, di bin banê navê da tên komkirin. Navdêr di xwe da liv û tevgerê nahewînî lê lêker di hewînî (Baran, 2012). Cudahîya sereke ya di navbera nav û lêkerê da ev e.

Bêjeya metinê di Fransîzî da bi “têxe”yê tê îfadekirin û tê manaya honandinê. Rehê vê bêjeyê digihije latînî û tê manaya qumaşê. Çawa ku qumaş bi honandina benikan çê dibe, metin jî bi honandina hevok û paragrafan derdikeve holê (Akbayır, 2007). Di metinan da hevokên bihonak li dû hev tên û bi vî awayî paragrafên manadar çê dikin. Di navbera du paragrafên li dû hev da divê pêwendî hebe. Rêzehevokên li dû hev manayeka tevahî didin, metin in. Rêzêkirina van hevokan xwe bi xwe çê nabe, nivîskar bi zanebûn û li gor rêzeka mentiqî saz dike hevokên xwe (Akbayır, 2007). Bi bêjeya metinê, em nivîsên ku ji gelek paragrafan pêk tên û xwedî fikreka sereke ne, fahm dikin. Herweha beşên pirtûkekê û gotar jî metin in (Akyol, 2006). Bûyer an jî mijarek dema ku bi alîkarîya ziman bi nivîskî yan jî devkî tê gotin ew dibe metin. Ji bo fahmkirin û ravekirina mijar an jî bûyereke mirov bêje, têgih, biwêj, gotinên pêşîyan, hevok û paragrafan bi kar tîne. Ji koma van gotinan ra metin tê gotin (Çetişli, 2006). Metin, ziman şênber dikin. Ziman ji dangan, metin ji tîp, kîte, bêje, hevok û paragrafan pêk tê. Metin, navenda qadên hînbûnê (guhdarîkirin/temaşekirin, xwendin, axiftin û nivîsînê) ye. Di senifandina metinan da gelek nêrînên ji hev cuda

hene. Li gor Adalı (2011), sê cureyên metinan hene: metinên çêkirî, metinên girêdayî jîyana rasteqîn û metinên ku bi piranî ji fikr û agahîyan pêk tên. Metin li gor cureyên xwe hînger, agahîder û jîyanzêdeker in (Özdemir, 2004). Cureyên metinan; nivîsên formî, metinên hînger, cureyên edebî ne (Aktaş & Gündüz, 2004). Metina pala xwe dide bûyerê, metina pala xwe dide fikrê û metina pala xwe dide hestê sê cureyên metinan in (Cemiloğlu, 2004). Metin li gor veguhastin û vesazkirina xwe tên senifandin. Metinên bi rêya gotinê tên veguhastin ra metinên devkî, yên bi rêya nivîsê tên veguhastin ra metinên nivîskî û yên bi rêya şekil, wêne û grafîkan tên veguhastin ra metinên dîtbarî tê gotin. Li gor vesazkirina şeklî roman, çîrok, gotar, bîranîn, helbest û hwd. tê gotin; li gor asta mentiqî yên ku bi mentiqekî sade hatine nivîsandin ra metinên sade, yên ku bi mentiqekî têkilhev hatine nivîsandin ra metinên giran an jî metinên asta jor tên gotin. Li gel wan li gor têkilîya wan a bi rastîyê ra, erk û armanca nivîsandina wan jî tên senifandin.

Wezaretê Perwerdeya Neteweyî metin di bernameyên hînkirina tirkî ya 2006 û 2015an da weha senifandiye;

- a) **Metinên hîkayetî:** Cureyên xwedî vegotineka hîkayetî ne. Cureyên edebî çîrok, roman, şano, çîrvanok, fabl, destan daxilî vê komê ne.
- b) **Metinên agahîder:** Metinên berhema fikrekê ne. Nêrîn bo kesan tên veguhastin an jî fikrekê tê çespendin di van metinên edebî da. Gotar, qunciknivîs, ceribandin, nivîsa vekolînê, rexne, hevpeyvîn û roportaj di vê komê da ne.
- c) **Helbest:** Di van metinan da bêhtir nivîskar dixwaze hestên xwe veguhêze kesê li hemberê xwe. Cureyên helbestan li gor mijara xwe bi navên lîrîk, epîk, dîdaktik, satîrîk û pastoral tên senifandin.

Pêvajoya hînkirinê ji pêkhateyên wekî cih, mamosta, xwendekar û materyalên hînkirinê pêk tê. Pêvajoyeka kêrhatî, girêdayî lihevhatina van pêkhateyan e. Ji berhema çapkirî ya ku ji bo armanca hînkirinê tê bikaranîn, mijara wê li gor rêzikên bernameya hînkirinê hatiye amadekirin û di hemû sazîyên perwerdeya bihonak û berbelav da tê bikaranîn ra pirtûka dersê tê gotin (MEB, 1995). Çawanîya pirtûkên dersê li gor talîmatnameya di derbareyê çawanîya pirtûkan da, di bin navê serenava ziman, vegotin û şêwazê da hatiye ravekirin. Pirtûkên dersê di warê perwerde û hînkirinê da çavkanîyên giring in ku ji demên berê heta niha tên bikaranîn. Dikare bê gotin ku dîroka pirtûkên dersê xwe digihîne 4000 sal berî zayînê (Alkan, 1979). Di dawiya sedsala yekê da, teknolojî hinekî din bi pêş ket û di warê pirtûkên dersê da şoreşeka nû pêk hat. Dema ku cîhana nû pêşveçûna xwe ya bilez didomand, pêşketina çêkirina pirtûkan berdewam bû û di sala 1440an da ji aliyê Gutenbergê ve îcadkirina çapxaneyê roleka mezin di derketina berhemên çapkirî da lîst. Berhema wî ya bi navê *Mainz Mezamiri* yekem pirtûka çapkirî ye û di sala 1457an da li Almaniyayê li bajarê Mainzê hate çapkirin. Bi demê ra, pirtûkên dersê bi wêne hatine çapkirin û bi awayên pir cuda bi pêş ketin (Kaya, 2006). Pirtûkên dersê amûrên çapkirî ne ku mijarên dersê bi şeklekî rêzîn û rast, ji bo ku xwendekar xwe bi xwe hîn bibin û li gor bernameyên perwerde û hînkirinê yên dewletan, tên amadekirin (Çakır, 1997). Sedemên bikaranîna pirtûkên dersê hene. Sedema yekem, bi awayekî birêkûpêk rêvebirina çalakîyên dersê ye. Armanca, naverok, çalakî û nirxandinên li gor bernameya perwerdeyê, di pirtûkê da bi awayekî rêzîn cih digirin. Sedema duyem wek amûrekê bikaranîna pirtûka dersê ye. Sedema sêyem, ji ber ku kêrhatî ne ji aliyê ma-

mostayan ve tèn tercihkirin (Şahin & Yıldırım, 1999). Di roja me da teknolojîyên hînkirinê û materyalên dersê herçiqas gelek û pêşketî bin jî, hêj jî kes nikare bi temamî piştî xwe bide pirtûkên dersê. Pirtûkên dersê ji zûda ye, ji bo ku kes di perwerdeyê da serkeftî bibe, wek amûreka sereke tèn bikaranîn (Seguin, 1989). Wek materyaleka dersê, ji bo hemû pêlikên hînkirinê gelekî giring e. Di navbera xwendekar û mamosta da xala hevpar e. Pirtûkên dersê, hevterîbê bernameya hînkirinê na xwendekaran tèn amadekirin û ji aliyê sazîyekê ve tèn erêkirin (Gülersoy, 2013).

Bername, projeyek e ku beşên karekê li gel rêz û wextê van beşan dide nîşandan. Bername, zarokên ku diçine xwendîgehê, li gor armancên perwerdeyê digihîne. Motivasyona zarokan zêde dike, bala wan dikişîne û hemû karûbarên perwerdeyê rêzîn dike. Bername armancan dîyar dike, karen perwerdeyê li gor destkeftîyên ku tèn xwastin organîze dike, plansazîya pêvajoyê saz dike, çalaki û nirxandinan aşkera dike. Bername ji ber pêdivîyên nû an jî kêmasîyên di bernameya kevin da derdikevin holê, diguherin. Dema ku bername tèn çêkirin digel pêdivîyên îroyîn, armancên dahatûyê jî li ber çavan tèn girtin. Di navbera bernameyên perwerde û bernameyên hînkirinê da cudahî hene. Bernameya perwerdeyê hemû çalakîyên hundirîn an jî derveyîn ên xwendîgehê an jî sazîyeka perwerdeyê di xwe da dihewîne. Bernameya hînkirinê, qonaxên hînkirinê yên wekî dem, armanc û naverokê aşkera dike (Tan, 2007). Bernameya hînkirinê darsa kurdî ji bo polên 5, 6, 7 û 8em û zaravayên kurmancî û zazakî hatiye amadekirin. Armanca dersê, ji bo xwendekaran pêşxistina şîyanên ragihandinê yên bingeşîn e. Ji bilî pêşxistina şîyanên ragihandinê yên bingeşîn, zêdekirina zanînen wan jî wek armanc hatiye dîyarkirin. Di amadekirina bernameya darsa kurdî da, qonaxên Metina Serlêdana Hevpar a Evropayê ya ji bo Zimanan li ber çavhan hatiye girtin. Astên ku di metina navborî da hatine dîyarkirin herweha modûler in jî. Prensîpên hînkirinê yên her qonaxê li ber çavan hatiye girtin û ji hêsânê ber bi zorê, ji basîte ber bi tevlihevê, ji nêzîkê ber bi dûrê, ji şênberê ber bi razberê, ji ya tê zanîn ber bi ya nayê zanîn ve diçe. Bi vî awayî qonaxên ku hatine dîyarkirin, rê didin ku xwendekarên pêlika polên wan ji hev cuda bi hev ra hîn bibin. Wek mînak, xwendekarekê pola pêncem û xwendekarekê pola heştem eger ku cara pêşîn darsa kurdî hîlbijartibin dikarin di heman komê da asta yekem bistînin. Bi vî rengî xwendekar dikare di xwendîgeha navîn da salekê yan jî çar salan darsa kurdî hîlbijêre.

Bernameya hînkirinê darsa kurdî ya li gor Armancên Sereke û Prensîpên Bingeşîn a Perwerdeya Neteweyî ya Tirkî, ku di Qanûna Bingeşîn a Perwerdeya Neteweyî ya bi jimareya 1739an da hatiye îfadekirin, ji xwendekaran dixwaze ku armancên giştî yên li jêr bi dest bixin (MEB, 2012).

1. Zêdekirina eleqeya li hemberê hînbûna kurdî,
2. Dabînkirina naskirina çanda ku kurdî tê da dijît,
3. Dayîna derfeta jihevcihêkirina nixên çandî yên deverên ku kurdî (kurmancî û zazakî) tê axiftin,
4. Hayjêhebûna nixên xwe yên çandî û dabînkirina xweşbînî û rêzgirtina kesên din,
5. Pêşvebirina şîyanên xwe îfadekirin, ragihandin, hevkarî kirin, fikirîna bi rexneyî û çareserkirina arîşeyan,
6. Dabînkirina şopandina çavkanîyên dîtbarî, bihîzyarî û nivîskî yên li gor asta xwe,
7. Dabînkirina geşedana xwendekaran ya takekesî, sosyal û çandî,
8. Di kurdî da geşedana çar şîyanên zimanî yên xwendekaran; guhdarîkirin, axiftin, xwendin û nivîsandinê,

9. Dabînkirina xwenirxandina xwendekaran ya li gor pîvanên Metina Serlêdanê ya Hevpar a Ewrûpayê ya ji bo Zimanan,
10. Dewlemendkirina peyvdanka Kurdî,
11. Pêşxistina şîyanên hînbûnê bi alîkarîya teknolojîyên zanînê.

1. Serpêhatîya Dersa Kurdî li Komara Tirkîyeyê

Serpêhatîya perwerdeya kurdî ya li Komara Tirkîyeyê xwedî dîrokeka pir tevlihev û dirêj e. Di sedsala 20. da weşandina metinên zimanî û edebî li gelek deverên ku kurdî dihat axiftin, qedexa bû (Allison, 2008). Li gor Çiçek (2013), politîkayên asimilasyon û înkarkirina Kurdan, li gel neteweyên din ên misilman hîn di dema Osmanîyan da dest pê dîke. Piştî damezrandina Komara Tirkîyeyê, ev politikaya asimilasyon û înkarkirîna bi awayekî xurttir tê rêvebirin û kurdî tê qedexekirin. Van qedexeyan bi salan rê li ber bikaranîna kurdî ya di perwerdeyê da girt. Piştî darbeya leşkerî ya 1980yan, zexta li ser kurdî hîn zêdetir bû û axiftin, nivîsandin û hînkirina kurdî bi temamî hat qedexekirin. Di salên 1990î da, zexta li ser kurdî hinekî sist bû û kursên zimanê kurdî hatin vekirin. Lê bi piranî temenê van kursan kurt bû. Damezrandina Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ji bo hînkirina kurdî ya sazûmanî gaveka giring bû. Vê enstîtûyê di derbareyê ziman û çanda kurdî da gelek xebat kirin. Di sala 2009an da li zanîngehan beşên lîsansa ziman û edebiyata kurdî û bi navê ziman û çanda kurdî jî beşên lîsansa bilind vebûn. Cara pêşîn li Zanîngeha Mêrdîn Artuklûyê di Enstîtuya Zimanên Zindî da kurdî kete zanîngehan. Di sala 2012an li Zanîngeha Çewlikê, 2013an da Li Zanîngeha Yuzuncu Yilê ya Wanê enstîtû hatine vekirin. Li Zanîngeha Mûş Alparslanê di bin banê Enstîtuya Zanistên Cîvakî da Makezanista Ziman û Çanda Kurdî vebû û xwendekarên lîsansa bilind yê bîtez û bêtez hatin qebûl kirin. Li Zanîngeha Dîcleyê di bin banê Enstîtuya Zanistên Cîvakî da Makezanista Ziman û Çanda Kurdî vebû û ji sala 2014an vir ve xwendekarên lîsansa bilind û 2015an û vir ve jî xwendekarên doktorayê qebûl dîke. Di sala 2024an da dest bi qebûlkirina xwendekarên lîsansê jî kirin. Lijneya Talîm û Terbîyeyê ya Wezareta Perwerdeya Neteweyî di tarîxa 25.06.2012an da Xêzîknameya Dersan a Hefteyî ya Xwendîngehên Seretayî û Navîn qebûl kir. Li gor vê ji bo polên pêncem dersa hîlbijêrkî ya ziman û zaraveyên zindî li xêzîknameyê hate zêdekirin. Ji aliyê Birêvebirina Giştî ya Perwerdeya Bingehîn a Wezareta Perwerdeya Neteweyî ders û rêzîkên hîlbijartina wan hate ravekirin. Li gor giştînameyê divê herî kêmbê kes dersê hîlbijêrin da ku ders vebe. Di sala 2012an da di xwendîngehên navîn da hefteyê 2 saetan ji bo dersa kurdî ya hîlbijêrkî, rê vebû. Kesên dersê bidin dê derçûyên beşên mastira bêtez ê zanîngehên Çewlik û Mêrdînê bûna. Di sala 2012an da Zanîngeha Artuklû ya Mêrdînê xwendekarên mastira bêtez qebûl kirin. Bi pêşengîya zanîngeha Mêrdînê ji bo amadekirina pirtûkên dersa kurmancî û zazakî komîsyon hatin avakirin û çirîya pêşîn a sala 2012an pirtûk teslîmî Lijneya Talîm û Terbîyeyê kirin. Vê komîsyonê ji bo xwendekarên 5, 6 û 7an ên dersa kurmancî û zazakî pirtûk amade kirin. Pirtûkên vê komîsyonê hatine çapkirin û belavkirin. Di sala 2016an da çap û belavkirina vê pirtûkê dane sekinandin. Di bin banê Wezareta Perwerdeya Neteweyî da yek ji bo kurmancî yek ji bo zazakî du komîsyon hatine avakirin û pirtûkên van komîsyonan amade kirî sala 2017an hatin qebûl kirin. Pirtûkên ku van komîsyonan amade kirî ji bo polên 5, 6, 7 û 8em in.

2. Armanca Vekolînê

Armanca vê xebatê, vekolîna cureyên bêjeyên metinên di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da ne. Di xebatê da, li gor cureyên bêjeyan, dabeşbûna bêjeyên di metinên berhema navborî da, hatine tesbîtkirin û senifandin.

Ji bo bidestxîtina armanca vê xebatê em dê bersivên şeş pirsyarên jêrîn bidin.

1. Metinên di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, li gor cureyên metinan û unîteyan çawa dabeş dibin?
2. Bêjeyên metinên hikayetî yên di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, li gor cureyên bêjeyan çawa dabeş dibin?
3. Bêjeyên metinên agahîder yên di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, li gor cureyên bêjeyan çawa dabeş dibin?
4. Bêjeyên helbestên di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, li gor cureyên bêjeyan çawa dabeş dibin?
5. Cureyên bêjeyên metinên di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, li gor cureyên metinan çawa dabeş dibin?
6. Cureyên bêjeyên metinên di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, li gor unîteyan çawa dabeş dibin?

3. Giringîya Vekolînê

Cihê ku ziman cara pêşîn li gor rîzikan tê hînkirin, xwendingeha seretayî ye. Di xwendingehan da çavkanîyên ku ji bo hînkirina ziman tîn bikaranîn pirtûkên dersê, ferheng, çîrok û hwd. in. Ji nav van çavkanîyan, çavkanîya sereke û ya ku herî zêde tê bikaranîn pirtûka dersê ye. Di hînkirina zimanan da rola pirtûkên dersê gelekî giring e. Lewra divê metinên di pirtûkên dersê da tîn bikaranîn ji aliyê ziman ve rast û bibandor bin.

Em ji bilî xebata Kurt (2024) ya bi navê “Analîza Metinên Pirtûka Kurdî (Kurmancî) ya Pola Pêncem ji Aliyê Hînkirina Şiyenewerîya Xwendinê ve” rastî çî xebatan derheqê metinên di pirtûkên dersa kurmancî da hatine kirin, nehatin. Xebatên kurdolojîyê da heta vêga çî xebatên li ser cureyên bêjeyên metinên di pirtûkên dersa kurmancî da hatine kirin, nînin. Di kurmancî da kêmbûna derfet, sazî û pisporên qada perwerde û hînkirinê bandoreka nerênî li ser xebatên qada perwerde û hînkirinê dike. Loma di qada perwerde û hînkirina kurmancî da xebatên hatine kirin gelekî kêma in. *Di derheqê cureyên bêjeyên metinên di pirtûkên dersa kurmancî da cara pêşîn e ku vekolînek tê kirin.*

4. Sînor û Çarçoveya Vekolînê

Di xwendingehên navîn da çar pêlik hene û di her pêlikê da dersa kurmancî ya hîlbijêrkî heye. Ji bo her pêlikê pirtûka dersê ji aliyê Wezareta Perwerdeya Neteweyî ve hatiye amadekirin. Ev vekolîn, bi tesbîtkirina hejmara cureyên bêjeyên metinên di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da ve sînardar e. Metinên di bin beşên *Çalaki* û *Hûn Dizaninê* da û yên bêsernivîs, nebûne mijara vê vekolînê. Di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da 35 metin hatine tesbîtkirin û ev vekolîn bi van metinan ve hate sînokirin.

Rêbaz

Ev xebat li gor *rêbaza vekolîna çawanî* (*qualitative research methods*) hatiye rêvebirin. Di xebatê da *analîza dokumentê* (*document analysis*) hatiye bikaranîn. Feraset û bûyer di qadên xwe yên xwezayî da bi awayekî rasteqîn û bitemamî tên nîşandan. Di vekolînên çawanî da ev rê tê şopandin (Yıldırım & Şimşek, 2011). Dokument, di vekolînên çawanî da çavkanîyên giring ên daneyan in û hem dokumentên fermî hem jî yên taybet di vê çarçoveyê da dikarin bên vekolandin (Creswell, 2005). Di vê xebatê da ew dokumentên ku hatine vekolandin cureyên bêjeyên di metinên pirtûka dersa kurmançî ya di pola heştem da ne.

1. Materyala Xebatê

Materyala vê xebatê, pirtûka dersa kurmançî ya pola heştem e ku ji aliyê Serokatîya Lijneya Talîm û Terbîyeyê ya Wezaretê Perwerdeya Neteweyî ya Komara Tirkîyeyê ve wekî pirtûka dersê ji bo polên heştem ên xwendingehên navîn hatiye qebûl kirin. Pirtûk ji aliyê komîsyonekê ve hatiye amadekirin. Di komîsyonê da ev kes hene:

- Lokman Kalan
- Gülbeddin Gülmez
- Ahmet Seyari
- Ramazan Yaman
- Abdurrahman Özhan
- Abdurrahman Kardeş

Pirtûk ji heşt unîteyan pêk tê:

1. Em Zimanê Xwe Nas Bikin
2. Ez û Malbata Min
3. Xwendingeh û Jîngeha Min
4. Laş û Tenduristî
5. Xurek û Vexurek
6. Demsal û Salname
7. Lîstik û Çîrok
8. Çalakîyên Serbest

2. Komkirina Daneyan

Daneyên vê vekolînê bi teknîka *analîza dokumentê* (*document analysis*) hatine berhev kirin. Analîza dokumentê, ji bo berhev kirina daneyan, yek ji teknîkên rêbaza vekolîna çawanî ye. Analîza dokumentê, analîza materyalan e ku diyarde an jî diyardeyên ku tên vekolandin di xwe da di-hewîne (Yıldırım & Şimşek, 2011). Analîza dokumentê jî qeyd û dokumentên di derbareyê xebata ku dê bê kirin berhev dike û li gor norm an jî sîstemeka aşkera kod dike û vedikole (Çepni, 2012). Analîza dokumentê bi navên ‘çavdêriya belgeyî’ an jî ‘venêrîna belgeyî’ jî tên binav kirin (Çepni, 2012). Venêrîna belgeyî ji bo armanceka diyar, kirarîyên wekî peydakirin, xwendin, nîşegirtin û nirxandina çavkanîyan di xwe da di-hewîne (Karasar, 2012). Di vê pêvajoyê da xala herî giring ew e ku agahîyên di çavkanîyan da çawa hatibine vegotin wisa fahmkirina vekoler e. Bi vê rêbazê ji tiştên ku hatine kirin, têgihîştinên giştî û ramanên cuda, hindêk din jî aşkera dibin (Çepni, 2012).

Ji bo danîna bingeha teorîk a vê xebatê lîteratûr hate nêrîn. Xebatên zanistî yên di vê qadê

da hatine kirin, bi berfireh hatin vekolandin. Pişt ra metinên di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem (35 metin) da çend caran hatine xwendin û cureyên bêjeyan li ser wan hatine kodkirin. Encamên ku derketine holê hatine senifandin.

Li gor lîteratûrê di kurmancî da cureyên bêjeyan bi awayên ji hev cuda hatine senifandin. Li gor Tan (2011), bêje li gor peywîrên ku bi cih tînin ji hev vediqetin û di bin banê deh cureyan da dabeş dibin: navdêr, veqetandek, rengdêr, cînavk, lêker, jimarnav, hoker, daçek, gihanek û baneşan. Li gor Yıldırım (2012), neh komên cureyên bêjeyan hene: lêker, weklêker, hoker, nav, cînav, hevalnav, daçek, gihanek, baneşan. Li gor Baran (2012), cureyên bêjeyan ji heşt cureyan pêk tên: navdêr, rengdêr, cînavk, hoker, daçek, gihanek, baneşan û lêker.

Di vê xebatê da, senifandina Baran (2012) ya li ser cureyên bêjeyan wek bingeş hatiye qebûl kirin. Li gor rêzê navdêr, lêker, rengdêr, hoker, cihnav, daçek, gihanek û baneşan bûne bingeşa senifandina me. Bêjeyên metinên di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da li gor vê rêzê hatin senifandin.

3. Analîza Daneyan

Di vê xebatê da dane bi rêya *analîza teswîrî (descriptive analysis)*, ku yek ji teknîkên analîza çawanî ye, hatine analîzkirin. Di analîza teswîrî da daneyên tîn bidestxistin, di bin serenavên dîyarkirî da tîn kurtekirin û şirovekirin. Armanc, ji bo xwendevanan bi awayekî sererastkirî û şirovekirî pêşkêşkirina destkeftiyên peydakirî ne (Yıldırım & Şimşek, 2011).

Di vê vekolîne da ji bo rêbaza analîza teswîrî çarçoveyeka guncan hatiye amadekirin û tema hatine dîyarkirin. Tema li gor armanc û pirsyarên xebatê hatine çêkirin. Pişt re bêjeyên di metinên berhemê da derbas dibin û ji heşt cureyên bêjeyan tîn hesabandin, hatin tesbîtandin. Bi vî awayî metinên navborî di çarçoveya van temayan da hatine vekolandin û analîzkirin. Di pêngava dawî da daneyên ku hatine analîzkirin di bin temayên pêwendîdar da, bi daneyên hejmarî hatine îfadekirin û bi rêya tabloyan hatine pêşkêşkirin û şirovekirin.

4. Derbasdarî û Pêbawerî

Di vekolîna dokumentan da ji bo bidestxistina *derbasdarî û pêbawerîyê (Validity and Reliability)*, pêbawerbûna daneyan roleka giring dilîze, ji ber vê divê dane bi awayekî zelal û hevgirtî bîn pêşkêşkirin û vekolerekê din erê bike.

Ji bo pêbawerîya vê xebatê hevgirtina kodkeran li ber çavan hatiye girtin. Loma ji 35 metinên ku hatine destnîşankirin 5 lib ji aliyê vekoler û kodkerekê serbixwe ve ji hev cuda hatine vekolandin û cureyên bêjeyên di wan metinan da hatine kodkirin. Paşê hevgirtina kodkeran li ber çavan hatiye girtin. Ji bo vê armancê formûla Miles & Huberman (1994) hate bikaranîn û rêjeya hevgirtina di navbera vekolera da %86 derket. Pişt ra kodkirina vekoler ya li ser cureyên bêjeyên metinên mayî di vê çarçoveyê da berdewam kir.

Ji bo dabînkirina derbasdarîya vê xebatê di hemû astan da bi taybetî jî dema pêdivî hat dîtin, nêrînên pisporên qadê hatin stendin. Dema ku materyala xebatê hate tesbîtandin û dane hatine berhevkerin vekoler û şewirmendê teze, gelek caran bi hev ra xebitîn. Dema ku pêdivî hat dîtin nêrînên hin vekolera din ên pisporên qadê ne û yê pisporên qadê cuda ne jî hatin stendin.

Destkeftî û Şirove

1. Destkeftîyên di Derbareyê Pirsyara Yekem da

Di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, dabeşbûna metinan li gor cureyên metinan û unîteyan di tabloya 1. da hatiye nîşandan.

Tablo 1. Di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, dabeşbûna metinan li gor cureyên metinan û unîteyan (hejmarî)

Cureyên Metinan	Unîte								Serhev
	Em Zimanê xwe Nas Bikin	Ez û Malbata Min	Xwendingeh û Jîngeha Min	Laş û Tenduristî	Xurek û Vexurek	Demsal û Salname	Lîstik û Çîrok	Çalakîyên Serbest	
Metinên Hikayetî	1	0	0	0	2	0	1	1	5
Metinên Agahîder	2	4	4	4	2	3	2	5	26
Helbest	0	0	0	1	0	1	1	1	4
Serhev	3	4	4	5	4	4	4	7	35

Wekî ku di tabloya 1. da jî xuya dibe ku di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da 8 unîte û di van unîteyan da jî 35 metin hene. Ji van metinan 5 lib metinên hikayetî, 26 lib metinên agahîder û 4 lib jî helbest in.

Di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, 5 metinên hikayetî hene. Di unîteya “Em Zimanê Xwe Nas Bikin” da 1, di unîteya “Xurek û Vexurek” da 2, di unîteya “Lîstik û Çîrok” da 1 û di unîteya “Çalakîyên Serbest” da jî 1 metina hikayetî heye.

Di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, da 26 metinên agahîder hene. Di unîteya “Em Zimanê Xwe Nas Bikin” da 2, di unîteya “Ez û Malbata Min” da 4, di unîteya “Xwendingeh û Jîngeha Min” da 4, di unîteya “Laş û Tenduristî” da 4, di unîteya “Xurek û Vexurek” da 2, di unîteya “Demsal û Salname” da 3, di unîteya “Lîstik û Çîrok” da 2 û di unîteya “Çalakîyên Serbest” da 5 metinên agahîder hene.

Di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da 4 helbest hene. Di unîteya “Laş û Tenduristî” da 1, di unîteya “Demsal û Salname” da 1, di unîteya “Lîstik û Çîrok” da 1 û di unîteya “Çalakîyên Serbest” da 1 helbest heye.

Ji tabloyê xuya dibe ku di unîteya “Em Zimanê Xwe Nas Bikin” da 2 metinên agahîder, metineka hikayetî serhev 3; di unîteya “Ez û Malbata Min” da 4 metinên agahîder; di unîteya “Xwendingeh û Jîngeha Min” da 4 metinên agahîder; di unîteya “Laş û Tenduristî” da 4 metinên agahîder, helbestek, serhev 5; di unîteya “Xurek û Vexurek” da 2 metinên agahîder, 2 metinên hikayetî, serhev 4; di unîteya “Demsal û Salname” da 3 metinên agahîder, helbestek, serhev 4; di unîteya “Lîstik û Çîrok” da 2 metinên agahîder, metineka hikayetî, helbestek, serhev 4 û di unîteya “Çalakîyên Serbest” da 5 metinên agahîder, metineka hikayetî, helbestek, serhev 7 metin hene.

2. Destkeftîyên di Derbareyê Pirsyara Duyem da

Di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, dabeşbûna bêjeyên metinên hikayetî li gor cu-

reyên bêjeyan di tabloya 2. da hatiye nîşandan.

Tablo 2. *Di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, dabeşbûna bêjeyên metinên hikayetî li gor cûreyên bêjeyan (hejmarî)*

Unîte	Metinên Hikayetî	Cûreyên Bêjeyan								Serhev
		Navdêr	Lêker	Rengdêr	Hoker	Cihnav	Daçek	Gihanek	Baneşan	
Unîteya 1. Em Zimanê Xwe Nas Bikin	Em Vê Pêkenokê Nû Dibihîzin	58	55	10	21	36	20	21	1	222
Unîteya 5. Xurek û Vexurek	Raza Rengan	142	81	37	40	81	41	56	2	480
	Reng	290	180	71	78	162	86	80	30	977
Unîteya 7. Lîstik û Çîrok	Mîşk û Xefk	123	79	12	26	44	29	27	2	342
Unîteya 8. Çalakîyên Serbest	Ajelên Gî-yaxwer	34	20	8	7	15	12	9	8	113
Serhev	5	647	415	138	172	338	188	193	43	2134

Wekî ku di tabloya 2. da jî xuya dibe ku di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, 5 metinên hikayetî hene;

Di unîteya yekem “Em Zimanê Xwe Nas Bikin” da metineka hikayetî heye. Di metina hikayetî ya bi navê *Em Vê Pêkenokê Nû Dibihîzin* da serhev 222 bêje hene. Di metinê da 58 navdêr, 55 lêker, 10 rengdêr, 21 hoker, 36 cihnav, 20 daçek, 21 gihanek û baneşanek heye. Di metinê da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene.

Di unîteya duyem “Ez û Malbata Min”, ya sêyem “Xwendîngêh û Jîngeha Min” û ya çarem “Laş û Tenduristî” da metinên hikayetî nînin.

Di unîteya pêncem “Xurek û Vexurek” da bi navê *Raza Rengan* û *Reng* 2 metinên hikayetî hene. Di metina hikayetî ya bi navê *Raza Rengan* da serhev 480 bêje hene. Di metinê da 142 navdêr, 81 lêker, 37 rengdêr, 40 hoker, 81 cihnav, 41 daçek, 56 gihanek û 2 baneşan hene. Di metinê da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene. Di metina hikayetî ya bi navê *Reng* da serhev 977 bêje hene. Di metinê da 290 navdêr, 180 lêker, 71 rengdêr, 78 hoker, 162 cihnav, 86 daçek, 80 gihanek û 30 baneşan hene. Di metinê da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene.

Di unîteya şeşem “Demsal û Salname” da metinên hikayetî nînin.

Di unîteya heftem “Lîstik û Çîrok” da bi navê *Mîşk û Xefk* metineka hikayetî heye. Di metina hikayetî ya bi navê *Mîşk û Xefk* da serhev 342 bêje hene. Di metinê da 123 navdêr, 79 lêker, 12 rengdêr, 26 hoker, 44 cihnav, 29 daçek, 27 gihanek û 2 baneşan hene. Di metinê da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene.

Di unîteya heştem “Çalakîyên Serbest” da bi navê *Ajelên Gî-yaxwer* metineka hikayetî heye.

Di metina hikayetî ya bi navê *Ajelên Gîyaxwer* da serhev 113 bêje hene. Di metinê da 34 navdêr, 20 lêker, 8 rengdêr, 7 hoker, 15 cihnav, 12 daçek, 9 gihanek û 8 baneşan hene. Di metinê da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene.

Di her pênc metinên hikayetî da 2134 bêje hene. Di hemû metinên hikayetî da 647 navdêr, 415 lêker, 138 rengdêr, 172 hoker, 338 cihnav, 188 daçek, 193 gihanek û 43 baneşan hene. Di hemû metinên hikayetî da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene.

3. Destkeftiyên di Derbareyê Pirsyara Sêyem da

Di pirtûka darsa kurmançî ya pola heştam da, dabeşbûna bêjeyên metinên agahîder, li gor cureyên bêjeyan di tabloya 3. da hatiye nîşandan.

Tablo 3. Di pirtûka darsa kurmançî ya pola heştam da, dabeşbûna bêjeyên metinên agahîder li gor cureyên bêjeyan (hejmarî)

Unîte	Metinên Agahîder	Cureyên Bêjeyan								Serhev
		Navdêr	Lêker	Rengdêr	Hoker	Cihnav	Daçek	Gihanek	Baneşan	
Unîteya 1. Em Zimanê Xwe Nas Bikin	Hin Taybetiyên Zimanê Me	63	24	23	3	22	13	13	0	161
	Dersa Bîrkarîyê	141	44	18	15	30	22	10	4	284
Unîteya 2. Ez û Malbata Min	Cejnên Me	220	110	40	53	170	60	98	6	757
	Rojnivîsk	169	91	13	59	121	83	59	3	598
	Pîşe û Guherînên Wan	158	56	33	37	24	55	53	0	416
	Dersa Pişeyan	164	75	29	11	56	47	44	0	426
Unîteya 3. Xwendîngê û Jîngeha Min	Xwendîngê	119	41	26	24	42	49	39	0	340
	Cîrantî	91	42	24	13	30	41	24	0	265
	Genimê Herî Baş	51	25	9	12	29	20	11	0	157
	Bexçeyê Nuwaze	138	68	24	43	67	45	27	5	417
Unîteya 4. Laş û Tenduristî	Pergala Bêhn-girtinê	54	24	7	9	3	10	11	0	118
	Pergala Qerqod	50	9	3	3	9	2	8	0	84
	Bexşandin û Veguhastina Endamên Laş	74	43	13	7	10	16	15	0	178
	Xêzefilmê Balkêş	212	143	66	51	152	73	96	24	817
Unîteya 5. Xurek û Vexurek	Hin Xurek û Vexurekên Me	143	69	29	22	12	46	39	0	360
	Xwarin di Çanda Me da	282	126	19	35	70	78	78	4	692

Unîteya 6. Demsal û Salname	Rewşa Hewayê	94	31	14	12	14	33	23	1	222
	Cureyên Salnameyan	192	82	32	40	37	52	34	3	472
	Rojek ji Rojên Min	159	78	19	46	103	50	58	1	514
Unîteya 7. Lîstik û Çîrok	Hin Lîstik	249	108	23	40	82	99	71	0	672
	Gotinên Pêşyan Neqşên li ser Keviran	123	61	12	30	37	22	30	5	320
Unîteya 8. Çalakîyên Serbest	Komên Hobîyan	110	56	14	24	50	34	28	2	318
	Kaniya Çanda Me	98	36	18	18	44	24	29	2	269
	Înternet	37	21	10	13	5	11	11	0	108
	Qeb	127	60	44	27	18	42	34	0	352
	Dawîya Sala Perwerdeyê	146	77	23	52	61	46	50	9	464
Serhev	26	3464	1600	585	699	1298	1073	993	69	9781

Wekî ku di tabloya 3. da jî xuya dibe ku di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, 26 metinên agahîder hene;

Di unîteya yekem “Em Zimanê Xwe Nas Bikin” da bi navên *Hin Taybetiyên Zimanê Me* û *Dersa Bîrkarîyê 2* metinên agahîder hene. Di metina agahîder ya bi navê *Hin Taybetiyên Zimanê Me* da serhev 161 bêje hene. Di metinê da 63 navdêr, 24 lêker, 23 rengdêr, 3 hoker, 22 cihnav, 13 daçek û 13 gihanek hene. Di metinê da baneşan nînin. Di metinê da herî zêde navdêr hene. Di metina agahîder ya bi navê *Dersa Bîrkarîyê* da serhev 284 bêje hene. Di metinê da 141 navdêr, 44 lêker, 18 rengdêr, 15 hoker, 30 cihnav, 22 daçek, 10 gihanek û 4 baneşan hene. Di metinê da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene.

Di unîteya duyem “Ez û Malbata Min” da bi navên *Cejnên Me*, *Rojnivîsk*, *Pîşe û Guherînên Wan* û *Dersa Pîşeyan 4* metinên agahîder hene. Di metina agahîder ya bi navê *Cejnên Me* da serhev 757 bêje hene. Di metinê da 220 navdêr, 110 lêker, 40 rengdêr, 53 hoker, 170 cihnav, 60 daçek, 98 gihanek û 6 baneşan hene. Di metinê da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene. Di metina agahîder ya bi navê *Rojnivîsk* da serhev 598 bêje hene. Di metinê da 169 navdêr, 91 lêker, 13 rengdêr, 59 hoker, 121 cihnav, 83 daçek, 59 gihanek û 3 baneşan hene. Di metinê da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene. Di metina agahîder ya bi navê *Pîşe û Guherînên Wan* da serhev 416 bêje hene. Di metinê da 158 navdêr, 56 lêker, 33 rengdêr, 37 hoker, 24 cihnav, 55 daçek û 53 gihanek hene. Di metinê da baneşan nînin. Di metinê da herî zêde navdêr hene. Di metina agahîder ya bi navê *Dersa Pîşeyan* da serhev 426 bêje hene. Di metinê da 164 navdêr, 75 lêker, 29 rengdêr, 11 hoker, 56 cihnav, 47 daçek û 44 gihanek hene. Di metinê da baneşan nînin. Di metinê da herî zêde navdêr hene.

Di unîteya sêyem “Xwendingeh û Jîngeha Min” da bi navê *Xwendingeh*, *Cîrantî*, *Genimê Herî Baş* û *Bexçeyê Nuwaze 4* metinên agahîder hene. Di metina agahîder ya bi navê *Xwendingeh*

da serhev 340 bêje hene. Di metinê da 119 navdêr, 41 lêker, 26 rengdêr, 24 hoker, 42 cihnav, 49 daçek û 39 gihanek hene. Di metinê da baneşan nînin. Di metinê da herî zêde navdêr hene. Di metina agahîder ya bi navê *Cîrantî* da serhev 265 bêje hene. Di metinê da 91 navdêr, 42 lêker, 24 rengdêr, 13 hoker, 30 cihnav, 41 daçek û 24 gihanek hene. Di metinê da baneşan nînin. Di metinê da herî zêde navdêr hene. Di metina agahîder ya bi navê *Genimê Herî Baş* da serhev 157 bêje hene. Di metinê da 51 navdêr, 25 lêker, 9 rengdêr, 12 hoker, 29 cihnav, 20 daçek û 11 gihanek hene. Di metinê da baneşan nînin. Di metinê da herî zêde navdêr hene. Di metina agahîder ya bi navê *Bexçeyê Nuwaze* da serhev 417 bêje hene. Di metinê da 138 navdêr, 68 lêker, 24 rengdêr, 43 hoker, 67 cihnav, 45 daçek, 27 gihanek û 5 baneşan hene. Di metinê da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene.

Di unîteya çarem “Laş û Tenduristî” da bi navên *Pergala Bêhngirtinê*, *Pergala Qerqod*, *Bexşandin û Veguhastina Endamên Laş û Xêzefilmê Balkêş* 4 metinên agahîder hene. Di metina agahîder ya bi navê *Pergala Bêhngirtinê* da serhev 118 bêje hene. Di metinê da 54 navdêr, 24 lêker, 7 rengdêr, 9 hoker, 3 cihnav, 10 daçek û 11 gihanek hene. Di metinê da baneşan nînin. Di metinê da herî zêde navdêr hene. Di metina agahîder ya bi navê *Pergala Qerqod* da serhev 84 bêje hene. Di metinê da 50 navdêr, 9 lêker, 3 rengdêr, 3 hoker, 9 cihnav, 2 daçek û 8 gihanek hene. Di metinê da baneşan nînin. Di metinê da herî zêde navdêr hene. Di metina agahîder ya bi navê *Bexşandin û Veguhastina Endamên Laş* da serhev 178 bêje hene. Di metinê da 75 navdêr, 43 lêker, 13 rengdêr, 7 hoker, 10 cihnav, 16 daçek û 15 gihanek hene. Di metinê da baneşan nînin. Di metinê da herî zêde navdêr hene. Di metina agahîder ya bi navê *Xêzefilmê Balkêş* da serhev 817 bêje hene. Di metinê da 212 navdêr, 143 lêker, 66 rengdêr, 51 hoker, 152 cihnav, 73 daçek, 96 gihanek û 24 baneşan hene. Di metinê da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene.

Di unîteya pêncem “Xurek û Vexurek” da bi navên *Hin Xurek û Vexurekên Me* û *Xwarin di Çanda Me* da 2 metinên agahîder hene. Di metina agahîder ya bi navê *Hin Xurek û Vexurekên Me* da serhev 360 bêje hene. Di metinê da 143 navdêr, 69 lêker, 29 rengdêr, 22 hoker, 12 cihnav, 46 daçek û 39 gihanek hene. Di metinê da baneşan nînin. Di metinê da herî zêde navdêr hene. Di metina agahîder ya bi navê “*Xwarin di Çanda Me* da” da serhev 692 bêje hene. Di metinê da 282 navdêr, 126 lêker, 19 rengdêr, 35 hoker, 70 cihnav, 78 daçek, 78 gihanek û 4 baneşan hene. Di metinê da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene.

Di unîteya şeşem “Demsal û Salname” da bi navên *Rewşa Hewayê û Cureyên Salnameyan û Rojek ji Rojên Min* 3 metinên agahîder hene. Di metina agahîder ya bi navê *Rewşa Hewayê* da serhev 222 bêje hene. Di metinê da 94 navdêr, 31 lêker, 14 rengdêr, 12 hoker, 14 cihnav, 33 daçek, 23 gihanek û baneşanek heye. Di metinê da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene. Di metina agahîder ya bi navê *Cureyên Salnameyan* da serhev 472 bêje hene. Di metinê da 192 navdêr, 82 lêker, 32 rengdêr, 40 hoker, 37 cihnav, 52 daçek, 34 gihanek û 3 baneşan hene. Di metinê da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene. Di metina agahîder ya bi navê *Rojek ji Rojên Min* da serhev 514 bêje hene. Di metinê da 159 navdêr, 78 lêker, 19 rengdêr, 46 hoker, 103 cihnav, 50 daçek û 58 gihanek û baneşanek heye. Di metinê da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene.

Di unîteya heftem “Lîstik û Çîrok” da bi navên *Hin Lîstik û Gotinên Pêşîyan Neqşên li ser*

Keviran 2 metinên agahîder hene. Di metina agahîder ya bi navê *Hin Lîstik* da serhev 672 bêje hene. Di metinê da 249 navdêr, 108 lêker, 23 rengdêr, 40 hoker, 82 cihnav, 99 daçek û 71 gihanek hene. Di metinê da baneşan nînin. Di metinê da herî zêde navdêr hene. Di metina agahîder ya bi navê *Gotinên Pêşîyan Neqşên li ser Keviran* da serhev 320 bêje hene. Di metinê da 123 navdêr, 61 lêker, 12 rengdêr, 30 hoker, 37 cihnav, 22 daçek, 30 gihanek û 5 baneşan hene. Di metinê da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene.

Di unîteya heştem “Çalakîyên Serbest” da bi navên *Komên Hobîyan*, *Kanîya Çanda Me*, *Înternet*, *Qeb* û *Dawîya Sala Perwerdeyê* 5 metinên agahîder hene. Di metina agahîder ya bi navê *Komên Hobîyan* da serhev 318 bêje hene. Di metinê da 110 navdêr, 56 lêker, 14 rengdêr, 24 hoker, 50 cihnav, 34 daçek, 28 gihanek û 2 baneşan hene. Di metinê da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene. Di metina agahîder ya bi navê *Kanîya Çanda Me* da serhev 269 bêje hene. Di metinê da 98 navdêr, 36 lêker, 18 rengdêr, 18 hoker, 44 cihnav, 24 daçek, 29 gihanek û 2 baneşan hene. Di metinê da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene. Di metina agahîder ya bi navê *Înternet* da serhev 108 bêje hene. Di metinê da 37 navdêr, 21 lêker, 10 rengdêr, 13 hoker, 5 cihnav, 11 daçek û 11 gihanek hene. Di metinê da baneşan nînin. Di metinê da herî zêde navdêr hene. Di metina agahîder ya bi navê *Qeb* da serhev 352 bêje hene. Di metinê da 127 navdêr, 60 lêker, 44 rengdêr, 27 hoker, 18 cihnav, 42 daçek û 34 gihanek hene. Di metinê da baneşan nînin. Di metinê da herî zêde navdêr hene. Di metina agahîder ya bi navê *Dawîya Sala Perwerdeyê* da serhev 464 bêje hene. Di metinê da 146 navdêr, 77 lêker, 23 rengdêr, 52 hoker, 61 cihnav, 46 daçek, 50 gihanek û 9 baneşan hene. Di metinê da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene.

Di hemû metinên agahîder da 9781 bêje hene. Di hemû metinên agahîder da 3464 navdêr, 1600 lêker, 585 rengdêr, 699 hoker, 1298 cihnav, 1073 daçek, 993 gihanek û 69 baneşan hene. Di hemû metinên agahîder da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene.

4. Destkeftîyên di Derbareyê Pirsyara Çarem da

Di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, dabeşbûna bêjeyên helbestan li gor cureyên bêjeyan di tabloya 4. da hatiye nîşandan.

Tablo 4. *Di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, dabeşbûna bêjeyên helbestan li gor cureyên bêjeyan (hejmarî)*

Unîte	Helbest	Cureyên Bêjeyan								Serhev
		Navdêr	Lêker	Rengdêr	Hoker	Cihnav	Daçek	Gihanek	Baneşan	
Unîteya 4. Laş û Tenduristî	Bijî Paqijî!	41	30	11	8	15	6	12	2	125
Unîteya 6. Demsal û Salname	Heft-yeka Xebatkar	37	26	5	6	14	9	0	0	97
Unîteya 7. Lîstik û Çîrok	Şengê û Pengê	112	74	21	25	40	30	21	14	337

Unîteya 8.										
Çalakîyên Serbest	Çanda Me!	46	20	15	15	9	7	7	1	120
Serhev	4	236	150	52	54	78	52	40	17	679

Wekî ku di tabloya 4. da jî xuya dibe ku di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, 4 helbest hene;

Di unîteya yekem “Em Zimanê Xwe Nas Bikin”, ya duyem “Ez û Malbata Min” û ya sêyem “Xwendengeh û Jîngeha Min” da helbest nînin.

Di unîteya çarem “Laş û Tenduristî” da bi navê *Bijî Paqijî!* helbestek heye. Di vê helbestê da serhev 125 bêje hene. Di helbestê da 41 navdêr, 30 lêker, 11 rengdêr, 8 hoker, 15 cihnav, 6 daçek, 12 gihanek û 2 baneşan hene. Di helbestê da herî zêde navdêr, herî kêr baneşan hene.

Di unîteya pêncem “Xurek û Vexurek” da helbest nînin.

Di unîteya şeşem “Demsal û Salname” da bi navê *Hefteyeka Xebatkar* helbestek heye. Di vê helbestê da serhev 97 bêje hene. Di helbestê da 37 navdêr, 26 lêker, 5 rengdêr, 6 hoker, 14 cihnav û 9 daçek hene. Di helbestê da gihanek û baneşan nînin. Di helbestê da herî zêde navdêr hene.

Di unîteya heftem “Lîstik û Çîrok” da bi navê Şengê û Pengê helbestek heye. Di vê helbestê da serhev 337 bêje hene. Di metinê da 112 navdêr, 74 lêker, 21 rengdêr, 25 hoker, 40 cihnav, 30 daçek, 21 gihanek û 14 baneşan hene. Di metinê da herî zêde navdêr, herî kêr baneşan hene.

Di unîteya heştem “Çalakîyên Serbest” da bi navê Çanda Me! helbestek heye. Di vê helbestê da serhev 120 bêje hene. Di helbestê da 46 navdêr, 20 lêker, 15 rengdêr, 15 hoker, 9 cihnav, 7 daçek, 7 gihanek û baneşanek heye. Di helbestê da herî zêde navdêr, herî kêr baneşan hene.

Di her çar helbestên pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da 679 bêje hene. Di hemû helbestan da 236 navdêr, 150 lêker, 52 rengdêr, 54 hoker, 78 cihnav, 52 daçek, 40 gihanek û 17 baneşan hene. Di hemû helbestan da herî zêde navdêr, herî kêr baneşan hene.

5. Destkeftîyên di Derbareyê Pirsyara Pêncem da

Di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, dabeşbûna cureyên bêjeyan li gor cureyên metinan di tabloya 5. da hatiye nîşandan.

Tablo 5. Di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, dabeşbûna cureyên bêjeyan li gor cureyên metinan (hejmarî)

Cureyên Metinan	Hejmara Metinan	Cureyên Bêjeyan								Serhev
		Navdêr	Lêker	Rengdêr	Hoker	Cihnav	Daçek	Gihanek	Baneşan	
Metinên Hikayetî	5	647	415	138	172	338	188	193	43	2134
Metinên Agahîder	26	3464	1600	585	699	1298	1073	993	69	9781
Helbest	4	236	150	52	54	78	52	40	17	679
Serhev	35	4347	2165	775	925	1714	1313	1226	129	12594

Wekî ku di tabloya 5. da jî xuya dibe ku di her pênc metinên hîkayetî yên di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da serhev 2134 bêje hene. Ji van bêjeyan 647 lib navdêr, 415 lib lêker, 138 lib rengdêr, 172 lib hoker, 338 lib cihnav, 188 lib daçek, 193 lib gihanek û 43 lib jî baneşan in. Di metinên hîkayetî da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene.

Di bîst û şeş metinên agahîder yên di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da serhev 9781 bêje hene. Ji van bêjeyan 3464 lib navdêr, 1600 lib lêker, 585 lib rengdêr, 699 lib hoker, 1298 lib cihnav, 1073 lib daçek, 993 lib gihanek û 69 lib jî baneşan in. Di metinên agahîder da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene.

Di çar helbestên di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da serhev 679 bêje hene. Ji van bêjeyan 236 lib navdêr, 150 lib lêker, 52 lib rengdêr, 54 lib hoker, 78 lib cihnav, 52 lib daçek, 40 lib gihanek û 17 lib jî baneşan in. Di helbestan da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene.

Di hemû metinên pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da 12594 bêje hene. Ji van bêjeyan 2134 lib di metinên hîkayetî da, 9781 lib di metinên agahîder da û 679 lib jî di helbestan da ne. Bêje, herî zêde di metinên agahîder da, herî kêmbaneşan di helbestan da hatine bikaranîn.

Di hemû metinan da 4347 navdêr, 2165 lêker, 775 rengdêr, 925 hoker, 1714 cihnav, 1313 daçek, 1226 gihanek û 129 baneşan hene. Di hemû metinên pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da herî zêde navdêr, herî kêmbaneşan hene.

6. Destkeftiyên di Derbareyê Pirsyara Şeşem da

Di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, dabeşbûna cureyên bêjeyan li gor unîteyan di tabloya 6. da hatiye nîşandan.

Tablo 6. Di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, dabeşbûna cureyên bêjeyan li gor unîteyan (hejmarî)

Unîte	Hjmar Metinan	Cureyên Bêjeyan								Serhev
		Navdêr	Lêker	Rengdêr	Hoker	Cihnav	Daçek	Gihanek	Baneşan	
Unîteya 1. Em Zimanê Xwe Nas Bikin	3	262	123	51	39	88	55	44	5	667
Unîteya 2. Ez û Malba- ta Mîn	4	711	332	115	160	371	245	254	9	2197
Unîteya 3. Xwen- dingeh û Jîngeha Mîn	4	399	176	83	92	168	155	101	5	1179
Unîteya 4. Laş û Ten- duristî	5	431	249	100	78	189	107	142	26	1322

Unîteya 5.										
Xurek û Vexurek	4	857	456	156	175	325	251	253	36	2509
Unîteya 6.										
Demsal û Salname	4	482	217	70	104	168	144	115	5	1305
Unîteya 7.										
Lîstik û Çîrok	4	607	322	68	121	203	180	149	21	1671
Unîteya 8.										
Çalakîyên Serbest	7	598	290	132	156	202	176	168	22	1744
Serhev	35	4347	2165	775	925	1714	1313	1226	129	12594

Wekî ku di tabloya 6. da jî xuya dibe ku di unîteya yekem “Em Zimanê Xwe Nas Bikin” da 667 bêje hene. Ji van bêjeyan 262 lib navdêr, 123 lib lêker, 51 lib rengdêr, 39 lib hoker, 88 lib cihnav, 55 lib daçek, 44 lib gihanek û 5 lib jî baneşan in. Di vê unîteyê da herî zêde navdêr, herî kêr baneşan hene.

Di unîteye duyem “Ez û Malbata Min” da 2197 bêje hene. Ji van bêjeyan 711 lib navdêr, 332 lib lêker, 115 lib rengdêr, 160 lib hoker, 371 lib cihnav, 245 lib daçek, 254 lib gihanek û 9 lib jî baneşan in. Di vê unîteyê da herî zêde navdêr, herî kêr baneşan hene.

Di unîteya sêyem “Xwendîngê û Jîngeha Min” da 1179 bêje hene. Ji van bêjeyan 399 lib navdêr, 176 lib lêker, 83 lib rengdêr, 92 lib hoker, 168 lib cihnav, 155 lib daçek, 101 lib gihanek û 5 lib jî baneşan in. Di vê unîteyê da herî zêde navdêr, herî kêr baneşan hene.

Di unîteya çarem “Laş û Tenduristî” da 1322 bêje hene. Ji van bêjeyan 431 lib navdêr, 249 lib lêker, 100 lib rengdêr, 78 lib hoker, 189 lib cihnav, 107 lib daçek, 142 lib gihanek û 26 lib jî baneşan in. Di vê unîteyê da herî zêde navdêr, herî kêr baneşan hene.

Di unîteya pêncem “Xurek û Vexurek” da 2509 bêje hene. Ji van bêjeyan 857 lib navdêr, 456 lib lêker, 156 lib rengdêr, 175 lib hoker, 325 lib cihnav, 251 lib daçek, 253 lib gihanek û 36 lib jî baneşan in. Di vê unîteyê da herî zêde navdêr, herî kêr baneşan hene.

Di unîteya şeşem Demsal û Salname” da 1305 bêje hene. Ji van bêjeyan 482 lib navdêr, 217 lib lêker, 70 lib rengdêr, 104 lib hoker, 168 lib cihnav, 144 lib daçek, 115 lib gihanek û 5 lib jî baneşan in. Di vê unîteyê da herî zêde navdêr, herî kêr baneşan hene.

Di unîteya heftem “Lîstik û Çîrok” da 1671 bêje hene. Ji van bêjeyan 607 lib navdêr, 322 lib lêker, 68 lib rengdêr, 121 lib hoker, 203 lib cihnav, 180 lib daçek, 149 lib gihanek û 21 lib jî baneşan in. Di vê unîteyê da herî zêde navdêr, herî kêr baneşan hene.

Di unîteya heştam “Çalakîyên Serbest” da 1744 bêje hene. Ji van bêjeyan 598 lib navdêr, 290 lib lêker, 132 lib rengdêr, 156 lib hoker, 202 lib cihnav, 176 lib daçek, 168 lib gihanek û 22 lib jî baneşan in. Di vê unîteyê da herî zêde navdêr, herî kêr baneşan hene. Bêje, herî zêde di unîteya pencem “Xurek û Vexurek” da, herî kêr jî di unîteya yekem “Em Zimanê Xwe Nas Bikin” da

hene.

Encam, Nîqaş û Pêşnîyaz

Di perwerde û hînkirina zimanan da rola pirtûkên dersê gelekî giring e. Pirtûkên dersê hem ji aliyê naverokê hem jî ji aliyê taybetîyên xwe yên derveyî naverokê ve divê têr û tijî bin. Pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem ji 8 unîte û 35 metinan pêk tê. Metinên pirtûkê li gor cureyên metinan û unîteyan hatîne dabeşkirin ku di unîteya yekem da 3; di unîteya duyem da 4; di unîteya sêyem da 4; di unîteya çarem da 5; di unîteya pêncem da 4; di unîteya şeşem da 4; di unîteya heftem da 4 û di unîteya heştem da 7 metin hene.

Bi vê xebatê tê dîtin ku dabeşbûna cureyên metinên di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da li gor cureyên metinan û unîteyan gelekî bêrêkûpêk e. Di hemû unîteyan da metinên agahîder hene. Lê di hin unîteyan da ne metinên hikayetî ne jî helbest qet cih nagirin. Yanî di vê pirtûkê da metinên hikayetî û helbest gelekî hatine piştguhkirin û amadekaran di pirtûkê da gelekî kêmtir cih dane metinên ji van cureyan. Berovajîyê van cureyan, metinên agahîder di pirtûkê da gelekî zêde cih digirin. Ji ber ku metinên di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da li gor cureyên metinan bihevşengî nehatine dabeşkirin, ev wekî kêmasîyeka mezin derdikeve pêş. Di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da, divê mînakên ji her sê cureyên metinan bi hevşengî bêne bicihkirin. Ji ber ku metinên hikayetî ji bo geşedana zimanî ya xwendekarên di asta xwendengeha seretayî û navîn da gelekî giring in, bi qasî ku pêdivî pê heye divê di pirtûkên dersa kurmancî da bêtir bicihkirin. Herweha hevnasîna xwendekarên dersa kurmancî hîlbijartî bi pirtûka dersa kurmancî ra bi piranî li xwendengeha navîn çêdibe. Ev rastî, hesasîyet û giringîya naveroka pirtûka dersê zêdetir dike.

Serenavên metinan jî tê da, me bêjeyên metinên di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da li gor cureyên bêjeyan senifandin û bi alîkarîya tabloyan bi awayekî hejmarî nîşandan. Me metinên di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da serhev 12594 bêje tesbît kirin. Di van metinan da 4347 navdêr, 2165 lêker, 775 rengdêr, 925 hoker, 1714 cihnav, 1313 daçek, 1226 gihanek û 129 baneşan hatine bikaranîn. Di metinên agahîder da 9781, metinên hikayetî da 2134 û di helbestan da 679 bêje hatine bikaranîn. Bêjeyên hin metinan ji temamiya bêjeyên her çar helbestan da hatine bikaranîn, zêdetir e. Berovajîyê giringîya helbestan ya di perwerdeya xwendekarên xwendengeha navîn da, di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da hejmara helbestan gelekî kêmtir e. Hin metin gelekî direj in, hin metin jî gelekî kurt in. Hejmara metinên pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem û qebareya pirtûkê li gor du saetên dersê gelekî zêde ne. Eger em berawirdkirinekê bikin tê dîtin ku qebareya pirtûkên dersa kurmancî di hin pêlikan da bi qasî pirtûka dersa tirkî heye ku hefteyekê da 5 saetên dersê bo hatiye veqetandin.

Tê dîtin ku di metinên pirtûka dersa kurmancî ya pola heştem da li gor cureyên bêjeyan ji herî zêdeyê ber bi herî kêmtir navdêr, lêker, cihnav, daçek, gihanek, hoker, rengdêr û baneşan hatine bikaranîn. Ji ber ku di qada kurdî bi taybetî jî di qada kurmancî da li ser cureyên bêjeyên metinên di pirtûkên dersa kurmancî da çî xebat nehatine kirin, em nikarin berawirdkirinekê bikin. Lê ji ber ku di qada tirkî da xebatên bi vî rengî hatine kirin em dikarin li gor cureyên bêjeyan bi xebatên tirkî ra berawirdkirinekê bikin. Demirbükên (2011) li ser cureyên bêjeyên metinên di pirtûka

dersa tirkî ya pola pencem a ku sala 2009-2010an da hatibû bikaranîn, xebitîye û cureyên bêjeyên metinên di vê pirtûkê da, ji herî zêdeyê ber bi herî kême weha tesbît kirine: navdêr, lêker, rengdêr, cihnav, hoker, daçek, gihanek û baneşan. Bora (2016) li ser cureyên bêjeyên metinên di pirtûka dersa tirkî ya pola şeşem xebitîye û di metinan da herî zêde navdêr û herî kême baneşan tesbît kirine. Arpağ (2016) li ser cureyên bêjeyên metinên di pirtûka dersa tirkî ya pola heftem xebitîye û pêşîyê metinên di pirtûkê da li gor cureyên metinan senifandîye û paşê jî bêjeyên van metinan li gor cureyên bêjeyan senifandiye. Di encama xebata xwe da tesbît dike ku di metinan da herî zêde navdêr, herî kême baneşan hatine bikaranîn. Dabeşbûna cureyên din ê bêjeyan li gor cureyên metinan diguhere. Duran (2019) li ser pirtûka dersa tirkî ya pola çarem xebitîye û ji herî zêdeyê ber bi herî kême cureyên bêjeyên metinên vê pirtûkê weha tesbît kirine: navdêr, lêker, rengdêr, weklêker, hoker, gihanek, cihnav, daçek û baneşan. Di hemû xebatên navborî da jî wekî vê xebatê herî zêde navdêr, herî kême baneşan hatine tesbît kirin. Xebata me bi xebatên navborî ra ji vî alîyî ve dişibîne hev.

Bi wesîleya vê xebatê tê dîtin ku pirtûka dersa kurmancî ya pola heştam bi awayekî têr û tijî nehatiye amadekirin. Bêguman yek ji sedemên vê encamê nebûna xebatên zanistî yên di vê qadê da hatine kirin û bi vî awayî dîyarnekirina zêdehî û kêmasîyên bernameya hînkirinê û pirtûkên dersê ne. Herweha ji ber ku di nav amadekarên bernameya hînkirinê û pirtûka dersa kurmancî da zanyar û pisporên qada perwerdeyê nînin yan jî kême in, tê texmînkirin ku yek ji sedemên kêmasîyên ku derketine holê ev e.

Piştî encam û nîqaşên vekolîna li ser cureyên bêjeyên metinên di pirtûka dersa kurmancî ya pola heştam da, em dikarin van pêşnîyazan bikin:

1. Pirtûka dersa kurmancî hem ji alîyê naverokê hem jî ji alîyê derveyê naverokê ve divê li gor pêşketinên di qada pirtûkên dersê da çêbûyî, bêne amadekirin.
2. Divê hejmar û cureyên metinan di hemû tema yan jî unîteyan da bi hevsengî bêne dabeşkirin.
3. Divê hejmara bêjeyên di metin û helbestan da tîne bikaranîn, ji metin û helbestên tema yan jî unîteya pêşî ber bi tema yan jî unîteya dawî zêde bibin.
4. Divê di bijartina metin û helbestan da li gel hejmara bêjeyan, cureyên bêjeyan jî li ber çavan bîn girtin.
5. Di bijartina bêjeyên metin û helbestên di pirtûkên dersa kurmancî da divê ast û temenê xwendekaran li gel peyvanka wan li ber çavan bîn girtin.
6. Di metin û helbestên di pirtûkên dersa kurmancî da, divê bêjeyên hevpar ên li hemû deverên kurmancî tê axiftin heyî, bêne tercîhkirin.
7. Metinên pirtûkên dersa kurmancî divê li gor rêzikên rastnivîs û xalbendîyê bin. Divê xeletîyên vegotinê, têgihên tevlihev û îfadeyên binakok tê da nebin.
8. Metinên pirtûkên dersa kurmancî divê kurmancîyê pêş ve bibin û cihê bêjeyên ji zimanên biyanî bêjeyên kurmancî bîn bikaranîn. Divê di metinên pirtûka dersa kurmancî da kurmancîyeka herikbar bîn bikaranîn.
9. Ji ber ku metinên hikayetî ji bo geşedana zimanî ya xwendekarên di asta xwendîngeha seretayî û navîn da gelekî giring in, bi qasî ku pêdivî pê heye divê di pirtûkên dersa kurmancî da bîn bicîhkirin.

Çavkanî

- Adalı, O. (2011). *Anlamak ve Anlatmak*. İstanbul: Pan.
- Akbayır, S. (2007). *Cümle ve Metin Bilgisi*. Ankara: Pegem Akademi.
- Aktaş, Ş., & Gündüz, O. (2004). *Yazılı ve Sözlü Anlatım-Kompozisyon Sanatı*. Ankara: Akçağ.
- Akyol, H. (2006). *Yeni Programa Uygun Türkçe Öğretim Yöntemleri*. Ankara: Kök.
- Alkan, C. (1979). *Eğitim Ortamları*. Ankara: Ankara Üniversitesi Eğitim Fakültesi Yayınları.
- Allison, C. (2008). Badinan'daki Eski Ve Yeni Sözlü Gelenekler. P. Kreyenbroek, & C. Allison (Ed.). *Kürt Kimliği ve Kültürü* içinde (Ü. Aydoğmuş, Çev.) (s. 51-78). İstanbul: Avesta.
- Arpağ, M. (2016). *İlköğretim İkinci Kademe 7. Sınıf Türkçe Ders Kitabı Metinlerinin Sözcük Türleri Bakımından Değerlendirilmesi* (Tez No: 436900) [Yüksek Lisans Tezi, Sakarya Üniversitesi]. Yükseköğretim Kurulu Tezleri.
- Baran, B. (2012). *Rêzimana Kurmancî*. Diyarbakır: Belkî.
- Bora, N. (2016). *İlköğretim 2. Kademe 6. Sınıf Türkçe Ders Kitabındaki Sözcük Türlerinin İncelenmesi Ve Değerlendirilmesi* (Tez No: 436899) [Yüksek Lisans Tezi, Sakarya Üniversitesi]. Yükseköğretim Kurulu Tezleri.
- Cemiloğlu, M. (2004). *İlköğretim Okullarında Türkçe Öğretimi*. Bursa: Alfa Aktüel.
- Creswell, J. W. (2005). *Educational Research: Planning, Conducting And Evaluating Quantitative And Qualitative Research*. USA: Pearson Prentice Hall.
- Çakır, F. (1997). *İlkokul Türkçe Ders Kitaplarının Eğitim Öğretime Uygunluğunun Değerlendirilmesi* (Tez No: 61881) [Yüksek Lisans Tezi, Marmara Üniversitesi]. Yükseköğretim Kurulu Tezleri.
- Çepni, S. (2012). *Araştırma Ve Proje Çalışmalarına Giriş*. Trabzon: Celepler.
- Çetişli, İ. (2006). Edebiyat Eğitiminde Edebi Metnin Yeri Ve Anlamı. *Milli Eğitim*, 34(169), 75-84.
- Çiçek, C. (2013). *Zimanek Çima Tê Qedexekirin? Polîtîkayên Zimanî Û Rewşa Kurdî Li Tirkîyeyê Ji Înkare Ber Bi Nasîne*. Stenbol: Peywend.
- Demirbüken, S. (2011). *İlköğretim 1. Kademe 5. Sınıf Türkçe Ders Kitabının Sözcük Türleri Bakımından İncelenmesi* (Tez No: 290756) [Yüksek Lisans Tezi, Gazi Üniversitesi]. Yükseköğretim Kurulu Tezleri.
- Duran, O. (2019). *İlkokul Dördüncü Sınıf Türkçe Ders Kitaplarındaki Metinlerde Yer Alan Kelime Türlerinin İncelenmesi* (Tez No: 560439) [Yüksek Lisans Tezi, Necmettin Erbakan Üniversitesi]. Yükseköğretim Kurulu Tezleri.
- Gülersoy, A. E. (2013). İdeal Ders Kitabı Arayışında Sosyal Bilgiler Ders Kitaplarının Bazı Özellikler Açısından İncelenmesi. *International Journal of New Trends in Arts, Sports*

and Science Education, 2(1), 8-26.

Hengirmen, M. (1999). *Dilbilgisi Ve Dilbilim Terimleri Sözlüğü*. Ankara: Engin.

Miles, M. B., & Huberman, A. M. (1994). *Qualitative Data Analysis: An Expanded Sourcebook*. Thousand Oaks, CA: Sage.

İlmer, K., Kocaman, A., & Özsoy, A. S. (2011). *Dilbilim Sözlüğü*. İstanbul: Boğaziçi Üniversitesi Yayınevi.

Karasar, N. (2012). *Bilimsel Araştırma Yöntemi: Kavramlar, İlkeler, Teknikler*. Ankara: Nobel Akademik.

Kaya, Z. (2006). *Öğretim Teknolojileri Ve Materyal Geliştirme*. Ankara: Pegem Akademi.

Kurt, Ş. (2024). Analîza Metinên Pirtûka Kurdî (Kurmançî) Ya Pola Pêncem Ji Alîyê Hînkirina Şîyanewerîya Xwendinê ve. *Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi*, 16(01), 461-472.

MEB. (1995). *Millî Eğitim Bakanlığı Ders Kitapları Yönetmeliği*. Ankara: T.C. Resmi Gazete, 22297.

MEB. (2006). *İlköğretim Türkçe Dersi (6, 7, 8. Sınıflar) Öğretim Programı*. Ankara: Devlet Kitapları Müdürlüğü.

MEB. (2012). *Ortaokul ve İmam Hatip Ortaokulu Yaşayan Diller ve Lehçeler Dersi (Kürtçe) Öğretim Programı*. Ankara: Millî Eğitim Basımevi.

MEB. (2015). *Türkçe Dersi (1, 2, 3, 4, 5, 6, 7 ve 8. Sınıflar) Öğretim Programı*. Ankara: Devlet Kitapları Müdürlüğü.

Özdemir, E. (2004). *Sözlü Yazılı Anlatım Sanatı Kompozisyon*. İstanbul: Remzi Kitabevi.

Seguin, R. (1989). *The Elaboration Of School Textbooks: methodological guide*. Paris: UNEDCO.

Şahin, T. Y., & Yıldırım, S. (1999). *Öğretim Teknolojileri Ve Materyal Geliştirme*. Ankara: Anı.

Tan, S. (2011). *Rêzimana Kurmançî. İstanbul*: Enstituya Kurdî ya Stenbolê.

Tan, Ş. (2007). *Öğretimi Planlama Ve Değerlendirme*. Ankara: Pegem Akademi.

Yıldırım, A., & Şimşek, H. (2011). *Sosyal Bilimlerde Nitel Araştırma Yöntemleri*. Ankara: Seçkin.

Yıldırım, K. (2012). *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi*. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.



XEWNEKE POLÎTİK: ÇÎROKA CEMÎL SAÎB *DI XEW DE*

Sinan ÇAKAR

A Political Story: Cemil Saib's *Le Xewma* (In Sleep) Politik Bir Öykü: Cemil Saib'in *Di Xew De* (Uykuda) Adlı Öyküsü

Sinan ÇAKAR

ORCID: 0000-0002-1088-5995 | sinancakar@yyu.edu.tr
Dr., Department of Kurdish Language and Literature, Faculty of Letters, Van Yüzüncü Yıl University, Türkiye.

Citation/Jêgir/Atrif:

Çakar, S. (2024). Xewneke polîtîk: Çîroka Cemil Saib Di Xew De. Kurdiyat (10), 143-155. DOI: 10.55118/kurdiyat.1589494

Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:

Research Article/Gotara Vekolinê/Araştırma Makalesi

Received/Dema Hatînê/Geliş Tarihi: 21.11.2024

Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 26.12.2024

Publication Date/Dema Weşandinê/Yayın Tarihi: 30.12.2024

Peer-Review/Hekemtî/Hakemlik:

Double anonymized-Two External/Cot Nenas-Du ji derve/ Çift Taraflı
Kör Hakemlik-İki hakem

Plagiarism Checks/Kontrola Întihalê/Benzerlik Kontrolü:

This article has been scanned by iThenticate plagiarism website./
Ev gotar di malpera întihalê ya iThenticate ra hatiye derbaskirin./ Bu makale iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır.

Ethical Statement/Beyana Etik/Etik Beyanı:

It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited./ Hatîye beyankirin ku di pêkanin û nivîsîna vê xebatê de hemû rêzîkên zanistî û etik hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têkûz hatine referanskirin./ Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.

Conflicts of Interest/Nakokiyên Berjewendiyên/Çıkar Çatışması:

There is no conflict of interest between the author and any parties in the article./ Di gotarê de li navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendiyê tune ye./ Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.

Grant Support/Alîkariya Darayî/Maddî Destek:

The author acknowledge that they received no external funding in support of this research./ Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê vekolinê ti fonên derveyî wernegirtine./ Yazar, bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.

Copyright & License/Mafê Telifê & Destûr/Telif Hakkı & Lisanslama:

Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0./ Nivîskar li jer lisansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin./ Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

Kurte

Xewn, di jiyana mirovan de û hema bêje di nava hemû dîn û çandên cur bi cur de ciyekî xwe yê taybet heye. Pêşeroja mirovayetiye bigire heta roja îro, di jiyana mirovan de bibandoreke mezin xwe daye der. Gelek kesan li ser xewnê serê xwe êşandine û herweha gelek wate jî jê derxistine. Ji bona vê termê gelek pirtûk hatine nivîsîn û di rêya şirovekirina xewnan de mirovên taybet derketine holê û ev mesele an jî ev babet jî xwe re kirine mesele û meslek. Zêdetir jî ji hêla dînî û psîkolojîk ve gelek nihêrînên cuda derketine holê. Vê termê heman demê bandor li edebiyatê kiriye û di edebiyata cihanê de cîyê xwe girtiye. Rengvedana xewnan di edebiyatê de caran weke bertekekê û bi helwest û mebesteke polîtîk hatine nivîsîn. Di edebiyata kurdî de jî metnên bi vî awayî hatine nivîsîn. Yek ji van metnan jî çîroka *Di Xew De* (Le Xewma) ya Cemil Saib e. Nivîskar ji bo rexne û hilsengandina serdemekê dîrokî xewnê weku amûrekî bikartîne. Ev xebat *Di Xew de* ya Cemil Saibî di çarçoveya bertekeke polîtîk de analiz dîke û hildisengîne.

Peyvên Sereke: Çîrok, Xewn, Şêx Mehmûd Berzencî, Di xew de, Le xewma, Cemil Saib.

Abstract

Dreams have an important place in the daily lives of people and in this respect, we can say that they have gained a unique place in all cultures and beliefs. Since time immemorial, dreams have exerted a distinctive influence on people's lives. Many people have pondered the concept of dream and derived a lot of meaning from it. Books have been written to explain this concept, and various individuals have come to the fore for the interpretation of dreams and have made this job their profession. Different perspectives and interpretations have emerged on the concept of dream, particularly within religious and psychological context. As a concept, the dream has also influenced literature and has gained a place in world literature. In literary texts, the dream has sometimes emerged as a political reaction, serving a purpose in this direction. Kurdish literature also contains texts of this kind. One of these is Cemil Saib's short story *Le Xewma* (In Sleep). In this story, Cemil Saib reveals a historical period through the dream method in a critical and political manner. In this study, this particular story of Saib has been analysed within the framework of political reaction, employing a critical and analytical approach.

Keywords: Story, Dream, Şêx Mehmûd Berzencî, Le xewma, Di xew de, Cemil Saib.

Özet

Rüya insanların günlük yaşamında önemli bir yere sahiptir ve bu yönüyle diyebiliriz ki tüm kültür ve inançlarda kendine has bir yer edinmiştir. Geçmişten bu yana insanların yaşamına kendine özgü etkilerde bulunmuştur. Birçok insan rüya kavramına kafa yormuş ve ondan çokça anlam çıkarmıştır. Bu kavramın açıklanması için kitaplar yazılmış, rüyaların yorumlanması için de farklı insanlar ön plana çıkmış ve bu işi kendilerine meslek edinmişlerdir. Rüya kavramı hususunda özellikle dini ve psikolojik açıdan farklı bakış açıları ve anlamlandırmalar ortaya çıkmıştır. Rüya kavramı olarak edebiyata da etki etmiş ve dünya edebiyatında yer edinmiştir. Edebi metinlerde ise rüya, kimi zaman politik bir tepki olarak ortaya çıkmış ve bu yönde bir amaç gütmüştür. Kürt edebiyatında da bu türden metinler görülmektedir. Bunlardan biri de Cemil Saib'in *Di Xew De* (Uykuda) adlı öyküsüdür. Cemil Saib bu öyküsünde rüyayı tarihsel bir dönemi; eleştirel ve politik bir tutumla irdelemenin aracı olarak kullanmaktadır. Bu çalışmada Saib'in anılan öyküsü, politik tepki çerçevesinde eleştirel ve çözümleyici bir yaklaşımla incelenmektedir.

Anahtar Kelimeler: Öykü, Rüya, Şêx Mehmûd Berzencî, Di xew de, Le xewma, Cemil Saib.

Destpêk

Xewn di jiyana mirovan de cihekî giring digire ku hem li ser qada kesayatiyê hem jî civakî de xwedî bandoreke piralî ye. Ji ber vê yekê dikare bê gotin ku xewn di destpêkê de wekî têgiheke takekesî bê famkirin jî pişt re bi têkildarbûna xwe dikeve çarçoveyê berfireh. Ew tişt ku mirov di dema nivîstîna de dibîne re wek xewn hatiye binavkirin (Doskî, 2006: 11). Di zimanê erebî de jî bo xewnên baş rûya, jî bo xewnên nexweş jî hulm tê gotin. Rûya rehmanî, hulm şeytanî ne (Çelebi, 2008: 306). Di dîrokê de xewna herî binavûdeng ya ku hatiye tomarkirin xewna Yusuf pexember e. Yusuf pexember bi şîrovekirina xewna Firewn ji zindanê azad dibe û welatê Misrê jî xelayê jî diparêze (Cayce, 1998: 14). Dîsa di Kur'ana pîroz de Yusuf pexember xewna xwe ji bavê xwe Yaqûb pexember re dibêje û Yaqûb pexember bi şîrovekirina xewna wî dixwaze wî ji bela û musîbetan biparêze (Yûsuf 12/4-6).

Feylesofê Yewnanî Platon li ser xewnan wiha dibêje “xewn dengê wijdana me ne, hewce ye mirov guhdarî bide vî dengî û riayetê wê bike”. Lê berevajiyê Platon Arîsto xewnan tiştên tesadufî û bêwate dibîne (vgz. Cayce, 1998: 15). Fîkr û ramanên li ser xewnan wisa dixuyê ku ji mahiyeta xewnan dûr nîne. Çimkî xewn jî siruştiya xwe jî tê famkirin ku hem girêdayî jiyana rojanê ye û bi mantiq û qeydeyên wî tîr şîrovekirin û hem jî ev yeka wekî teqez naye sînorkirin. Loma di nav wê de binhiş, mêj, amanc û xeyalên merivan tîkildarîya wê zêde dike. Di taybetiya nezanîyê jî xewnan dikişîne qadeke din. Ev jî wekî qada çand e ku li ser şîrovekirina xewnan û mereqa paşerojê ava dibe. Ji bona vê yekê falzan û remlvan derketine û xewn şîrove kirine. Pêkhatin û şîrovekirina xewnan ji teologan bigire heta psîkanalîst û feylesefon re jî bûye meraq. Psîkanalîst xewn, jî bo çareserîkirina pirsgirekên dêrûnî, teologan jî aliyê dînî, û feylesofan jî ji bona zelalkirina raborî û dahatûya mirovan, wek elametekê dîtine (Osmanoğlu, 2017: 2). Di dîrokê de gelek caran kesên ku xewn şîrove kirine wek mirovên pîroz hatine dîtine. Doskî dîyar dike ku li ser perestgehekê dînî di derbarê şîrovekirina xewnan de weha hatiye nivîsîn: “ez xewnan şîrove dikim, û min ji layê xwedavendan ve destûr heye ku vê çendê rabibim” (2006: 11).

Piştî serdemekê zedetîr jî piştî sedsala bîstan psîkanalîstan jî hêla dêrûnîyê ve xewn şîrovekirine û ev cure şîrovekirin jî piranî bi pîvanên Freud ve şikil girtiye. Li gorî Freud (1856-1939) xewn pêkhatina arezûyên mirovan in. Mirov di jiyana de bi hin kêşe û meseleyan re rûbirû dimîne û car dibin ku di van meseleyên xwe de çareserîyekê pêk nayîne û gelek caran jî serkeftinekê çênabe. Ev kêşe û meseleyên vî awayî bandorê li xewna wan dike û meseleyên ku nehatine çareserîkirin di xewnê de li gorî xesteka wan çareser dibin (Freud, 2018: 19).

Xewn herweha di metnên edebî de jî cih girtiye. Pêwendîya edebiyat û xewnê di serdemên modern û postmodern de bûye mijara metnên edebî. Nivîskaran jî bona derbirîna hin meseleyên takekesî û civakî motîfên xewnê bikaranîne. Bi rêya vê yekê jî hin tiştên nepenî bi sembolen xewnan ve dane dîyarkirin (Üstün Kaya, 2021:452). Metnên xewnî gelek caran jî bona rexnekirina serdemekî yan jî desthilatdarîyekê hatine honandin. Bîrokrasî, karbidestî yan desthilatdarî gelek aliyên ve di edebiyatê de cîyê xwe girtiye. Rişwet, zilm û zordarî, helwestên nelirê û hukmên bêkanûnî yên karbidestan, jî hêla nivîskaran ve hatine gengeşîkirin û rexnekirin (Tosun, 2020: 359). Li gorî Pospelov hemû berhemên edebî jî bo armancekê tîr nivîsîn (2014: 205). Ji ber vê

yekê ye ku metnên honandî ne bi tesadûfî bi mebesteke dîyarkirî ve tîrên afirandin. Xewn gelek caran remzên dahatûyê şîrove dike û dahatûyê rave dike. Da ku mirov bikare hêmaya metneke edebî peyda bike divê di serî de mirov mebesta nivîskar ya nivîsandinê dîyar bike. Lewra metna edebî di encama helwesta nivîskar ya hundirîn pêk tê (Çıkla, Kuran, 2021: 68-69). Li gorî Necîp Tosun di afirandina metnekî edebî de divê mirov jîyana nivîskar jî berçav bigire. Bandora jiyana nivîskar her wiha bandorê metna wî jî dike. Ji ber vê yekê jî serpêhatî, şahidî, fikir û bawerî û helwesta nivîskar bandorê metnê dike. Tosun, dibêje ku “berhema hûnerî ji îdeolojîya nivîskar dûr/qut nabe” (2020: 99-100).

Em vê cureya nivîsê di edebîyata tirkî de jî dibînin. Yek ji van ji aliyê Ziya Paşa ya din jî ji aliyê Namîk Kemal ve hatiye nivîsîn. Ziya Paşa di sala 1869an de li Londrayê di rojnameya *Hurriyetê* de bi navê “Rüya” metnekî diweşîne. Ev metn di vê rojnameya navborî de, di hejmarên 68 û 69an de derdîçe. Dîsa di vê serdemê de metneke wî cureyî jî ji aliyê Namîk Kemal ve hatiye nivîsîn. Li gorî çavkanîyan Namîk Kemal ev metn di sala 1875an de li Magosayê nivîsiye (Demir, 2022: 12). Ziya Paşa di vê metna xwe de bi awayekî satîrîk desthilatîya sadrazam Mehmet Emin Ali Paşa rexne dike (Tek, 2017: 232). Ev herdu metn di serdema xwe de li hemberî desthilatdarîya serdemê hatine nivîsîn. Ji metneke edebî wêdetir bi gilî û gazindeyên nivîskaran pêk hatine. Lêkoler Metin Kayahan Özgül van metnan weke metnên siyasî pênase dike. Li gorî Özgül, ev metnên navhatî di vê serdemê de bi mebesteke polîtîk hatine nivîsîn (1989: 21). Serdema nivîsîna metna Cemîl Saîb jî dikeve piştî van metnên navborî. Ger em rewşa serdemê jî binêrin em dibînin ku di vê serdemê de Silêmanî jî di nava sînore Împeratoriya Osmanîyan de ye. Ji ber vê yekê jî em dikarin bibêjin Cemîl Saîb jî ji vê cureya nivîsê haydar e. Lewra li ser vê esasê rexneyên xwe bi rêya metneke çîrokê anîne ziman. Cemîl Saîb di dewra Osmanîyan de jîyaye û îhtîmaleke mezin e ku haya wî wî cureya rexneyê heye. Haşîm Ahmetzade îddîa dike ku çîroka Cemîl Saîb îlhama xwe ji metneke tirkî wergirtîye û ev metneke xewnî ye û di sala 1909an de li Bexdayê bi zimanê erebî hatiye wergêrandin. Li gorî Ahmetzade çîroka Cemîl Saîb ji gelek aliyên teknîkî û tematîk ve dişibe vê metna navhatî. Ne tenê ev metn, Ahmetzade dîyar dike ku çîroka Cemîl Saîb di heman demê de dişibe kurteçîroka nivîskarê tirk ya Celal Nurî. Celal Nurî ev metna xwe bi sernavê “Cenette Bir Yolculuk” di sala 1903an de daye weşandin (2004: 194).

Nimûneyên metnên xewnî di edebîyata kurdî de jî tîrên dîtin. Destana Memê Alan yek ji van metnan e. Di destanê de ji Mem re eyan dibe ku; Mem dê bi xwarina hinara jehrkirî û Zîna Zêdan jî dê piştî heft rojan bimire. Ev bûyer heman wekî Memî di xewnê de dîtiye pêk tê (Lescot, 2020: 139-140). Dîsa di çîroka Osman Sebrî (1905-1993) ya “Li Goristaneke Amedê” de lehengê çîrokê ji welêt dûr e û di hesreta welêt û bêriya rojên berê dike. “Kela gihana welêt...kela gihana welêt” (r.35). Ev hevokên hanê dêrûnî û naçarîya nivîskar didin der. Lê em di çîrokê de jê hay dibin ku çûna welêt ne mimkune. Em ji metna çîrokê jê derdixin ku lehengê çîrokê nivîskar bixwe ye. Nivîskar ji ber hin sedemên polîtîk ji welat sirgûn bûye û ji derveyî welat dijî. Ew xwesteka xwe ya çûna welêt bi riya xewnê bi cî tîne. Ew di xewnê de bask dike û tê li Amedê li ber goristaneke dadikeve jêr. Li goristanê bi gelek kesayetiyên payebilind yê kurdan û hin mirovên xwe ji nêz ve dibîne u bi wan re diaxive. Li vir dema em li gor Freud binerîn arezûya mirov derdikeve pêşberî me. Lewra lehengê çîrokê astengiya tê de û xwesteka xwe ancax dikare bi riya xewnê pêk bîne.

1. Rewşa Sîyasî

Piştî têkçûna dewleta Osmanî bajarê Silêmanîyê û derûdora wê di nava sê hêzên ji hev cihê de dibe cihê şer û pêvçûnan. Yek ji van tirk in û di bin pêşengîya Mustafa Kemal de doza Mûsil û Kerkûkê dikin. Hêza din jî Îngîlîz in ku piştî şerê cihanê yê yekemîn Iraq dikeve bin desthilatdariya wan. Hêzeke din jî di vê serdemê de hêza kurdan e ku di bin pêşengîya Şêx Mehmûd Berzencî de doza serxwebûnê dikin. Ev rûdanên sîyasî di nava rewşenbîr û gelê kurd de jî xwe dide nîşandan. Cemil Saîb jî ji van kesan e ku serê xwe bi vê meseleyê êşandîye. Di vê serdemê de rojnameya *Jîyanewe* di bin berpirsîyarîya Cemil Saîb de bi propaganda hukumranîya Îngîlîzan ve derdikeve pêş. Ne tenê nivîsên Cemil Saîb; li ser vê babetê di rojnameyê de gelek nivîs derdîçin û di van nivîsan de jî dostaniya Îngîlîzan ya li hemberî kurdan tê vegotin.

Piştî şerê cihanê yê yekemîn piraniya Iraqê dikeve bin hukumranîya Îngîlîzan. Bajarên kurdan yên wek Silêmanî, Kerkûk û Mûsil ji van bajaran in. Di vê serdemê de Şêx Mehmûd jî li Silêmanîyê niştecîh e. Şêx Mehmûdê Hefîd yan jî bi gotineke din Şêx Mehmûd Berzencî di çiriya paşîn ya 1918an de ji aliyê nûnerê Îngîlîstanê yê Iraqê Major Noel ve weke hukumdarê Kurdistanê tê îlankirin (Hilmî, 2010: 47). Lê fikr û ramanên Îngîlîzan û yên Berzencî gelek ji hev cihê ne. Di sala 1919an de gengeşiyên navbera Îngîlîz û Berzencî dibin sedema şerekî û Berzencî têk diçe û di heman salê de jî hêla Îngîlîzan ve tê sirgûnkirin û ev rewş heta sala 1922an berdewam dike. Berzencî dîsa bi destûra Îngîlîzan di sala 1922an jî sirgûnê vedigere û li Silêmanîyê dibe serokê hukumeta kurdan. Lê vê carê jî hukumdariya wî zêde dom nake û di tîrmeha 1924an de mecbur dimîne û ji Silêmanîyê derdikeve (Bayrak, 2014: 22-23).

Cemil Saîb wek me li jor jî diyarkirî ne bi mebesta çîroknûsîyê ji bo dijberîya Şêx Mehmûd Berzencî ev metna hanê nivîsandî ye. Dibe ku tekane mebesta nivîskar jî reşkirina desthilatdariya Berzencî be. Li gorî Maruf Xeznedar du pismamên Cemil Saîb jî hêla hêzên Berzencî tînin kuştin (2024: 33). Haşîm Ahmetzade jî dîyar dike ku mirovên Cemil Saîb yên hatine kuştin yek birayê wî Arif Saîb e û yên din jî hevalekî wî yê nêz û xwezûrê wî ye. Arif Saîb bi tawanbarîya sixurîya Îngîlîzan tînin kuştin (2018: 107).

Cemil Saîb heta hejmara 37an di rojnameya *Jîyanewe* de wek berpirsîyarê rojnameyê dixebite. Ji bilî meseleyên şexsî dijberiyek din jî di navbeyna Şêx Mehmûdê Berzencî û Cemil Saîb de heye ku ew jî helwesta Cemil Saîb ya polîtîk ve pêwendîdar e. Rojnameya *Jîyanewe* bi propagadaya îngîlîzan ve tê naskirin. Rojname bi awayekî aşkera piştevanîya Îngîlîzan dike û dixwaze kurd jî di bin jêrdestîya Îngîlîzan de mafê xwe yê sîyasî û civakî biparêzin. Cemil Saîb rojnameyê taybetî jî ji bona vê yekê terxan dike (Arif, 2011: 16). Di vê serdemê de nerazîbûnên li hemberî Şêx Mehmûd Berzencî pir in. Ji ber ku Berzencî di desthilatdariya xwe de piranî cih daye mirovên xwe û xelkê jê aciz bûye. Xelkê Silêmanî û Kerkûkê bertek nîşan dane û zêdetir jî di nava mirovên xwende de ev yek nehatiye pejirandin û desthilatdariya Şêx Mehmûd Berzencî cih cihan hatîye rexnekirin (url-1). Ev yek di bîranînên Refîq Hilmî de jî bi heman awayî cih digirin. Hilmî jî dibêje, dema Şêx Mehmûd Berzencî bi alîkarîya Îngîlîzan li Iraqê desthilatdariyê destdixê, di karên rêveberîyê de piranî mirov û dostên wî tînin wezîfedarkirin (2010:46).

2. Helwesta Rexneyî û Sîyasî “Di Xew De” ya Cemîl Saîb de

Berhema Cemîl Saîb a çîrokî ku piştire weke “Le Xewma/Di Xew De” nav daye, di navbeyna salên 1925-1926an de di rojnameya *Jîyannewe* de 18 tefrîqa û di rojnameya *Jîyanê* de jî weke 5 tefrîqa û bi tevahî 23 tefrîqa weşiyaye. Çîrok di van rojnameyan de bê nav bê nasnav derçûye. Çîrok herî dawî hejmara *Jîyanê* ya 29ê tîrmeha 1926an weşiyaye û di vê hejmarê de herçiqas di dawîya çîrokê de ‘navber’ hatibe nivîsîn jî di hejmarên pişt re yên rojnameyê de em li rastî berdewamiya çîrokê nayên (Arif, 2011: 14-15). Metna çîrokê piştire ji aliyê Cemal Baban ve di sala 1975an de ji destnivîsên nivîskar weke pirtûk hatîye weşandin (Shakely, 1998: 26). Ev metin di edebiyata Soranî de yekemin metna çîrokî ye (Reşid, 2005: 10).

Dema li gorî van nihêrînên li jor em metna Cemîl Saîb binêrin ev yek baş tê dîtîn ku Saîb ne ku armanc dike xewna xwe binîvîse. Armanca wî ew e ku serdema Şêx Mehmûd Berzencî li gorî xwe reş û tarî bide pêş û wê serdemê teşhîr bike. Bi mebestekî polîtîk ev metin hatiye nivîsîn. Cemîl Saîb meseleyên xwe yên şexsî bi rêya vê çîrokê dide der û ev yek jî di çîroknûsiya kurdî de cîyawazîyekê din dide vê metnê. Lewra di vê çîrokê de diyardeya herî sereke problemên şexsî ne (Filiz, 2023: 10). Ger em metna Cemîl Saîb binêrin em ê bibînin ku tiştê ku derdikeve holê ya herî sereke mebesta nivîskar e. Nivîskar bi metna xwe ve li gorî xwe serdemekî dide nîşandan. Rexneya serdemekê bi rêya metna xwe dide der. Gelek nivîskar jî vê çîrokê bi heman awayî pênase û şîrove dikin. Li gorî Huseyn Arif; çîroka “Le Xewma” her çend wek çîrokeke edebî bê naskirin jî ew di heman demê de metneke dîrokî û sîyasî ye jî (2011: 15). Lewra em dibînin nivîskarê çîrokê naveroka metna xwe bi rexneya bûyerên serdemê ve ristîye. Herçend çîrok bi şêwazeke sembolîk hatibe nivîsandin jî em bi gelek şahidî û belgeyên serdemê ve dikarin bejin, çîrok paşxaneya xwe ji rûdanên sîyasî yên vê serdemê wergirtîye. Herweha Haşîm Ahmetzade û Marûf Xeznedar jî gotinên Huseyn Arif piştrast dikin. Ferhad Shakely di vê babetê de tevli nîqaşê dibe û vê rewşê îronîk dibîne. Lewra Shakely rêbertî û desthilatdariya Şêx Mehmûd Berzencî di serdema modern a kurdan de weke qalîtiya xweser a yêkemîn binav dike. Di vê babete de şayesandin û dijberîya Cemîl Saîb; li gorî Shakely tiştê îronîk e (1998: 27). Ji bona zelalbûna vê serdemê şahidîyên Refîq Hilmî jî giring bûn. Ji bona analiz û piştrastkirina çîrokê cih cihan me biranînên Refîq Hilmî wek referans hilgirtin. Gotin û referansên Refîq Hilmî ji bona xebata me cîyekî taybetî digire. Lewra Refîq Hilmî ne tenê şahidê serdemê heman demê de yek ji nêzîktirîn mirovê derûdora Şêx Mehmûd e. Hilmî di serdema Konferansa Parîsê de li Silêmanîyê ye û nameya ku li ser navê Şêx Mehmûd Berzencî û giregirên kurdan ji Şerîf Paşa re hatîye nivîsîn bi destê wî tê amadekirin (Hilmî, 2010: 50).

Vegêrê çîrokê di sere metna xwe de diyar dike; ya ku ew vedibêje xewna wî ye. Çîrok li ser çar beşan ve hatîye dabeşkirin. Beşa ewil “Xwedê bi xêr bike” ye. Vegêr bi mebesta bidestxistina aboriya malbata xwe bi tevî karwanekê ber bi bajarekî ve rê dikeve. Vegêr vî bajarî weke bajarê Îslamê pênase dike. Herçend di rê de li hemberî êrîşên çete û qaçaqçîyan bîn jî di dawîyê de xwe digihînin bajêr. Li bajêr dergevanên bajêr wan radiwestînin û dixwazin her çî awayî be bacê ji wan bistînin. Dema ku dor tê vegêr û li ser wî pere dernakeve wî bi qesta casûsiyê digirin. Lê piştî hin hîvî û lavahîyên karwanîyan ew wê şeve li xanekê dimîne. Piştî roj hiltê mirovên ewlehîyê wî digirin û dibin ba yekî payebilind. Bi biryara wî vegêrê çîrokê dixin odeyekî. Ev cih di çîrokê

de di bin sernavê “Min di wê odeyê de çi dîtin?” hatiye nivîsîn. Ev ode ciyekî pir taybet e. Lewra odeyekî din jî rex vê odê heye û li wir jî mirov ji saloxdayînên vegêr tê digihîje ku hin jinên payebilind di vê odeyê de civîyan e. Li rexê alîyekî odê jî pencere hene û vegêr di vê derê civînên ku çêdibin guhdarîya wan dike. Dengên ku odeya jinan de tèn bihîstîn de qala zêr, mucewher û hin tiştên bi qîmet tèn kirin. Jinên ku li wê derê ne hemû van tiştan layîqê jinekî li nav wan de runiştîye dibînin. Ew jin jî bi awayekî xwe bawer dema behsa zêrê jineke din bê kirin ew bi pozbilindî dibêje ku ew tiştên bi vî rengî mafê wê nin. Dengên ku li odeya jinan de tèn bihîstîn de vegêr me pê dide hesandin ku piranî ew jina payebilind hemû tiştî ji xwe re rewa dibîne. Dîsa gelek kes tèn li wir ji dost û nasên xwe re doza karmendîyê dikin. Hin mirovên ku hatine girtin bi destê wê jinê tèn berdan. Di vê odê de tenê em dengê wan jinan dibihîsin em reng û rûyê wan nabînin. Li alîyê din de jî kesayetê heye ku di çîrokê de weku “mezin” tê binavkirin li ser sîyasetê û rewşa welat di nava hewldanekî de ye. Her carê komek radibe û komek din pê re rûdine. Di nava van koman de yek jî koma melayan in ku li gorî fetwaya wan kesên ku dijberîya vî zîlamî dikin weku kafir tèn binavkirin û hewceye mal û jinên wan, ji wan bên standin. Komên ku tèn bi mezin re dicivin Îngiliz û Tirk jî di navê de ne û her yek ji wan dixwaze ‘mezin’ li ser rêya wan bimeşe. Lê axaftinên ku li wir tèn kirin vegêrê çîrokê heyirî dihêle û di dawîyê de dema ku ‘mezin’ dibêje ez ya yekî jî nakim û ez ê bes ya xwe bikim; vegêr bê hemdê xwe dikene û pê dihesin ku axaftinên wan hatine bihîstîn lewra li vegêr tene xezebê û jê dipirsin ka gelo çi karê wî di wê odeyê de heye. Wî bi karê casûsiyê pênase dikin û lê didin. Çîrok di vê derê de dawî dibe. Em hay pê nabin ka gelo vegêr ji xewê hişyar dibe yan na.

Rita Felski edebîyatê tiştêkî sûdgir dibîne û li gorî wê yek ji mebesta afirandina nivîskar sûd e (Felski, 2016:17). Ger ji vê hêlê ve jî lê binerin em dê bibînin ku Cemil Saîb bi mebestekî sûdgir rexneyên xwe bi rêya vê çîroka xwe anîne ziman. Lewra em nikarin bibêjin ku mebesta nivîskar a sereke nivîsandina çîrokê ye. Ji xwe tekane metna nivîskar ev çîrok e û heta vê gavê em li rastî berhem yan jî çîrokek din ya nivîskar nehatine. Ji xeynê vê yekê jî ew di metna xwe ya ku di rojnameyê de derdixe navê xwe li ser nenivîsandî ye. Saîb bi rêya vê çîrokê serdemekî bi çav û helwesta xwe ve derdixe pêşberî xwîneran. Cemil Saîb bi vê metna xwe ve li pey hisabdîtinekê ye. Ev hisabdîtin li hemberî Şêx Mehmûd Berzencî ye. Ji ber ku mirovên Saîb bi destê alîgirên Şêx Mehmûd ve hatine kuştin. Ew desthilatdarîya Berzencî bi awayekî reş û tarî dide şayesandin. Nivîskar da ku rexneyên xwe bîne ziman serî li edebîyatê daye û ji edebîyatê sûdwerirtîye. Sûdwerigirtina nivîskar di vê berhemê de teşhîrkirina serdemê ye. Nivîskar di destpêka çîrokê de bi xwîneran dide dîyarkirin ku xewnek dîtî ye. “Şevêkê di xewnê de ez rastî bûyereke nedîtî hatim.” (r.7) Ev xewn li gorî ragihandina vegêr xewneke tirsnaq û tehl bûye. Rewşa vegêr rewşeke xirab e. Sir û seqem e û serpayîzeke dereng e. Bi vî avayî jî vegêr hem rewşa xwe dide dîyarkirin û hem jî rewşa demsalê nîşan dide. Rewşa demsalê û rewşa vegêrê çîrokê dişibin hev. Tê da hêvî yan jî germahîyek nîne.

Vegêrê çîrokê bi qesta dabînkirina jîyana zarokên xwe qesta seferekî dike. Sefera vegêr jî ber bi welatekî din e. Ku nivîskar wî welatî weke welatê Îslamê pênase dike. “...xwedê lêanî û ez rabûm min berê xwe da ber bi jor û min got ew welatekî Îslamê ye. Li wir misilman û kesên baş zêde ne, alîkarîya hevûdu dikin” (r. 8). Lê di rê de vegêr li rastê gelek astengîyan dimîne. Ji

alîyekî ba û baran û serma ji alîyê din ve jî çete û eşqîya derdikevin ser rêya wan û dixwazin wan bişelînin. Nivîskar bi vî halî herêmê weke cîyekî nearam dide pêş. Vegêrê çîrokê di serê destpêkê de qala bajarê Îslamê dike. Lê em di dawîyê de pê hay dibin di vê derê de îronîyek jî heye. Lewra bajarê ku weke cihê aramî û selahet û şaristanîyê tê şayesandin ne bajar e. Ji ber ku piştê em rûyekî bajêr yê dijberî vê hizra vegêr re dibin şahid. Nivîskar vê rewşê bi deve vegêr bi vî awayî dide der: “ez ji bo pirça serî hatibûm min simbêl jî ser de da” (r.16). Ev hevok tam jî rewşa vegêr dişayesîne. Lewra vegêr bi qesta dabînkirina aborîya jin û zarokên xwe hatibû, lê ew hîn di serî de li rastî tiştên cuda tê. Ew êdî qezanca ku li bajêr bidest bixe wêdetir tenê ji hêvîya wî ew e ku ji vê zulmê xelas bibe: “Biraderê karwançî got, ew mirovekî xerîb e, ji germîyan hatiye û dixwaze li vir kesp û karekî bike, feqîr e, bêdesthilat e. Wan gotin, helbet tiştêk di bin sere de heye. Hebe tunebe ev casûs e, wî ji bo fêlbazîyê xwe kiriye vî halî.” (r.14).

